

T.C.
ZANÎNGEHA VAN YÜZÜNCÜ YILÊ
ENSTÎTÛYA ZIMANÊN ZINDÎ
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Ê ÇANDA KURDÎ

TEZA LÎSANS A BİLİND

WEŞANGERÎYA ZAROKAN Ê ZIMANÊ
RAGIHANDINÊ:
MÎNAKA KOVARA SIVORE

Amadekar:

GHAREEB MAJEED MUHAMMAD MUHAMMAD

Şêwirmend:

Prof. Dr. Mehmet Zeydin YILDIZ

Van-2020

KURTE

Ghareeb Majeed Muhammad Muhammad, *Weşangerîya Zarokan û Zimanê*

Ragihandinê: Mînaka Kovara Sivore, Teza Lisansa Bilind, Wan, 2020, 106

r.

Ji zûve giringî bi weşangerîya zarokan tê dayin. Li cîhanê yekem rojnameya zarokan li Fransayê hatiye weşandin. Di navbera salên 1747-1791an de bi navê “Dostê Zarokan” hat weşandin. Herwisa di nava Kurdistan de jî, dîroka weşangeriya Kurdî di sala 1898an de bi rojnameya Kurdistanê destpê kir, li pey wê çend kovar û rojname li Tîrkiye û Iraq û gelek cihên din derketin. Lê heya bi sala 1946an çî belavokên taybet bi zarokan nehatine weşandin..

Di vê tezê de weşangeriya zarokan û zimanê ragihandinê di Kovara Sivore de hatiye lêkolînkirin. Kovar bi xwe taybet e, ji bo zarokan tê weşandin, Mijarên di kovarê de hatine amadekirin ji hêla ziman ve hatine analîzkirin. Armanc ew e ku di weşangeriya zarokan a kurdî de rola kovarê û xebatên ku di kovarê de hatine weşandin, bîn nîşandan.

Ev xebat piştî pêşgotinê, destpêk û encamê ku ji du beşan pêk tê, di destpêkê de behsa armanc û rêbaza ku hatiye şopandin, tê kirin. Her wiha behsa çarçoveya tezê tê kirin, ravekirin û çavkaniyên ku hatine bikaranîn jî tên nasandin.

Ev tez ji du beşan pêk tê, di beşa yekem de bi awayekî giştî têgehên zarok, zarokatî û weşangeriya zarokan hatine vekolînkirin. Her wisa dîroka weşangeriya zarokan a cîhanî, di serdemên kevin û nû de bi kurtasî hatiye lêkolînkirin. Piştî dîroka weşangeriya zarokan li Herêma Kurdistanê hatiye behskirin. Her di vê çarçoveyê de weşanên li Tîrkiyeyê û Sûrî û Îranê yên taybet bi zarokan, di vê beşê de hatiye behskirin. Piştî bi kurtasî li ser mijara edebî sekinîne, navê hin pirtûk û nivîskarên ku pêşî ji bo zarokan berhem weşandine, hatiye behskirin.

Di beşa duyem de kovara Sivore bi awayekî berfireh hatiye nasandin. Di vê beşê de behsa dîrok û naveroka kovarê hatiye kirin. Her wisa bi awayekî hûr, behsa sazî, rêvebir û nivîskarên kovarê yên ku bûne sedem kovar dewam bike, hatiye kirin. Piştî ku nivîsên kovarê analîz kirine, piştî tavahîya nivîsên di 233 hejmaran de, di tabloyekê de hatine rêz kirin.

Her di beşa duyem de zimanê ragihandinê yê kovara Sivore, bi awayê pratîk hatiye lîkolînkirin. Di vî alî de ji hêla hevokê ve zimanê kovarê hatiye şîrovekirin, ku ev jî dibe du beş, hevok ji alîyê naverokê ve û hevok ji alîyê avasazîyê ve. Piştî zimanê kovarê ji alîyê pratîkê ve hatiye lîkolînkirin ku ew jî du bin-navan li xwe digre, ya yekem hînîkirina Rênivîsa Latînî ye di kovara Sivore de û ya duyem jî fêrkirina Zimanê Ingilîzî ye.

Bêjeyên Sereke: Weşangerî, Weşangeriya Zarokan, Zarok, Zarokatî, Kovarên Zarokan ên Kurdî, Kovara Sivore.

ÖZET

Ghareb Majeed Muhammad Muhammad, *Çocuk Yayıncılığı ve İletişim Dili:SivoreDergisi Örneği*, Yüksek Lisans Tezi,VAN,2020. 106 sayfa

Çoktan beri çocuk yayıncılığına önem verilmiştir. Dünyanın ilk çocuk gazetesi Fransa'da yayınlandı. (Çocuklar Arkadaşı) başlığı altında 1747-1791 yılları arasında yayınlandı. Kürtlerin içinde, Kürtçe yayıncılık tarihi 1898 yılında Kürdistan gazetesi ile başladı, ardından Türkiye, Irak ve daha birçok yerde pek çok dergi ve gazete çıkarıldı, ancak 1946 yılına kadar çocuklara özel bir gazete çıkarılmadı

Bu tezde çocuk yayıncılığı Sivore Dergisinin iletişim dili incelendi. Dergi özel bir dergi olarak çocuklar için yayınlanıyor. Dergide yer bulan konular dil açısından analiz edildi. Kürtçe çocuk yayıncılığında derginin ve dergide yayınlanan çalışmaların rolünü işaret etmek amaç edildi.

Bu çalışma önsözü takiben, giriş ve sonuç olarak iki bölümden oluştu. Giriş bölümünde amaç ve izlenen yol-yöntemden bahsedildi. Tezin sınırları belirtildi, açıklamalar ve kullanılan kaynaklar tanıtıldı.

Bu tez iki bölümden oluşmakta, birinci bölümde genel hatlarıyla çocukların anlama biçimleri, çocukluk ve çocuk yayıncılığı incelendi. Devamında dünya çocuk yayıncılığı tarihinin eski ve yeni dönemi kısaca araştırıldı. Akabinde Kürdistan Bölgesinde çocuk yayıncılığını serencamından bahsedildi. Bu çerçevede Türkiye, Suriye ve İran' da özel çocuk yayınları da bu bölümde yer buldu. Sonra kısaca edebi konular üzerinde duruldu, özellikle çocuklar için eser yayınlayan yazarlar ve kitaplarının isimlerinden bahsedildi.

İkinci bölümde Sivore Dergisi geniş bir biçimde tanıtıldı. Bu bölümde derginin tarihi ve içeriğinden bahsedildi. Detaylı bir biçimde derginin devam edebilmesine vesile olan kurum, yürütücü ve yazarlardan bahsedildi. Sonra dergide çıkmış yazıları analiz ettik ve derginin 233 sayısında çıkmış bütün yazıları bir tablo şeklinde sıraladık.

İkinci bölümde Sivore Dergisinin iletişim dili pratik bir biçimde incelendi. Derginin dili cümleler bakımından yorumlandı ve bu bölümde cümlelerin içerik ve kurulum açısından incelendiği iki bölümden oluştu. Sonra derginin dili pratik açıdan

iki başlık altında incelendi: birinci bölüm Sivore Dergisinde Latin harfleri ile imla kurallarının öğretimi ve ikinci olarak İngiliz dilinin öğretimi.

Anahtar kelimeler: Yayıncılık, Çocuk Yayıncılığı, Çocuk, Çocukluk, Kürtçe Çocuk Dergileri, Sivore Dergisi.



ABSTRACT

Ghareeb Majeed Muhammad Muhammad, *Children's Publishing and Communication Language: Example of Sivore Magazine*, Graduate Thesis,

The importance of spreading children has always been a thirst. The world's first children's newspaper was published in France. It was published between 1747 and 1791 under the title Friend of the Children. The history of broadcasting in Kurdish newspapers with Kurdistan for the Kurds began in 1898, followed by Turkey, Iraq and many other places came in many magazines and newspapers, but the removal of the children was a private newspaper until 1946.

This thesis examines children's publishing and the language of communication in Sivore Magazine. The magazine itself is special, published for children, The topics prepared in the magazine are analyzed by language. The aim is to show the role of the magazine in Kurdish children's publishing and the works published in the magazine.

This work, after the introduction, introduction and conclusion, which consists of two parts, first discusses the purpose and method that has been followed. The thesis framework is described, the explanations and the sources used are also identified.

This thesis consists of two parts, in the first part the concepts of children, childhood and children's publishing are examined in general. The history of world children's publishing, both old and new, has been briefly studied. Then the history of children's publishing in the Kurdistan Region is mentioned. In this context, publications in Turkey, Syria and Iran, especially for children, are mentioned in this section. Then we briefly dwell on the literary subject, mentioning the names of some books and authors who have previously published products for children.

In the second part Sivore magazine is introduced in detail. This section discusses the history and content of the magazine. Also briefly mentioned are the institutions, directors and writers of the journal who have led the magazine to continue. After we have analyzed the articles of the journal, then the totality of the articles in 233 issues, are listed in a table.

In the second part, the communication language of Sivore magazine is practically explored. The language of the journal is interpreted in this way by the sentence, which can also be divided into two parts, the sentence by the content and the sentence by the structure. The language of the journal has since been studied by practice which also includes two sub-titles, the first being the teaching of the Latin script in the journal Sivore and the teaching of the English language.

Key Words: Publishing, Children's Publishing, Children, Childhood, Kurdish Children's Magazines, Sivore Magazin.



PÊŞGOTIN Î SPASÎ

Li gor ku çavkanî ji me re radigihînin; tê texmînkirin ku zimanê Kurdî, di cîhanê de, ji alîyê 40 milyon kesî ve tê axaftin. Her wiha heta niha bi vî zimanî gelek pirtûk, rojname û kovar hatine çapkirin. Ji alîyê din ve îro, zimanê Kurdî di hemû alavên ragihandinê (TV, rojname, înternet û hwd.) de tê bikaranîn. Bi rastî; heta îro jî hê yekrêzî, yek-elfabeyî û yek-lehçeyî di nav vî zimanê navbûrî de nehatiye pêkanîn.

Ev tez ji du beşên sereke pêk tê, beşa ewil di serî de, me xwestiye, hin zanyarîyan di bara zarokan de berçav bikin, giringî û armanca weşangerîya zarokan bidin xuyakirin. Piştî dîroka weşangerîya zarokan hatiye lêkolînkirin, bi awayek fireh weşanên Kurdî yê ku ji bo zarokan hatine weşandin, di tezê de cî girtine.

Mijara sereke ya teza me kovara Sivore ye. Di vî alî de bi awayek gelemperî, me nivîsên kovara Sivore xwendine, piştî jî ew nivîs hatine analîzekirin. Zimanê kovarê hatiye lêkolînkirin.

Ez berîya her tiştî spasîya şewirmendê xwe, mamostayê qedirgiran Prof. Dr. Mehmet Zeydîn YILDIZ dikim, ewê ku bi pêşniyarî û rê nîşankirina wî gelek tarîti li ber min ronî bûn. Hem di warê Kurdîzanebûnê de hem jî di warê akademîk de arîkarîyên wî gelek çêbûn. Spas ji bo her kesê ku ji bo sererastkirin û têkûzbûn û dewlemendkirina tezê fikr û ramanên xwe yê nîrxbilind, bi min re parve kirine. Her wiha di pêvajoya vê xebatê de ji bo sebr û tehemul û arîkarîya wan ya manewî, ez ji hevjiîna xwe ya hezîrî û her çar kulîlkên xwe yê delal, Dilîn, Pêlîn, Hîwa û Ehmedî re jî, bi dilgermî spas dikim. Xwedayê mezin (c.c.) her daîm digel wan be û wan di herdu cîhanan de serfiraz û bextewar bike.

Ghareeb Majeed Muhammad

22.09.2020-Zaxo

NAVEROK

KURTE	VIII
ÖZET.....	VIII
ABSTRACT.....	VIII
PÊŞGOTIN Û SPASÎ.....	VIII
NAVEROK	VIII
DESTPÊK.....	1
1. Mijara Tezê.....	2
2. Armanc û Giringîya Tezê.....	3
3. Materyal û Rêbaz.....	5
4. Asteng û Zehmetiyên Tezê.....	6
5. Jêderên Sereke yên Tezê.....	6
BEŞA YEKEM: WEŞANGERÎYA ZAROKAN.....	8
1.1. Bi Giştî Weşangerîya Zarokan.....	8
1.1.1. Weşangerîya Zarokan û Giringiya Wê	9
1.1.2. Armanca Weşangerîya Zarokan.....	10
1.2. Dîroka Weşangerîya Zarokan Li Cîhanê.....	11
1.2.1. Serdema Kevin	11
1.2.2. Serdema Nû	12
1.3. Weşangerîya Zarokan Bi Zimanê Kurdî	14
1.3.1. Weşangerîya Zarokan Li Herêma Kurdistanê.....	20
1.3.1.1. Kovarên Zarokan Yên Li Herêma Kurdistanê Hatine Weşandin.....	21
1.3.1.1.1. Zaraveya Kurmancî.....	21
1.3.1.1.2. Zaraveya Soranî	22
1.3.1.2. Li Herêma Kurdistanê Weşanên Televîzyonên Taybet ên Ji Bo Zarokan.....	24
1.3.2. Weşanên Zarokan ên Kurdî Ku Li Tirkîyeyê Hatine Weşandin.....	26
1.3.2.1. Kovarên Zarokan.....	26
1.3.2.2. Weşanên Televîzyonan û Televîzyonên Taybet ên Ji Bo Zarokan	28
1.3.3. Weşanên Zarokan ên Kurdî Ku Li Îranê Hatine Weşandin	30
1.3.4. Kovarên Zarokan ên Kurdî Ku Li Sûrî Hatine Weşandin.....	31
BEŞA DUYEM: DANASÎNA KOVARA SIVORE Û ZIMANÊ RAGÎHANDÎNÊ	33
2.1. Dîroka Kovara Sivore.....	33

2.1.1.Navê Sivore	36
2.1.2.Weşan û Belavkirina Kovarê	36
2.2.Nivîskarên Kovarê	38
2.3.Analîza Nivîsên Kovara Sivore	40
2.3.1.Babetên Kovarê û Hejmarên Wê.....	42
2.3.2.Formên Nivîsên Kovarê	47
2.3.2.1.Formên Nivîsên Kurt	48
2.3.2.2.Formên Nivîsên Dirêj.....	50
2.4. Di Kovara Sivore De Zimanê Ragihandinê.....	51
2.4.1. Ji Aliyê Sentaksê ve.....	53
2.4.1.1. Ji Aliyê Naverokê ve.....	54
2.4.1.1.1.Hevokên Ragihandinê.....	54
2.4.1.1.2.HevokênPirskirinê.....	59
2.4.1.1.3. Hevokên Xwestek û Daxwaziyê.....	67
2.4.1.1.4.Hevokên Baneşanî	68
2.4.1.2.Ji Aliyê Avasaziyê ve	70
2.4.1.2.1. Hevokên xwerû	71
2.4.1.2.2. Hevokên Hevedudanî.....	72
2.4.2.Ji Aliyê Praktîkê ve	74
2.4.2.1.Hînkirina Rênivîsa Latînî.....	74
2.4.2.2. Hînkirina Alfabeya Latînî	75
2.4.2.3. Weşandina Çîrok û Helbestan Bi Tîpên Latînî	77
2.4.2.4. Fêrkirina Zimanê Ingilîzî	79
ENCAM.....	84
ÇAVKANÎ.....	86
PÊVEK.....	90

DESTPÊK

Wekî pêwîstiya ke dîrokî, di serdemên cuda cuda de çapemeniya Kurdî ji bo xurtkirina bizava rewşenbîrî û zanistî roleke berbiçav lîstîye. Ev rol, ji bo nivîskar û rojnamevanên Kurd bûye çirayek û ji wan re rêya rewşenbîrî û zanistiyê vekirîye. Daxwaza wan ev e ku ziman û çanda Kurdan bi rêya çapemeniyê di nav cîhanê de bidin nasîn û belav bikin. Her çawa be, di serdema Îngilîzan de çapemeniya Kurdî hebûna xwe da qebûl kirin, dîsa jî desthilatdarên cuda cuda yek li pey yekî bi hêz û şiyana xwe desthilata xwe li ser Kurdan xurt kirin. Lê dîsa jî Kurd bi hewl û xebatan li hemberî wan sekinîn. Belku bi rêya çapemeniyê roj bi roj winda nebû, bes di serdemên zor û zehmet de çapemeniya Kurdî pêşxistin. Ji ber vê, xebatên çapemeniya Kurdî giring in.

Destpêka peydabûna rojnamegeriya milletên cîhanê, bi taybetî xwedî dîrokek in û ew dîrok jî girêdayiyê hin sedemên taybet in. Di serî de pêwîst e jiyana wî milletî ji aliyê siyasî û civakî ve bê zelalkirin. Ji bo behskirina dîroka rojnamegeriya Kurdî lazim e ku em bi kurteyekê li ser rewşa siyasî ya Kurdan ya wê serdemê rawestin. Di sala 1882an de Îngilîzan welatê Misrê dagir kir. Wekî tê zanîn di pêşî de Misr di bin kontrola Osmaniyan de bû. Gelek siyasatmedar û rewşenbîrên Kurdan ji aliyê Osmaniyan ve li Misrê hatibûn mişextin. Hejmarekê ji wan li Misrê jiyana xwe didomand. Yek ji wan Mîr Celadet Elî Bedirxan û beşek ji malbata Bedirxaniyan bûn. Piştî Îngilîzan Misr dagir kir, desthilata Osmaniyan li wê deverê bi awayê pratîkî nema. Ev yek jî bû sedem ji bo dijberiya di navbera Osmanî û Îngilîzan de zêde bibe. Ew dijberî, heta bi Şerê Cîhanî yê yekem jî her berdewam dike. Osmaniyan hewl dida ku zêdetir bala gelê Misrê bi aliyê xwe de bikişînin. Hewla wan jî zêdetir bi rêya rojnamegeriyê bû. "Li Misrê hinek rojname di bin tesîra Osmaniyan de dihatin nivîsandin, hinek ji wan bi rêya alîgirên xwe damezrandin, rojnameyên wekî Al-Burhan, Qahîre û El-Ehram bi alîgiriya Stenbolê dihatin weşandin." (Mezher, 1987: 57).

Ev yek dibe sedem ku Îngilîz her tim arîkariya hewildanên dijberê Osmaniyan bikin. Qahîre, ji bo Îngilîzan navendeke giring bû. Wekî di serî de me amaje pê kir, beşek ji malbata Berdirxaniyan li Misrê dijiyan, ji ber vê sedemê Misr ji bo zayîna rojnamegeriya Kurdî cihê ewil e.

Di dîroka kurdan de gelek weşan cara pêşîn ji aliyê malbata Bedîrxanîyan ve hatine kirin. Rojnamegeriya Kurdî jî wisa bûye. Piştî Mîqdad Mîdhet Bedirxan, birayê wî Ebdurrehman Bedirxan dest bi weşandina rojnameya *Kurdistanê* kiriye. Di 22 Nîsana sala 1898an de rojnameya *Kurdistanê*, wekî yekem rojnameya Kurdî li Qahîreyê hat weşandin. Ji aliyê Mîqdad Mîdhet Bedirxan ve li çapxaneya Al-Hîlalê hat çapkirin. Di nivîsîna yekem rojnameyê de Mîqdad Bedirxan wiha nivîsandiye; "Sed hezar şukir û hemd ji Xwedê Teala re ku em misliman xeliq kirine û ji bo zanîna îlm û merîfetê hiş û zeka daye me. Bi elimandina îlm û merîfet re gelek ayetên celîl û ehadîsên şerîf hene. Di dinyayê de çi dibe, çi nabe, cerîde dinivîsin. Heyfa min tê ji Kurdan, Kurd ji gelek qewman zêdetir xwedî hiş û zeka ne, camêr in, dibînin xwedî, rast û qewî ne, xurt in, dîsa wek qewmên din ne xwenda ne." (Bedirxan, 1898: 1).

Çapemenî, rêyeke gelekî bi hêz û xurt e. Kurd, bi vê rêyê dikarin ziman û çanda xwe winda nekin. Kurd, ji ber bindestiya xwe, rastî gelek êrîş û zehmetiyan hatine. Di gelek serdeman de zimanê Kurdî, li vê deverê, di dibistan û cihên giştî de hatiye qedexekirin. Rewşenbîr û rêzanên Kurdan weke alternatîv çapemenî bikar anîne. Em dibînin ku çapemeniya Kurdî, ji salên 1898an heya bi serhildana sala 1991an temamkera xebat û çanda Kurdan bûye. Ne tenê wekî alavek hatiye bikaranîn, belku wekî pêdiviyeye serdemî têkilî pê re hatiye avakirin. Ji ber vê yekê lêkolînên li ser dîrok û çawaniya pêşdeçûna çapemeniya Kurdî pir giring in.

1. Mijara Tezê

Me di vê xebatê de behsa weşangeriya zarokan a kurdî kir. Ji hejmara yekê heya bi 233an me lêkolîn li ser zimanê kovarê kir. Me hewil daye ku di weşangeriya zarokan a kurdî de rola kovarê bê tespîtkirin.

Ev tez ji du beşan pêk tê, di beşa yekem de bi awayekî giştî weşangeriya zarokan hatiye lêkolînkirin. Her wisa dîroka weşangeriya zarokan a Kurdî û ya Cîhanî, di serdemên kevin û nû de bi kurtasî hatîye lêkolînkirin. Her di vê çarçoveyê de weşanên li Tîrkiye, Sûrî û Îranê yê taybet bi zarokan, di vê beşê de hatiye behskirin. Piştî bi kurtasî me navên hinek pirtûkên nivîskarên ku di qada weşangeriya zarokan de ked kirine, hildane. Di beşa duyem de jî me hewil daye

kovara Sivore bidin naskirinê, paşî em zimanê kovarê ji alîyê Sentaksê ve şîrove bikin. Her wiha me hewl daye ji alîyê praktîkê ve jî zimanê kovarê lêkolîn bikin.

2. Armanca û Giringîya Tezê

Wekî tê zanîn rojnamegeriya zarokan, nivîseke taybet e. Ji bo zarokan tê nivîsîn. Ew ji alîyê mezinan ve ji bo temenên cuda cuda yên zarokan tê nivîsandin. Di hinek babetan de zarok bi xwe beşdar dibin û nivîsên li gor temenên xwe dinivîsin. Ev tişt ji aliyê mezinan ve ji bo zarokan, bi armanca perwerdeyeke taybet tê nivîsîn.

Armanca me ew e ku em di serî de zimanê kovarê binirxînin û li ser rola zimanê Kurdî bisekinin. Komek lêkolîneran îsbat kiriye ku zarok bi fêrbûna zimanî hêz û îrada wan pêşde diçe, ji alîyê têgehiştin ve zarokek xwedî mêjîyekî fireh perwerde dibe. Taybet ew lêkolîn bi zêdetirîn balê didin ser zimanê makê. Tê zanîn ku Kovara Sivore ji bo zarokên Herêma Kurdistanê bi zimanê makê ye. Armanca min ev e ku ez lêkolînê li ser zimanê nivîsên kovarê bikim û bandora wê li ser zarokan eşkere bikim. Ji ber ku niha di cîhanê de giringîyeke zêde bi zimanê makê tê danê. Komeleya Giştî ya Neteweyên Hevgirtî di sala 1991an de, 21ê meha sibatê ya her salê wekî Roja Cîhanîya Zimanê Makê destnîşan kiriye. Di vê rojê de xebatên cuda cuda li cîhanê tên kirin.

Di dîroka Herêma Kurdistanê de, gelek caran Zimanê Kurdî hatiye qedexekirin. Lê vê yekê bandor li ser zimanê makê nekiriye, ji ber ku rewşenbîr û lêkolîner û helbestvanên Kurd xebatên zêde kirine, da ku zimanê makê wînda nebe, bi taybet ji alîyê rojnamegerî de. Kovara Sivore mînakê baş e, her tim fêrbûna Zarokên Kurdan xwestiye. Lewra armanca me ew e ku em di vî alî de keda wan binirxînin û em lêkolîneke bi vî rengî guncayî dibînin ku ew ked bê nîrxandin.

Paşî ku me hejmarên kovarê di tabloyekê de kom kirin, ew mijar yek bi yek şîrove kirine. Di alîyê dîrokî de nivîsên balkêş hene, komkirina wan nivîsan armanca din ya vê lêkolînê ye. Her wisa mijaên erdnîgarî û zanyariyên giştî, di kovarê de cih digrin. Dibe ku ew nivîs di dahatû de bibin çavkanî ji bo lêkolîneran. Belku ev lêkolîn rêya wan siviktir bike û ji bo wan bibe çavkanîyeke bingeîn.

Di aliyekî din de jî di warê rojnamegerîyê de lêkolînên wiha kêr hatine kirin. Em dixwazin di vê lêkolînê de bi rengekî giştî nîşan bidin û cihê kovarê di nav dîroka kovarên Kurdî de diyar bikin.

Têkiliya zarok û rojnamegerîyê gelek bi hêz e. Egerên/îhtîmalên ku vê têkiliyê bi hêz dikin, yek jê dîtbariya rojnamegerîyê ye û yeka din jî cazîbedariya wê ji bo zarokan û hesta meraqa wan e. Êdî pir eşkere ye ku medya ji bo sosyalbûn, geşedana zihnî û zimanî, siyasîbûn û bidestxistina fikr û îdeolojiyên cuda yên zarokan, xwedî tesîreke mezin e. Armanca din ew e ku em tesîra Kovara Sivore li ser zarokên Herêma Kurdistanê eşkere bikin.

Di vê xebatê de em ê wan amûrên ku me li jor di beşa destpêkê de hejmartine, hemûyan raxin ber çavan. Bi tenê kovar, rojname, televîzyon û bernameyên televîzyonê yên ji bo zarokan hatine amadekirin, bidin nasandin. Lewra amûrên din hem di Kurdî de pir lawaz in, hem jî dibe ku mijar zêde berbelav bibe ku ev jî ji sînorê gotarekê bibûre.

Di dîroka rojnamegeriya zarokan de gelek xebat ji bo zarokan hatine kirin, lê ji aliyê akademîk ve pir xebat li ser nehatine kirin. Giringîyeka Kovara Sivore jî ev e ku wê bi hejmareke zêde tîr û tije têkilîyeke pir mezin ji bo zarokan daye nîşan. Ew cuda cuda di her hejmarên xwe de li ser mijara giringîya perwerdeyê sekiniye. Ew hem bi wergera çîrokên cîhanî û hem jî bi çîrokên herêmên Kurdistan yên balkêştirîn di hejmara her kovarê de tîr û tije kiriye. Ji aliyê pedagojîk ve jî, wê bandoreke pozîtîf li ser ramanên zarokên Kurd hêstîye. Zarokên ku kovarê dişopînin wek hêviyeke mezin li benda hejmareke nû dimînin. Çîrokên kovarê hem ji bo hezkirina ajalan, hem jî ji bo hezkirina nebatan pir fêde li ser ramanên zarokên Kurd dikişînin. Zarok hinek caran bi çîrokên sosret xemgîn dibin, hinek caran jî pir keyfxweş dibin. Edîtor û grafîkerên kovarê pir pispor in û hemû berhemên wan bala zarokan dikişînin. Li Herêma Kurdistanê pîrsgirêka mezintirîn di perwerdeyê de cudabûna Soranî û Badînî bû. Ev kovar bi Badînî derdiket ji bo sedema hezkirina devoka Badînî.

Di vê lêkolînê de, em li ser 233 hejmarên Kovara Sivore, xebitîne. Alîyê ziman û bandora wê li ser zarokan, armanca me ya sereke ye. Kovar bi zimanekî hêsan, tê nivîsandin, bi rengekî ku zarok bi rohnî ji wan nivîsan fêr bikin. Ji bilî ziman, Kovara Sivore di hemû alîyên jîyanê de, bandoreke baş, li ser xwendevanên

kovarê hiştiye. Bi sedan mijar û gotarên bi nirx, rûpelên xwe pê tije kirine.. Me yek bi yek ew rûpel hildane, bi rastî ez vê kovarê, ji bo lêkolîneke wiha hêja dibînim. Xebateke bi salan, me karî di dema çend mehan de temam bike û wê ji bo xebatkar û xwendekarên kovarê bike dîyarî. Armanca me ev e ku ev xebat bibe çavkanîyeke baş, ji bo xebatên piştî vê, ew xebatên di bara rojnamegerîya zarokan de.

3. Materyal û Rêbaz

Di rêbaza nivîsînê de çend çavkanî derbas dibin, di serî de hejmarên kovarê bi xwe çavkaniya eslî ye. Hejmara 1ê- heta bi 233an bidestxistine. Beşek ji kedkarên kovarê yên hê sax dîtine, me hevdiştinên fireh bi nivîskar, wênekêş û edîtorên wê re kirine. Em bi van hevdiştinan anekdotên giring wekî roportajan dinirxînim û van xebatan li ser çar merheleyan pêk tînim.

- Komkirina materyal û çavkanîyan

Di vî alî de me hin çavkanî kom kirine, li pirtûkxane û saytên internê, yên li ser babata me guncayî bin. Bi kesên di alîyê ziman û rojnamegerîyê de pispor re hevdiştin pêk hatine. Her wisa me hejmarên Kovara Sivore bidest xistine. Hevdiştin digel kesên ku di kovarê de xebitîne, hatine saz kirine.

- Xwendina materyal û çavkaniyên ku hatine komkirin

Di qûnaxa duyem de xwandina çavkanîyên komkirî destpê dike, li gorî nav û nîşana tezê, not hatine hildan. Babet ji hev û din hatine cudakirin, di serî de yên dîrokî û paşî jî yên girêdayî ziman û rojnamegerîyê. Hejmarên kovarê yek bi yek not tên hildan.

- Analîz û senteza agahîyên ku hatine komkirin

Analîza nivîsên ku hatine komkirin destpê dike, her yek dikeve beşa xwe, ji bo karê nivîsîna tezê siviktir bibe.

- Nivîsandina tezê

Nivîsîna tezê ji xwendin, komkirin û analîza çavkanîyan pêktê. Rihet rihet teza me dikeve warê nivîsînê, me bi vî şêklî heta bi dawîyê dom kir.

4. Asteng û Zehmetiyên Tezê

Weşangerîya Kurdî ya zarokan, hinekî dereng ser hildaye. Ji ber vê sedemê, dema em dinêrin, bi hêsanî tê dîtîn ku li gor welatên din berhemên zarokan pir kêmtir in. Ji ber vê yekê çavkanî jî wekî pêwîst di bara weşangerîya zarokan a Kurdî de kêmtir in, wate pirtûkxaneya Kurdî bi giştî di vê mijarê de pirtûkxaneyekê qels e, ev yek jî ji bo lêkolînerên ku bixwazin di weşangerîya Kurdî ya zarokan de lêkolîn bikin, astengîyan dixê holê. Di aliyekê din de, weşanên wekî kovar, pirtûk, CD, malper û h.w.d gelek kêmtir in. Yê ku hatine amadekirin jî bi gelemperî şûna zimanekî zelal û hêsan, zimanê mezinan hatiye bikaranîn. Ev yek jî ji bo me astengî bû.

5. Jêderên Sereke yê Tezê

Di tezê de hin çavkanîyên sereke hatine bikaranîn. Tez jî mijarên cuda cuda pêk tê, ji bo her mijarekê hin çavkanîyên sereke bikar hatine. Di beşa yekemîn a ku têde têgeh hatine nasandin û mijarên teorîk hatine behskirin de, ew çavkanîyên sereke yê xebatên li ser zarok û weşangerîya zarokan bûn. Ji van xebatên ku me zêdetirîn bi zimanê Kurdî jê sûd wergirti pirtûka Adil Şaswarî ya bi navê *Rageyandinî Taybetmend (Ragihandina Taybetmend)*, pirtûka Erebi ya Merfes Mohammed Kamil. *Medxel Îla Sehafetul-Atfal (Destpêka Rojnamegerîya Zarokan). Çocuk Edebiyatı*, pirtûka Mohammed Abî- Bakir a bi navê *Muxtar Al-Sahah*, her wisa pirtûka Omêd Mesud ya bi navê *Binemakanî Dariştin Le Midîyakanda*, pirtûka Qerenî Qadirî ya bi navê *Komelge û amrazî Rageyandinî giştî*, Reza Hacî pirtûka *Derwazey Rojnamenosî*.

Dîsa di beşa yekemîn de dema behsa dîroka weşangerîya zarokan a kurdî hat kirin wek çavkanîyên kurdî gotara Reza Şiwan “*Mêjûy Edebî Mindalanî Kurd*”, pirtûka Aryan Îbrahîm a bi navê *Çawxişanêk Be Mêjoyî Rojnamewanî Kurdî*, pirtûka Idrîs Ebdullah a bi navê *Le barey Rojnamegerî Kurdî yewe*, herwisa pirtûka Ismaîl Tenya *Raberî Rojnamegerî Kurdî*, pirtûka Marif Xeznedar ya bi navê *Raberî Rojnamegerî Kurdî*, û gotara Kenan Subaşî ya bi navê *Kurte dîroka Çapemenî û Medyaya Zarokan a Kurdî* jî bi kêrî min hatin. Ji bilî pirtûk, kovar û hin tezên akademîk ên li zanîngehên Tirkiyê û Herêma Kurdistanê jî ji bo min wek çavkaniyek girîng, ji min re bûn arîkar ku ez vê beşê amade bikim.

Ji bo beşa duyem a ku rasterast behsa dîrok, taybetmendî, naverok û weşana Kovara Sivore dike jî hin çavkanî her tim li ber destê min bûn. Çavkaniya sereke helbet hejmara yekê heya bi hejmarên 233ên Sivore bûne ku ew hatine weşandin. Ji bilî hejmarên Sivore, dema behsa wê serdema ku kovar hatiye weşandin hat kirin jî, me hevdîtî digel sernivîserê kovra Sivore Selam Balayî saz kir û me hemû zanyarîyên di bara kovarê de ji wî wergirtin.

Herwisa di mijara zimanê kovara Sivore de, hin çavkanîyan di tezê de cî girtiye, pirtûka Sami Tan a bi navê *Rêzmana Kurmancî*, pirtûka Nezîr Öcek a bi navê *Rêzmana Kurmancî*, pirtûka Nerîman Ebulah Xoşnaw *Riste-Sazî*, pirtûka Komîsyona Ziman *Ristesazî Le Zimanê Kurdî Da*, pirtûka Abdull-Selam Necimedîn Abdulla û Şêrzad Sebrî Elî ya bi navê *Zimanvanî ya Tiyurî*, pirtûka Bahoz Baran ya bi navê *Rêzmana Kurmancî*, pirtûka Ebdulwehab Mohammed Xalid ya bi navê *Destpêkek Bo Zimanvanî ya Praktîk*.

BEŞA YEKEM: WEŞANGERÎYA ZAROKAN

1.1. Bi Giştî Weşangerîya Zarokan

Beriya em behsa weşanegeriya zarokan bikin, di serî de tê xwastin ku em bizanin ka wateya zarok çi ye? Zarok kî ye? Ji kîjan temenê kêmtir zarok e? Em ê hinekê bi kurtasî bersiva van pirsan ronî bikin. Di ferhengên biyanî de, "Zarok ew nêr, yan mê ye ku temenê wî/ê di bin 13 yan 14 salî de ye." (Şaswarî, 2013: 31). Her wisa bêjeya zarok, "Ji bo yekjimar û pirjimar tê bikaranîn." (Muhammed Bin Ebîbekir, 1981: 394). Ji aliyê zimanî ve wateya wê ev e ku temenê zaroktiyê temenek destnîşan kiriye, ji aliyê têkilî û têgehiştinê ve sînordar kiriye.

Wekî zarave li pey benda yekê Projeya Peymannameya Cîhanî ya Mafên Zarokan, bi wê tê naskirin ku "Mirovek heya bi temenê 18 salî zarok tê hesibandin." (Şaswarî, 2013: 31). Wate li pey vê bendê be heya ku mirov negihe temenê normal ê pêgehiştinê, zarok tê naskirin. Ev destnîşankirin arîkar e ji bo em bikarin li bin siya vê zelalkirinê rojnamegeriya zarokan bidin naskirinê û em li pey lêkolînê bi kurtasî wan pênaseya zelal bikin.

Di civaka hevdem de xuya ye ku yên herî zêde kevin û di bin tesîra rojnamegerî û weşangerîyê de dimînin, zarok in. Ji ber vê sedemê jî weşangerîya zarokan li welatên pêşketî wekî weşangerîya taybetmend cih girtiye. Ji ber vê yekê bi şiyarî û hişmendiyeke taybet, babatên zarokan tînin nivîsandin. Teknîkeka xwe ya cuda heye, ew teknîk hinekê baldartir e ji teknîka nivîsînê ya ji bo mezinan. Her wisa ji aliyê zimanî ve bi awayek sivik tê nivîsandin, peyama rasterast tê arastekirin, meselên rewanbêjî û wateya veşartî tîde cih nagire. Bikaranîna hevokan jî yên herî zêde hevokên xwerû ne, ji bo ku zarok baş têbigihin. Di aliyê wateyê de, tiştekî wateya wê kor be di rojnamegeriya zarokan de nîn e, bi kurtasî her tişt, li gorî mejiyê têgehiştina zarokî tê nivîsandin.

Xemlandina rûpelên kovarên zarokan bi wêneyên giyanewarên ciwan, taybetmendiyeke din a weşangerîya zarokan e. Ji ber ku zarok tiştekî rind e, gelekî jî rindetiye hez dike. Beşeka rûpelan bi çîrokên balkêş tînin dagirtin û ew bi piranî çîrokên perwerdehiyê û nesîhet in ji bo ku zarok pê ve girêdayî bimîne.

1.1.1. Weşangerîya Zarokan û Giringiya Wê

Beriya em behsa giringiya weşangerîya zarokan bikin di serî de pêwîst dike ku em pênameyê bidin weşangerîya zarokan. Gelek pênameyên taybet ji bo weşangerîya zarokan hatine kirin. Abdulwehab Yusif wiha pêname dike ku, "weşaneke ji bo zarokan arastekirî ye." (Merfes Muhammed Kamil, 2003: 37). Nivîskara Ereba Leyla Abdulmecîd pênameyeke nêzîk vê dike, "Hinek çapkirî yê dewrî ne (periyodîk in), di binyatê de ji bo zarokan e, nivîsên cuda ne, li pey temenê zarok têde derbas dibe, eger araste kirîbe wê demê kesên mezin ew nivîsiye." (Leyla Abdulmecîd, 1999: 17).

Piştî van pênameyan weşangerîya zarokan bi awayek berfirehtir dikeve pêşîya me, "Rojnamegeriya zarokan ew kovarên bi edebîyat, zanist û rewşenbîriya zarokan ve taybet in ku ji aliyê saziyên taybet ve tên serperîştîkirin." (Merfes Muhammed Kamil, 2003: 37). Kêmasiya vê pênasê ev e; rojname û kovarên zarokan ji aliyê saziyên hikûmetê ve jî tên weşandin, naxwe herî zêde jî ew yê perwerdehiyê ne. Ew roleke mezin di perwerdekirina zarokan de dilîze. Bi giştî weşangerîya zarokan nivîseke taybet e ji bo temenên cuda yê zarokan tê nivîsandin. Di hinek babetan de zarok bi xwe beşdar dibe, nivîsan li pey temenê xwe dinivîse. Armanca sereke jî perwerdekirina zarokan e. "Amûreke giring e, li xweşîya zarokan diçe, xwediyê wê her zarok in." (Merfes Muhammed Kamil, 2003: 39).

Ev pêname ji bo me diyar dîkin ku çî pênameyên hevgerî ji bo weşangerîya zarokan nehatine kirin. Ji ber ku her zarokek di qûnaxeke cuda de ye, naxwe zehmet e ku em bikarin pênameyeke taybet ji bo mijarê bikin. Her wisa her yek li gor pisporiya xwe pênameyan dike. Mijarên di weşangerîya zarokan de derbas dibin mijarên giştî ne, gelek zanist têde tên behskirin mînak; nijarên perwerdehî, zimanî, bijîşkî, derûnî û edebî... Gelek zanistên din jî têde cih digrin.

Weşangerîya zarokan di aliyê perwerdeyî de roleke bingeîn dilîze, zarok bi rêya weşangerîyê zanistên nû hîn dibin. Ev yek jî ji bo avakirina kesayetiyeke erênî ji bo zarokan dibe arîkar. Di rastîyê de ev ji bo weşangerîya zarokan giringtirîn xal e.

1.1.2. Armanca Weşangerîya Zarokan

Bi rastî mirov nikare di lêkolînek wiha de behsa hemû armancên weşangerîya zarokan bike.. Lewra her saziyeke girêdayî weşangerîya zarokan bi dehan armanc hene.. Her wisa ew armanc ji miletekî ji bo miletek din cudahiya xwe heye. Ji ber ku di her miletekî de pêwîstiyên zarokî ji miletek din cuda ye; heger çi qeder komeke xalên hevbeş hebin jî.. Di lêkolîna ku me kirî de em ê zêdetir li ser xalên hevbeş rawestin..

1. Karên pêşîn ên ku weşangerîya zarokan li ser disekine, kesayetiya zarokan e. Di vê mijarê de weşangerî hewl dide ku zarokekî xwedî fikr û raman ava bike. Ew keseyetiya ku di jiyana pêş de krîstal bibe. Xwedî cîhanek taybet bibe, ji bo avakirina keseyatiya zarokekî, weşangerîya zarokan li ser sê hewcedariyan dixebite. Hewcedariya behre, xeyal û bedewî. Dibe ku kesek bibêje; eleqeya van hewcedariyan bi keseyatîyê ve çawa ye? Her zarokek dema hêdî hêdî di jiyane de digihe, xwedî behreyek taybet e, weşangerîya zarokan deriyê behredariyê ji bo zarokan vedike. Karên wî hêsan dike ku ew zûtir behreya xwe bipêşde bibe. Bi rastî ev xal, ji bo zarokekî ku kesayetiya wî bi awayek baş ava bibe, bingeîn e.

Xeyal hewcedariyeke din ya giring e ji bo zarokan. Weşangerîya zarokan dixebite ku xeyalê bi her cure bipêşve bibe. Bi taybetî bi rêya wan çîrokên ku diweşînin, ew kesayetên ku em di cîhana xwe de nebînin û ew bûyerên ku em nikarin wan biqewimînin di çîrokan de hem tên dîtin, hem jî tên qewimandin. Ev yek wisa dike ku xeyala zarokan fireh bibe. Vêca bûyerên çîrokên ku tên nirxandin rast û şaş ji hev tên cudakirin. Çarçove û asoya fikrê fireh dike, carina zarok xwe wekî qehreman dibîne, carina jî xwe zana û pir têgihiştî dibîne. Encam zarok keseyetiya xwe tîne pêş bi rêya xeyalkirineke erênî dibe zaroyekî xwedî behre jî..

Zarok rûpeleke spî tê hesibandin, bi bedewî bi navûdeng e. Lewra yek ji avantajên lêpîrsîna baş di weşangerîya zarokan de, jêhatîbûn û peydakirina şîroveyan guncaw ên derûnî û giyanî û civakî yên zarokan e, nemaze ev lêpîrsîn pîrsgirêk û rastîyan vedigire. Pêwîst e, em hinek wêneyên nîqaşî lêkolîn bikin da ku dîmen û rastîyên ku bi wan re dibin, di nav perdeyên lêpîrsînê de balkêştir bibin. Zarok bedewtiyê dixwaze, wêneyên rind bala zarokî dikişîne ser xwe, wisa dike ku ew her tiştên baş bedew bibîne. Wêneyên şaşîyan jî zarok jê dûr bikeve. Encam zarokek

bedew û xwedî xeyaleke erênî di pêşerojê de peyda bibe û keseyetiyeke xwedî behreyeke baş cih bigre.

2. Armanca giringtirîn ji weşangerîya zarokan ev e ku rûhê tevlîbûnê û hesteke dilsoziya neteweyî belav bikin, nêrîna welatparêzî û parastina axa xwe û pîroziyên milletê xwe biparêze.

3. Armancek din ji weşangerîya zarokan, kevneşopî û adetên xwe biparêzin ku bi nêrîna me xaleke hevbeş e li cem piraniya milletên cîhanê. Di vê mijarê de zêdetir rojnamegerî dixebite li ser wê yekê ku zarok jiyana bav û kalên xwe yên pêşîn bizane, wan kevneşopîyan binirxîne, her wisa adatên milletê xwe bizane.

4. Weşangerî roleke giring dilîze ji bo ku zarok di avakirin û pêkanîna nirxên olî û civakî de pişkdar bibe.

5. Weşangerî rê xweş dike ji bo zarok ji mafên xwe haydar bibin, ji bo her temenekî ku zarok têde derbas dibin.

6. Fêrbûna zimanê makê mijareke din ya giringtirîn e.

Weşangerîya zarokan gelek armancên din hene, dibe ku em çendan ji wan binivîsin, di vê mijarê de em van şeş xalan hêjayî amajekirinê dibînin.

1.2. Dîroka Weşangerîya Zarokan li Cîhanê

1.2.1. Serdema Kevin

Li cîhanê yekem rojnameya zarokan li Fransayê hatiye weşandin. Di navbera salên 1747-1791an de bi navê *Des Amis Des Enfants* “*Dostê Zarokan*” hat weşandin. Nivîser û xwediyê rojnameyê ne diyar e, xwediyê rojnameyê navê xwe kiribû ”*Dostê Zarokan*”. Lê zêdetir kesên li ser rojnamegeriya zarokan dixebitin, di wê baweriyê de ne, ku yekem rojnameya taybet li ser zarokan di sala 1830an de dîsa li Fransayê hatiye weşandin. Di sala 1832an de her li Fransayê kesek bi navê "Emil Dur Cirardan" rojnameyeke din bi navê *Journal Pour Enfants* Rojnameya “*Zarokan*” derxist.

Li Amerîkayê di sala 1896an de kovara *World (Cîhan)*ê ji aliyê (Joseph Pulitzer) ve hat weşandin.” Di Kovarê de wêne ji bo hilawîstinê dihatin weşandin û ew ji aliyê wênekêşê navdarê Amerîkî (Outcult) ve dihatin kişandin.” (Murfes Al-

Tarabîşî, 2003: 30). Dema em li pey hinek çavkaniyan diçin, em dibînin ku ji aliyê dîrokî ve, peydabûna rojnamegeriya zarokan li Amerîka û Ewropayê di yek serdemî de destpê kiriye. Heya bi wê astê Amerîkî dibêjin despêka peydabûna rojnamegeriya zarokan li cem me bûye. Belgeya wan jî ev e ku dibêjin,” Yekem kovara zarokan bi navê *The Children Magazine (Kovara Zarokan)* di sala 1798an de hatiye weşandin.” (Mohammed Ebdulrezaq Yunis, 2004: 231).

Paşê, di sala 1915an de,” Jinek bi navê (Biry) yekem rojnameya Brîtaniyayê ya zarokan weşand. Navê rojnameyê jî *Scool Garden”Baxçeya Dîbistanê”* ye.” (<https://www.alemancenter.com/forum/search.php?do=process> 13-1-2020). Piştî van salan êdî rojnamegeriya zarokan li hemû cîhanê hêdî hêdî bipêş dikeve.

Li Afrikayê di sala 1944an de Naycîriya yekem kovara zarokan weşand. ”Navê kovarê *’Nigerian Review’* paşê navê wê bi *“New Nigerian”* guhertin (Merfes Al-Tarabîşî, 2003: 31).

Li Amerîkayê hin çîrok bi awayê belavokên dîwar, hatin weşandin. Piştî rojnamegeriya zarokan, li cem Ereban jî belav bû, li Qahîreya paytexta welatê Misrê, di 1870an de yekem rojnameya zarokan hat weşandin.

Bi weşana Kovara *The Live (Jiyan)* ya zarokan li Fransayê, di sala 1938an de, rojnamegeriya zarokan taybetmendiya xwe wergirt. Zêdetir kar li ser rojnamegeriya zarokan hat kirin. Paşî serdameke nû ji rojnamegeriya zarokan ser hildide.

1.2.2. Serdema Nû

Piştî Şerê Cîhanî yê Duyem 1938an – 1945an qûnaxek nû ya ber bi pêşketina li cîhanê serî hilda, hemû sektorên jiyanê hêdî hêdî baş bûn. Cîhanê nefeseke aram kişand, şerê navxweyî piştî heşt salan bi dawî bû. Şoreşeke nû li piraniya welatên Ewrûpa rûda. Di aliyê edebîyatê de modernîzm û paşê post-modernîzmê serî hilda. Bi rastî vê, bandoreke erênî li ser rojnamegeriyê kir, bi giştî û taybetî jî bandoreke erênî li ser rojnamegeriya zarokan kir, ji ber vê yekê em dibînin ku serdameke nû ji rojnamegeriya zarokan destpê dike, bi taybetî jî li Ewrûpayê.

Vê serdemê, du qûnaxên girîngtir hene, hewce dike ku em ji wan behs bikin. Qûnaxa yekem vedigere ji bo sala 1946an. Ji bo cara yekem bernamekeke taybet bi zarokan, di sala 1946an de li ser ekrana BBCyê hat weşandin. Dema bernamê tenê

yek demjimêr bû, lê ev demjimêr ji bo saziyên din ên rojnamegeriya zarokan bû kevneşopî. Bi rastî jî ew mîna bingehekê tê danîn. Ji ber ku rojnamegeriya zarokan li cîhanê ber bi qûnaxeke pêşketî ve meşiya. Bi dehan rojname û kovarên zarokan bi awayek nû derketin holê, bêguman piştî vê gavê dîrok, fîkr û ramanên zarokan jî bipêş ketin.

Qûnaxa duyem di Nîsana sala 1997an de Lijneya Mafên Zarokan ya Neteweyên Yekbûyî li navenda UNESCOyê civînek lidarxist, ev civîn di çarçoveya rojnamegeriya zarokan de bû. Nexşerêyeke ji 12 pêşniyaran pêkhatî, amade kiriye. "Di vê nexşerêyê de pêşniyarên ku hatine kirin ev in;

1. Divê weşangeriya zarokan ya serbixwe hebe.
2. Divê malperên zarokan ên li ser înternetê hebin.
3. Divê pirtûkxaneyên aktîv ên zarokan hebin.
4. Divê ji bo zarokan perwerdeya rojnamegeriyê hebe.
5. Divê piştgirî ji bo zarokan hebe da ku di rojnamegeriya xwe de likar bin.
6. Ji bo ku zarok ji zirarên rojnamegeriyê bîn parastin, divê xebatên erênî bi saziyên medyayê re bîn kirin.
7. Divê planên neteweyî bîn danîn ji bo ku dê û bav di piyaseya rojnamegeriyê de bîn bihêzkin.
8. Divê rojnamegerî li gorî madeya 17. a Peymana Mafên Zarokan tevbigere.
9. Divê hin rêgezên taybet bîn danîn da ku nûçeyên li ser îstîsmara zarokan neyên veşartin û bêne nîşandan.
10. Divê ji bo perwerdekirina xebatkarên rojnamegeriyê, di warê mafên zarokan de hin materyal bîn çêkin.
11. Divê komên çavdêr ên medyayê bîn sazkin.
12. Divê xizmetguzarî hebe ji bo nûçegihanên mafên zarokan".(https://www.academia.edu/ THE_HISTORY_OF_KURDISH_CHILDRENS_PRESS_AND_MEDIA. 13-2-2020).

Li gorî van rêzikan û giringiya vî warî ji bo zarokan, her ku diçû rojnamegeriya zarokan bipêş diket, saziyên taybet hatin vekirin. Li seranserê cîhanê rojane bi hezaran rojname û kovarên zarokan tên weşandin, bi hemû zimanan kanalên taybetên zarokan vebûne, bi vî rengî têkilîya zarokan bi cîhanê re berfirehtir bûye.

1.3. Weşangeriya Zarokan Bi Zimanê Kurdî

Weşangeriya zarokan di sedsala 17emîn de destpê dike. Ji wir pê ve her ku diçe berhemên ji bo zarokan zêdetir dibin. Lê eger em weşangeriya zarokan ya kurdî û ya cîhanî bidin ber hev, emê bibînin ku li gor cîhanê weşangeriya zarokan ya kurdî qels maye, têra xwe bipêş neketiye. Li gor çavkanîyên berdest, kesê ku ewil di edebiyata kurdî de ji bo zarokan berhemek nivîsandiye Ehmedê Xanî ye. Navê berhema wî Nûbihara Biçûkan e û Xanî bi vê ferhengê hewl daye ku zarokên kurd hînî zimanê erebî bike. Piştî Nûbiharê hin berhemên din jî hatine nivîsandin, piraniya van berheman ferheng in, mînak: Gulzara Îsmâîlê Bazîdî, Luxetnameyî Ehmedî ya Şêx Marûfê Nodeyî, Mîrsadul-Etfal (Şahrâhê Kûdekan) a Şêx Mihemed Kerbelayî, Eqîde ya Mewlewî wek berhemên ewil ên ji bo zarokan hatine nivîsandin, tên qebûlkirin. " (Tosun, 2018: 148). Emê bi kurtasî li ser hinek ji van berheman bisekinin.

- **Nûbihara Biçûkan ya Ehmedê Xanî, (1683).** Nûbihara Biçûkan Berhema Ehmedê Xanî, di weşangeriya zarokan ya kurdî de berhema ewil e. Ev berhem di heman demê de yekem ferhenga menzûm a du-zimanî ya kurdî tê hijmartin. Xanî ev ferhenga erebî û kurdî di sala 1683yan de nivîsandiye û xwestiye ku zimanê erebî hînî zarokên Kurdan bike. Nûbihara Biçûkan, " ji destpêkekê û 13 beşan - ji bo beşên ferhengên menzûm Qit'e dibêjin pêk hatiye. Beşa mezintirîn beşa dawî ya sêzdehan e ji 48 beytan pêk hatiye. Beşa biçûktirîn jî beşa pêncan e ji 7 beytan pêk hatiye. " (Bolelli, 2017: 27). Ehmedê Xanî di destpêka Nûbihara Biçûkan de tîne ziman ku wî ev berhem ji bo zarokên kurdan nivîsandiye;

“Vêk êxistin Ehmedê Xanî

Navê Nûbehara Biçûkan danî

Ne ji bo sahib-rewacan

Belkî ji bo biçûkê(t) Kurmancan. " (Xeznedar, 2002: 374).

- **Gulzara Îsmâîlê Bazîdî (1655-1710):** Li gor agahiyên ku li ber dest in, di dîroka edebiyata kurdî de ferhenga menzûma duyem jî Gulzar e. Gulzar di sedsala 18emîn de ji aliyê şagirtê Ehmedê Xanî, Îsmâîlê Bazîdî (1655-1710) ve hatiye nivîsandin û di medreseyan de wek pirtûkekê hatiye xwendin. "Di bara Gulzarê de mixabin agahiyên tekûz û berfireh li ber destê me nîn in. " (Tosun 2018: 148). Gulzar ferhengeke sê-zimanî ye, bi Kurdî-Erebî-Farisî.

- **Luxetnameyî Ehmedî (1790):** Ev weşan jî ferhengeke Kurdî- Erebî ye. Marûfî Nodeyî (1753-1837) di sala 1790an de ferhengeke Erebî û kurdî (zaravayê Soranî) nivîsandiye. Ev ferheng bi qasî sedsal piştî Nûbihara Biçûkan ya Ehmedê Xanî hatiye nivîsandin. " (Tosun, 2018: 148). Luxetnameyî Ehmedî di medreseyan ku bi zaraveya Soranî perwerde lê hatiye dan de, wek berhemeke giring cihê xwe girtiye. Nodeyî ji bo kurê xwe Ehmed ev ferheng nivîsandiye.

Çend ferhengên din jî di serdemên cuda cuda de, taybet ji bo zarokan hatine weşandin, mînak: *Mîrsadu'l-Et'fal* (Şahrahê Kûdekan-1912) ji hêla Mihemed Kerbelayî ve, *Eqîdeya Mewlewî* (1806-1882).

Ji bilî ferhangan weşangeriya zarokan ya Kurdî, bi awayek gelemperî xwedî weşanên pir in. Bi dehan helbestvan û nivîskar û rojnamevan kesayetîyên neskirî hene. Berhemên cuda cuda bi zimanê Kurdî- Erebî- Tirkî- Farisî weşandine. Mînak:

Nuredîn Zaza (1919- 1988): Çîrokek e navdara Nuredîn Zaza heye, taybet ji bo zarokan di hejmara 20an ya kovara Hawar ê de weşandiye. Navê çîrokê (Kurd yek in), di vê çîrokê de balê dikişîne ser ji hev nêzîbûna Kurdan. Çîrok behsa zarokeke xelkê bajarê Mûşê dike, ev zarok penaber e. Li dibistaneke Cizîra Botan dest bi xwandinê dike, mamostayê dibistanê ji xwandekaran daxwaz dike, wekî xerîb li vî zarokî temaşe nekin, wisa xuya dike ku ev jî zaroyek Kurd e, li ser nexşeyê bajarê Mûşê nîşan dike.

Konê reş (1953): Zarokên kurdan jibîr nekirine, hewl dide ku zarokên Kurdan li Sûrî zimanê Kurdî hîn bibin. Ji bo vê armancê hejmarek helbest û çîrok ji bo zarokan berhev kirine. Berhemên nivîskar Konê Reş yê teybet ji bo zarokan nivîsandine:

- Sîpan û Jîn, komeke helbestan di sala 1993an de weşandiye.

- Şagirdê Bedirxan im, komeke helbestan di sala 1996an de weşandiye.
- Hejmarek helbestan di rojname û kovarên kurdî de weşandine.

Ehmed Ismaîl Ismaîl (1961): Zêdetir di alîyê Şanoyê de xebatên vî nivîskarî hene, berhemên wî bi zimanê Erebî tîne weşandin. Berhemên wî yên taybet bi zarokan ev in:

- Lêkolîn Di bara Şanoya Kurdî de, di sala 2000î de weşandiye.
- Şanogerî, sala 1999.
- Şanoya Tewbet'ul-Seileb (Poşmanîya Rûvî), ji çar şanoyan pêk tê, di sala 2000î de weşandiye

- Reqsa Işqê, Şano ji bo zarokan, 2001.
- Bedlîsî, Şano, di 2002an de weşandiye.
- Barzanî El-Xalid (Barzanîyê Nemir), Şano ji bo zarokan, 2003.
- Qazî Mûhammed, Şano ji bo zarokan, 2003.
- Mezrea El-Seibe (Çandiniya Asê), Şano ji bo zarokan, 2001.
- Zenb El-Hîsan (Sûcdariya hesp), Şano ji bo zarokan, 2006.
- Al-Şexsiya Fî Mesrehil Al-Atfal (Kesayetî Di Şanoya Zarokan de), lêkolîn, 2006.

- Kurd Fî Mesrehî El-Sûrîye (Kurd Di Şanoya Sûrî de). 2006.
- Ehîlam El-Hîmar (xewnên ker), Şano, 2000.
- Teyr ul-Wa'î (Teyrê Hişmend), Şano ji bo zarokan, 2010.

Rizo Osê: 5 kom ji çîrokên zarokan di sala 2005 de belav kirine ew jî ev in:

1-Dîk dîko.

2-Libhinarê.

3-Bavê hepûn.

4-Şengê û pengê.

5-Finda şemal.

Her wisa Ferhadê Içmo komek helbestên zarokan nivîsîne bi navê “landik”. Osman Sebrî jî hinek çîrok li ser zimanê lawiran ji bo zarokan weşandine. Mînak: Dîk û rûvî. Cegerxwîn jî hin helbest bi çîrokî di dîwanên xwe de ji bo zarokan ristine. Mînak: Şêr û piling (<https://ku.wikipedia.org/wiki/Selamdari>. 28-7-2020).

Kamûran Alî Bedirxan (1895-1978): Nivîskar, helbestvanê Kurd Kamûran Alî Bedirxan, ev kesayetiyeke naskirî ye li cem piranîya Kurdan. Di alîyê çand û zimanê Kurdî de berhemên wî hene. Dema min pirtûka Marif Xeznedar ya di bara Dîroka Edebiyata Kurdî de dixwend, hin gotinên Bedirxan di wê pirtûkê de bala min kişandin, dema di rûniştinekê de dibêje: "Ez ne şair im, bê xwedî û belengazîya zarokên Kurdan ez pal dame ku helbestan binîvsim. Ji bo ku zarokên kurdan bi Kurdî perwerdeyê bibînin " (Xeznedar, 2006: 332). Pirtûkeke ji bo zarokan bi navê “*Elfabeya Min*” û “*Destpêka Xwendinê*” pirtûkeke xwendin û nivîsandinê hînî zarokan dike, nivîsandiye. Ji bilî van berheman çend helbest jî nivîsandine. Her wisa çend helbest jî ji bo zarokan nivîsandine" (Tosun, 2018: 149).

Osman Sebrî (1905-1993): Nivîskar û helbestvanê navdar Osman Sebrî ji bo zarokan gelek helbest û fabl nivîsandine. " Fablên Osman Sebrî hinek di kovara Ronahiyê de hatine weşandin. Wek mînak "di hejmara 5emîn de “*Çîroka Dîk û Rovî*”, di hejmara 6emîn de “*Şêr û Kêvroşk*”, di hejmara 7emîn de “*Daweta Kêzê*”, di hejmara 8emîn de “*Mih û Şêr û Gur*” di hejmara 9emîn de “*Ker û Heft Gur*”, di hejmara 12emîn de “*Gurê Pîr*”, di hejmara 13emîn de “*Kerê Dengbêj*” hatine weşandin. Helbesteke Osman Sebrî ya bi navê “*Zozan*” jî di sala di hejmara 20emîna kovara Ronahiyê de hatiye weşandin. Çend helbestên Osman Sebrî yên ji bo zarokan jî di kovara Hawarê de hatine weşandin, wek “*Dibistan*”, “*Bihar*”, “*Tevdîra Mişkan*” ". (Tosun 2018: 149).

Mihemed Necmedîm (1957): Li Silêmanîyê jidê bûye, di sala 1987an de pirtûka bi navê “*Kurte Jîyan û Karê Hunera Çar Hunermendan*” ji bo zarokan weşandiye.

Herwisa gelek nivîskar û helbestvanên kurd mijarên cuda cuda taybet ji bo zarokan weşandine. Mînak: Pîremêrd, Goran, Bêkes, Kakey Felah, Şewnim, Moeyed Teyib, Mustefa Husên, Ebdulrehman Mizûrî...

Celadet Bedirxan (1893-1951): Ji bilî beşa “*Stûna Zarowan*” a ku di Hawarê de ji bo zarokan amade kiriye, ji bo kurê xwe Cemşîd û qîza xwe Sînemxanê bi serenavê “*Reşbelek*” nivîseke ku behsa koçeriyê û zozanan dike, nivîsandiyê. Celadet Bedirxan di kovara Ronahiyê de jî beşa Reşbelekê dewam kiriye. Wek mînak di hejmara 19emîna Ronahiyê de bi serenavê “*Reşbelek-4 Ji Eta Cemşîd Re*” behsa axaftina xwe ya bi qîza xwe Sînemxan Bedirxanê re dike. Hema di bin wê nivîsê de jî behsa kitêbeke gramerê ya bi navê “*Kitêba Sînemxanê*” ya ku ji bo zarokan amade kiriye, dike. Paşê qismêke wê kitêbê di kovara Ronahiyê de weşandiye. Celadet Bedirxan kitêba Bryan Guinness ya bi navê “*Conî û Cimêma*” ya ku ji çîrokên zarokan pêktê, ji Frensî wergerandiyê kurdî (1943). "(Tosun, 2018: 149).

Mehmet Emîn Bozarslan: Di sala 1966an de alfabeyek ji bo zarokan amade kiriye. Herwisa du pirtûkên din jî bi navê *Kêz Xatûn* û *Mîr Zoro* weşandine.

Mahmûd Baksî: Ji bo zarokan pirtûkên bi navê *Zarokên Îhsan* (1978) û *Keça Kurd Zozan* (1979) nivîsandine.

Hejmareke din ji nivîskaran, taybet ji bo zarokan berhem weşandine: Kemal Burkay di sala 1988an de pirtûka *Aliko û Baz* weşandiye, Firat Cewerî ev pirtûk wergerandine: *Astrîd Lîndgen, Hennîng Mankel û Per Nîlson*. Çend rewşenbîrên kurd Amed Tigrîs, Mahmûd Lewendî, Hesenê Metê, Seyîdxan Anter û Ali Çiftçi hatine li cem hev û di sala 2004an de bi navê “*Ansîklopediya Zarokan*” ansîklopediyek weşandine. Ev ansîklopedî ji aliyê Weşanxaneyê Apecê ve hatiye çapkirin. Di sala 2014an de jî “*Hebû Tunebû Antolojiya Çîrokên Zarokan*” ya Zinarê Xamo ji aliyê Weşanxaneyê Rûpelê ve hatiye weşandin. Hejmareke din jî ji bo zarokan nivîsandine Zinarê Xamo, Murad Ciwan, Mahmûd Lewendî, Mahmûd Baksî, Kemal Burkay, Haluk Öztürk, Firat Cewerî, Mehmet Emîn...htd

Kurdên Sovyetê jî kêr zêde, di vî warê de para xwe di weşangeriya kurdî de bi giştî û ya zarokan bi taybet danîne. Li dor vê mijarê Tosinê Reşîd dibêje: Di sala 1920an de Hikûmata Sovyetê li Ermenistanê hat damezirandin, ji aliyê hikûmata Sovîyet ve biryar hat girtin ku bi zimanên kêmenetewan dibistan bîr vekirin. Sala 1921an ji aliyê (Hakob Xazaryan), li Ermenistanê (bajarê Êçmîadzîn) pirtûka “*Şems*” li ser bingeha tîpên ermenî alfabeya kurdî hat amadekirin.

(<https://pirtukweje.wordpress.com/tosine-resid-wejeya-kurdi-li-yekitiya-sovyetê/>. 30-8-2020).

Herwisa di sala 1935 an de, Emînê Evdal pirtûka “*Bihar*”ê çap dike ku helbestên ji bo zarokan bûn. Di navbera salên 1935-37 an de Erebe Şemo, Hecîyê Cindî, Emînê Evdal, Cerdoyê Gêncî, Casimê Celîl, Wezîrê Nadîrî, Ahmedê Mîrazî, Etarê Şero berhemên xwe, yê wêjeyî çap dikin. Cardin em vedigerin Tosinê Reşîd dema dibêje: Ji sala 1929 an heta 1937 an li Ermenistanê bêtirî 70 pirtûkî bi zimanê kurdî çap dibin. Ji wan pirtûkan 20 ji bo dibistanan bûn. (<https://pirtukweje.wordpress.com/tosine-resid-wejeya-kurdi-li-yekitiya-sovyetê/>. 30-8-2020).

Herwisa ji alîyê Kerlênê Çaçanî ve pirtûka “*Şêr û kew*” 1961an û Mîkailê Reşîd “*Pişîka min*” 1965î, û Simoyê Şemo “*Hikyat derheqa balçêmkêda*” 1971, Şerefê Eşîr pirtûkeke şîran, bi navê “*Gezgezk*” 1979an çap dike. Ev pirtûk hemû bi taybetî ji bo zarokan weşandine.

Ev kurteyek ji bo berhema nivîskarên Kurdan, yê taybet ji bo zarokan hatine weşandin, helbet bi dehan berhem û nivîskarên din jî hene. Di niha de li gorî lêkolînan, weşangeriya zarokan ya kurdî di pêşdeçûnê de ye.

Herwisa di alîyê rojnamegerîyê de jî. Dîroka rojnamegerîya Kurdî di sala 1898an de bi rojnameya Kurdistanê destpê kir, li pey wê çend kovar û rojname li Tîrkiye û Iraq û gelek cihên din derketin.. Lê heya bi sala 1946an çî belavokên taybet bi zarokan nehatine weşandin.. Lêbelê em jibîr nekin ku di piraniya kovar û rojnameyên Kurdî de zarokan para xwe wergirtiye, kê-m-zêde giringî dane zarokên Kurdan. Rojnameya Kurdistanê di piraniya hejmaran de têra xwe giringî daye zarokên Kurdan. Her çend nivîsên rojnameyê rasterast ji bo zarokan nehatine amejekirin jî. Zêdetir nivîs arasteyî dê û bavên kiriye.. "Di sergotara hejmara 2ana rojnameya *Kurdistanê* de, sernivîserê wê Miqdad Mîdhet gelek bi ronî peyamê arasteyî dê û bavên Kurd dike. Ji bo zarokên xwe bidin ber xwandinê." (İdrîs Abdullah, 2004: 26). Kovara Kurdistanê di sala 1919an de li Stenbolê hat weşandin, " Ji bo cara yekem di kovara *Kurdistanê* de helbestvanek bi navê Zîno helbestekê bi navê Delaliya Zarokan ji bo zarokan dinivîse." (İdrîs Abdullah, 2004: 27). Kovarên *Rojî Kurd* û *Pêşkewtin* û *Bangî Kurdistan* û gelek rojname û kovarên din, babetên

cuda li ser zarokan weşandine. Ew babet heke çî qeder rasterast ji bo zarokan nehatibin nivîsandin jî lêbelê ji aliyê babetan ve em dikarin bibêjin ku hizra rojnamegeriya Kurdî ya zarokan bi milê rojnamegeriya mezinan ser hildaye.

Piştî 48 salan ji weşana rojnameya *Kurdistanê*, di sala 1946an de ji bo cara yekem Kurdan rojnameyeka taybet ji bo zarokan weşand, bajarê Mehabadê li Îranê ji bo cihê jidêbûna kovara *Girogalî Mindalanî Kurd* di meha Sibata sala 1946an de yekem hejmara kovarê hat weşandin. Kovar ji 13 rûpelan pêkdihat, tenê sê hejmar hatin weşandin, hejmara dawî di meha nîsanê de bû. Rêveberatiya kovarê Qedrî Muderis dikir, li Çapxaneya Kurdistanê dihat çapkirin. Hîmdad Hisên yek ji nivîserên Kurd e ku di bara kovara *Girogalî Mindalanî Kurd* de dibêje; " Ev kovar yekem kovara Kurdî ye, me ji bo zarokên Kurd amade kir, em dikarin bi rêya kovarê stratîjeyê Komara Dîmûkrata Kurdistan û siyaseta dûrbîna wê îşaret bikin." (İdrîs Abdullah, 2004: 37).

Piştî hêdî hêdî xebatên ji bo zarokan serî hildan, di sala 1980an – 1997an de li Swêdê li bajarê Stockholmê bi hevkarîya Mala Kultura Kurdî, kovara *Kulîlk* hat weşandin, 17 salan kovarê berdewam kir. Tevahî 51 hejmarên wê weşiyane. Reşo Zîlan yek ji amadekarên vê kovarê bû. Her li Swêdê, li bajarê Stockholmê, di sala 1981an de kovara *Hêvî* hat weşandin, heya bi sala 1984an berdewam kir û 15 hejmar hatin weşandin. Li vir em li hember mijareke fireh disekinin, ew mijar jî kovar û tilevîzyonên taybet yê zarokan e. Di serî de emê ji Herêma Kurdistanê destpê bikin.

1.3.1. Weşangerîya Zarokan Li Herêma Kurdistanê

Di sala 1918an de dewleteke bi navê Iraqê di bin kontrola Îngilîzan de hat damezirandin. Wek eşkere beriya wê, Iraq bi tevahî di bin kontrola Osmanîyan de bû. Piştî vê beşekî Kurdan li Iraqê di bin desthilata Tirkîyê de man, beşekî wan jî ketin bin desthilata dewleta Iraqê. Ji ber vê li Iraqa nû xebatên Kurdî yê rewşenbîrî, çapxane û çapemeniya Kurdî cara ewil di sala 1918an de li Silêmaniyê di bin kontrola desthilata mêhtîngera Îngilîzan de destpê kir. Ew xebatên ku dihatin kirin carinan xweser bûn, bi rengekî giştî fîrseteka mezin bû di aliyê rojnamegeriyê de. Ew kesên ku xwesteka rewşenbîriyê li cem wan heye, bi rengekî hêsantir karîne di warê rojnamegeriyê de xebatên balkêş bikin, bi taybetî jî ji aliyê malbata Berzenciyan ve. Tê zanîn ku li Herêma Kurdistanê Zaraveya kurmancî û Zaraveya Soranî du

zaraveyên sereke ne. Herî zêde xebatên hatin kirin bi herdu zaraveyan in. Walîtiya Duhokê zaraveya Badînî ye û Walîtiya Hewlêr û Silêmanîyê bi zaraveya Soranî. Em dê wan xebatên ku li Herêma Kurdistanê ji bo rojnamegeriya zarokan hatine kirin, di bin du beşan de şîrove bikin.

1.3.1.1. Kovarên Zarokan Yên Ku Li Herêma Kurdistnê Hatine Weşandin

Li Herêma Kurdistanê, kêma zêde para xwe ji weşana kovarên zarokan hil girtiye, bi saya nivîskar û rewşenbîr û siyasetvanên Kurdan, hejmareke pêş-çav ya kovarên zarokan serhildane, hinek ji wan heta niha weşana xwe berdewam dikin. Bi gelemperî li Herêma Kurdistanê zêdetir bi zaraveya (Soranî û Kurmancî) kovar hatine weşandin. Me li gorî van zaraveyan ew kovar rêz kirine.

1.3.1.1.1. Zaraveya Kurmancî

Walîtiya Duhokê ew cih e ku yê bi Zaraveya Kurmancî (Devoka Badînî) diaxivin, lê dimînin û nivîsandin û xwendin di vê walîtiyê de bi Badînî ye. Wan jî têra xwe xebat di bara rojnamegeriya zarokan de kirine. Ev, navên hin kovaran e ku li Duhokê derketine.

1. Xalxalok (1992): Kovareke zarokan e ku wek paşkoya rojnameya Botan ji aliyê Partiya Gel a Demokrata Kurdistanê ve li Duhokê hatiye weşandin. Tenê yek hejmar jê derçûye. Ew di havîna sala 1992yan de derketiye.

2. Sivore (1998...): Di sala 1998an de Kovara *Sivore* derdikeve, heta niha jî berdewam dike, 248 hejmarên wê hene. Destgeha Xanî weşana wê dike, sernivîserê wê Selam Balayî ye. Di 2001an de kovara *Zeng û Beng* dest bi weşanê dike, heya vêga ew jî berdewam dike. 175 hejmarên wê hatine weşandin, ew li Duhokê tê weşandin.

3. Zeng û Beng (2001...): Ev kovr di 1-9-2001an li Duhokê hatiye weşandin, heya niha jî berdewam dike. 170 hejmar jê hatibûne weşandin. Yekem kovara zarokan e bi merce'iyeka Îslamî li bajarê Duhokê derdikeve, Kovara *Zeng û beng* mijarên girêdayî ola Îslamê û maf û perwerdeya rewşenbîrî, belav dike.

4. Kovara Kepir (2003- 2009): Yek ji wan kovarên navdar e ku di sala 2003an de dest bi weşanê kir, di mehê de carekê derdiket. Destgeha Spîrêzê bi rastî jî

di vê aliyê de xebatên pir giring kirine. Rêxistineke Swêdê bi navê Diyakoniya gelek piştgîrî daye Moeyed Teyb, ku wî li ser vê mijarê xebatên pir balkêş kirine. Moeyed Teyb hem sernivîser hem jî xwediye kovarê bû. Her wisa Necmedîn Bîrî bergê kovarê dixemiland. Kovara *Kepir* nêzikî şeş salan berdewam dike û 75 hejmarên weşandin. Hejmara dawî di payîza 2006an de tê weşandin. Kovarê kêmkirî zêde 50 rûpel derdikeve. Kovara *Kepir* bi zimanekî vekirî dihate nivîsandin ji bo zarokên Kurdan, ji aliyê fêrbûna zimanê ve pir fêde jê girtin û ji bo raman û xeyalên wan pir bi kêrhatî bû.

1.3.1.1.2. Zaraveya Soranî

Yekem kovara Kurdî taybet ji bo zarokan, li Herêma Kurdistanê di sala 1972an de bi zaraveya Soranî hatiye weşandin. Emê li ser hinek nav û nîşanên wan kovaran bisekinin ku bi zaraveya Soranî derketine.

1. Kovara Estêre (1972- 1974): Kovara *Estêre* dibe yekemîn kovara taybet ji bo zarokan, ji aliyê Komeleya Rewşenbîrî Kurdî ve wek paşkoya/pêveka kovara *Rojî Kurdistan* li Silêmanîyê hatiye weşandin. "Yekem hejmara wê di 1ê Gulana sala 1972an de hat weşandin. Tenê sê hejmar hatin weşandin. Di yekê meha Adara 1974an de hejmara wê ya dawî hat weşandin." (Îdrîs Abdullah, 2004: 143). Amadekarên vê kovarê Ehmed Seyîd Elî Berzincî û Lale Ebde ne. Serperîştê kovarê Salih Yusif e û derhênerê hunerî jî Lale Ebde ye. Çend kesên ku wek nivîskarên têde nivîsîne jî ev kes in; Rizgar Şewqî, Ehmed Elî Berzincî, Ebdulkerîm Mehmûd Şêxanî, Sidîq Mehmûd Berzincî, Kakeyî Felah, Şakir Fetah, Elî Emîn, Osman Hewramî, Ehmed Fehmî, Remzî Qezaz, Ebdûllah Peşêw, Bêkes û Salih Yusif. "Ev kovar di Gulana 1975an de careke din ji aliyê Dr. Îhsan Fûad ve hatiye derxistin." (Îdrîs Abdullah, 2004: 145).

2. Kovara Estêre (1992): Di sala 1992an de her li Silêmanîyê kovareke din bi navê *Estêre* tê weşandin. "Bi lijnayeke nû ji aliyê rêveberîyeke dibistanekê ve hat amadekirin. Kesên ku bi kovarê re mijûl in Mamosta Elî Kemal birêveberiya nivîsan dike û Mamosta Şewbo Ebdulla jî wek cîgirê birêveberî kar dike û Mamosta Ezmîr Salih jî bi karê hunerî re mijûl dibe. Mamosta Raûf Osman, Ebdulla Peşêw, Elî Ewnî Şewnem jî nivîskariya kovarê dikin.." (Subaşı, 2017: 118).

3. Cigergoşekan (Tebax 1992-...): Ji aliyê Komaleya Nûseranî Îslamî

Kurdistan ve hatiye weşandin. Desteya nivîskarên vê kovarê ev kes bûne: Sernûser Ebdulla Necmeddîn Taha ye. Karên hunerî ji aliyê Reza Muhemed Elî ve tê kirin û karê kompîtûrê jî Cîhad Omer girtiye ser milên xwe. Ji bilî van nivîskarên kovarê Ehmed Qadir Seîd, Ebdulxaliq Qeredaxî, Beyan Namîq Muhemed, Kamêran Heme Kerîm in.

3. Kovara Pepûle (1992...): Di sala 1992an de wek kovareke perwerde û rewşenbîriya zarokan ji aliyê Komaleya Mindalparêzî Kurdistan ve mehane tê weşandin. Li Silêmanîyê çap dibe û yek ji wan kovarên zarokan e ku zêde belav dibe û her hejmar 2000 heta bi 5000an çap dibe. Heya niha 253 hejmar jê belav bûne û hê jî berdewam e. Xwediyê îmtiyazê ya kovarê, Hêro Îbrahîm Ehmed e." (Îdrîs Abdullah, 2004: 331-332).

Her di sala 1992an de kovara Perîstan derdikeve, paşî di sala 1998an de Cîrîwe derdikeve. Tan Tan di sala 2000an de ji bo zaroyên temenê (10-18) salî derdikeve, bi vî awayî li Silêmanîyê rojnamegeriya zarokan bipêşve diçe.

4. Pereshêlke (1991): Li Hewlêrê di sala 1991an de kovara *Pereshêlke* dest bi weşanê kir. Kovareke rewşenbîrî û edebî ya zarokan e ku mehane li Hewlêr û Swêdê derçûye û bi tevahî 9 hejmar jê belav bûne. Kadroya nivîskarên wê ji kesên wek Mewlûd Îbrahîm, Îdrîs Lawe, Helgurd Ebdulwehab Cundiyanî pêk hatiye." (Subaşı, 2017: 118).

5. Heng (1993...): Di Adara sala 1993an de li Hewlêrê dest bi weşanê kiriye, heya niha berdewam dike. Ji aliyê Wezareta Rewşenbîriya Herêma Kurdisatnê ve tê derxistin.

6. Hêvî (1995): Tê waşandin, tenê 4 hejmarên wê hene, Rojnameya Kurdistanê ew derdixist

7. Hêlaney Mindallan (Tebax 2000-...): Heya niha 297 hejmar jê çap bûne. Ev kovar mehê du hejmar jê derdixin û sernûserê wê Seyran Selam Ebdullah e û xwediyê îmtiyazê jî Elî Ebdulla ye.

8. Cerîwe (1999-1998): Kovareke mehane ya zarokan e li Silêmanîyê. Xwediyê îmtîyazê yê kovarê Cemal Ebdulla bû û serperîştê wê jî Tahîr Salih Seîd. Bi tevahî 9 hejmar ji *Cerîwe* weşiyane.

Kovara *Gidîle* tê weşandin. Di 1999an de. *Mindallanî Bawe Gurgur* (2003-...)an li Kerkûkê tê weşandin, heya niha jî berdewam dike. Kovara *Nêrgizê*, di 2000an de kovara Hêlaney Mindalan. Di 2001an de kovara *Pelke Zêrîne* heya sala 2011an beredewam dike. Kovra *Aga*, di 2002 de sazîyeke taybet bi (Mînan) wê derdixe. Kovara *Zirîmok*, di 1-12-2004 de Sazîya Rewşenbîrî li devera Bilê ew weşand.

Ji niha ve rewşa rojnamegeriya zarokan li Herêma Kurdistanê, bipêşde diçe. Hejmarek ji kovar û weşanên taybet bi zarokan tîn weşandin..

1.3.1.2. Li Herêma Kurdistanê Weşanên Televîzyonan û Televîzyonên Taybet ên Ji Bo Zarokan

Li rojhilata navîn cara ewil li Iraqê, îstasyona televîzyonê hatiye danîn û di sala 1956an de ji aliyê hikûmetê ve (<https://www.peyserpress.com/detail/1885>) Piştî Bexdayê, Kurdên Iraqê fêde ji vê yekê wergirtine, bingeha yekem televîzyona Kurdî hat danîn. Di sala 1967an de li Kerkûkê îstasyonek hat vekirin. Bi navê *Televîzyona Kerkûk*. (<https://www.peyserpress.com/detail/1885>) Wê gavê bername hemû bi erebî bûn. Lê piştî sala 1969an hikûmeta Iraqê di bara mafên çandî yên kurdan de qerarnameyek derxist û têde nîşan kir ku heya televîzyoneke taybet a kurdan ava bibe, dê di Kerkûk Tv de bernamêyên kurdî bên zêdekirin. "(Subaşı, 2017: 118). Her çawa be jî ev dibe bingeha medya Kurdî li Herêma Kurdistanê. Pîranîya Televîzyonên Kurdî, bernamêyên taybet ji bo zarokan weşandine. Li jêrê navên wan derbas dibe.

1. Kerkûk TV (18.11.1967-...): Televîzyoneke gelemperî bû, ne taybet ji bo zarokan weşan dikir, lêbelê bi awayekî bernamêyên taybet ji bo zarokan jî weşandine. Me li jêrê hin ji van bernamêyan bi nasîn dane:

Kolke Zêrîne: Bernamêyeke perwerdeyî bû, hewl dida, zarokan hînî karên baş bike. Weşana vê bernamêyê, demeke dirêj dewam kir.

Govarî Mindallan: Xanîmeke bi navê Pexşan Koyî ev bername amade û

pêşkeş dîkir.

Çîhanî Mindallan (1984-1994): Mîna Kenan SUBAŞI dibêje: Di hefteyekê de carekê dihat weşandin û maweya weşana vê bernameyê nîv saet bû. Reza Şiwan bername amade dîkir. Nazenîn Hemelaw pêşkeşvane yekema vê bernameyê bû. Semîre Hemelaw jî bo du mehan karê pêşkeşiyê girtiye ser milên xwe."(Subaşı, 2017: 124).

Çîrokan: Ev bername taybet bû jî bo vegêrana çîrokan. Di hefteyekê de carekê, dihat weşandin. Reza Şiwan bername amade kiriye.

Herwisa bernameyên (Cigergoşekan û Çîrokî Hefte) jî dihatin weşandin.

2. Kurdmax Pepûle TV (2014): Ev televîzyoneke taybet jî bo zarokan e, weşanê li Hewlêrê dike. Bi zaravayên Kurdî (Kurmancî û Soranî) weşana xwe dike. Hejmareke fîlmên zarokan, rêzefîlmên wan, jî zimanên cuda cuda wergerandine, herwisa hejmareke bernameyên perwerdeyî jî amade kirine. Ozie Boo, Çîhanî Ajelan, Pokoyo, Estêreyê Laura, Minscool, Rajoo, Pişîleyê Sor, Rawçî Ejdihekan, Oscar, Rory, Dragon, Balîfî Pînekraw, Zazy Soo û Manon navên hin jî van bernameyan in."(Subaşı, 2017: 125).

3. Pêlîstank TV (1.5.2012- 2018): Ev televîzyon taybet bû jî bo zarokan, wek yekem televîzyona taybeta zarokan tê qebûlkirin û navenda wê li Duhokê bû. Di vê televîzyonê de zêdetir giringî bi mûzîk, stran û kilaman ên Kurdî dida. Ji ber krîza darayî ev kenel di 2018an de weşana wê tê rawestandî.

4. Zaro TV (2013): Ev televîzyoneke taybet jî bo zarokan e, jî aliyê Hikûmeta Herêma Kurdistanê ve li Hewlêrê hatiye damezrandin. Televîzyon bi zimanê Kurdî zaravayên (Kurmancî û Soranî) weşana xwe dike."Birêvebirê giştî yê televîzyonê Halgurd Abdulwahab Cundiyanî ye. Herwiha hin hewl tînin dayîn ku ji saziyên navnetewî yê wek UNESCO û UNICEFê piştgirî bigirin jî bo Zaro Tv. Turtle Hero, Li Gel Giyaneweran, Golzar hin jî bernameyên vê televîzyonê ne. (Subaşı, 2017: 124).

5. Kurdistan TV (1998): Ev televîzyon rasterast girêdayî partîya (PDK)ê ye. Televîzyona yekema Herêma Kurdistanê tê himartin. Televîzyoneke giştî ye, zêdetir di aliyê polîtîkê de mijûl dibin. Lê hin bername û fîlm jî bo zarokan jî weşandine,

mîna bernameya bi navê Stranên Zarokan û Fîlma Bizav.

7. Waar TV (2013): Ev jî televîzyoneke giştî ye, slogana wê (Hemû rengên jiyanê) ye. Navenda vê televîzyonê li Duhokê ye. Di hemû rojan de heta bi 6ê êvarê, bernameya bi navê *Demê Zarokan* bo dema saetekê tê weşandin.

8. Kurdsat (2000): Televîzyoneke kurdî ya giştî ye. Di sala 2000an de dest bi weşanê kir. Rojane 24 saetan weşanê dike û navenda wê li bajarê Silêmaniyê ye. Zimanê sereke yê kenalê kurdî ye, zaraveya Soranî ye. Kurdsat kenaleke nêzîkê YNKê ye. Hejmareke bernameyan û filmên zarokan diweşîne, mînak: Çîrokî Mindalan, Kilawçî, Goranî Mindalan, Bernameya Perwerde.

Hejmareke din jî ya televîzyonên kurdî, li Herêma Kurdistanê weşanê dikin. Lê zêdetir televîzyonên nûçeyî û sosyal in. Mînak: Rûdaw, Kurdistan24, Kurdsat News, Gelî Kurdistan, NRT, Spêde.

1.3.2. Weşanên Zarokan ên Kurdî Ku Li Tirkîyeyê Hatine Weşandin

1.3.2.1. Kovarên Zarokan

Li Tirkîyeyê hejmareke kovarên zarokan hatine weşandin. Her çendî ji bilî Zimanê Tirkî bi zimanên din weşan qedexa bû jî, li derveyê sînorên Tirkîyeyê beşeka van weşanan hatine çapkirin. Bi dizî ev weşan digehîştin destê Kurdan. Lê piştî sala 1991emîn ji ber ku ev qedexa ji holê rabû, êdî kurdî jî dest bi weşanê kir. Piştî vê jî bo zarokên kurd jî bûne xwedî kovar. Ev Kovarên jêrîn beşeka ji van weşanan e:

1. Nûbihar (1992-...): Ev kovareke çandî, hunerî û edebî ye. Ev kovar ne kovareke taybet ji bo zarokane, lê hinek caran çend nivîs ji bo zarokan weşandiye "Di serî de bi navê "Zarokname" wek çend rûpelên dawîya kovarê ji bo zarokan veqetandine û ev beş piştî bi navê "Zarokistan" çend nivîs weşandine. Kesê ku beşa Zarokname amade dikir Xelîl Amed bû. Beşa Zarokistan ji aliyê Sabah Kara ve di hat amadekirin" (Subaşı, 2017: 11) *Nûbihara Biçûkan* jî ji aliyê Rojbîn Özkan ve hatine amadekirin. Xwediyê kovarê Suleyman Çevike. Kovar çendî di serî de mehane weşiyabe jî lê piştî periyoda weşanê bûye sê mehane carekê, an jî demsalî. Weşana kovarê heya niha jî her berdewam e û bi tevahî li ser hev 152 hejmar li Stenbolê çap bûne." (<https://www.nubihar.com/home/derbar>).

2. Dergûş (2003): Kovara *Dergûşê* yek ji wan kovaran e ku li Tirkîyê hatiye weşandin. "Di sala 2003an de, ji hêla weşanên Warê ve di rêzeya pirtûkên zarokan de hatiye weşandin. Xwediyê Kovarê û Midûrê Berpirsyar Turgut Ersoy e, edîtorê kovarê Cahit Yıldırım e. Lijneya weşanê jî ji S. Verroj, Cahit Yıldırım û Remezan Pertew pêk tê. *Dergûş* wek pêvekeke kovara *Warê* derketiye û piştî hejmarekê êdî dev ji weşanê hatiyeberdan." (Tusun, 2017: 74)." Her çî qas xwestibin wek kovareke zarokan ya serbixwe bê amadekirin jî bi tenê 2 hejmar jê weşiyane." (Subaşı, 2017: 11).

3. Şemamok (2005- 2010): *Şemamok* di sala 2005an de li Diyarbekirê hatiye weşandin. Ji aliyê rêvebiriya Şaredariya Sûrê ya Diyarbekirê ve hatiye weşandin." Xwediyê kovarê Serokê Şaredariya Sûrê Abdullah Demirbaş e, berpirsê nivîsan jî Huseyîn Kaya ye. Edîtorên kovarê Sîdar Jîr, Rizoyê Xerzî û Rêzan Tovjîn in. " (Tusun, 2017: 75). Kovara *Şemamokê* bi zimanê tirkî û kurdî heya sala 2010an li ser hev 7 hejmar weşiyane.

4. Dergûş (2008): *Dergûş* jî bi arîkariya Şaredariya Bajarê Nû ya Diyarbekirê ve hatiye weşandin. Di sala 2008 an de waşan kiriye. " Bi tenê hejmarek derçûye û edîtoriya wê jî Sîdar Jîr kiriye. "(Subaşı, 2017: 11).

5. Agirê Tûtê (2011): Di sala 2011an de li Diyarbekirê ji aliyê Kurdî-Derê ve hatiye amadekirin û weşandin. "Tenê hejmarek çap bûye. Ji kovarê zêdetir wek Bultena Kurdî-Derê hatiye amadekirin" (Subaşı, 2017: 11). Li ser kovarê Adar, Nîsan, Gulan 2011an hatiye nivîsandin. Navê kovarê piştî wek "*Zarokên Rojê*" guheriye û bi wê navê weşan hatiye kirin."(Tusun, 2017: 76).

6. Zarokên Rojê (2011): Di sala 2011an de di demsala havînê de ji aliyê şaxa Diyarbekirê ya Kurdî-Derê ve hejmara yekem weşiyaye. "Sê-mehane li ser hev bi temamî 4 hejmar weşiyane. " (Subaşı, 2017: 11). Di kovara *Zarokên rojê* de ji bilî kurmancî, bi zazakî jî nivîs hatine weşandin. Kovar ji hêla wêne û xêzan ve jî gelek dewlemend û rengîn e. Naveroka hejmarên Zarokên Rojê tije ye. Di kovarê de gelek çîrok, helbest, karîkatur, tiştanok, zûgotinok û nasandina navdarên kurd." hene. (<https://www.lekolin.org/bi-zimane-jine-kovara-zaroken-roje/>. 13-8-2020).

7. Perperok (2012- 2013): *Perperok* ji aliyê Weşanxaneyê Arê ve hat weşandin. Di sala 2011an de Kovara *Perperoka* ji bo zarokên ku kurdî nizanin ji

aliyê mamostayên perwerdehiya pedagojîk dîtin ve hate amadekirin, çîrok, xaçepirs û beşên bên boyaxkirin cih digrin. (<http://candname.com/kovara-zarokan-perperok-derket>. 15-8-2020) bi temamî 2 hejmar hatine çapkirin. Di payîza 2012an de hejmara yekem û di bihara 2013an de jî hejmara duyem çap bûne. Li Stenbolê ji aliyê lijneyekê ve hatiye amadekirin. Kesên di vê lijneyê de ne: *Cüneyt Kulaz, Hasan Aslan, İdris Benek, Fêrgîn Melîk Aykoç, XunavAltun û Mevlüt Aykoç* in. "(Subaşı, 2017: 11).

8. Bûka Baranê (2013-2015): Kovara *Buka Baranê* di sala 2013an de li Stenbolê dest bi weşana xwe kiriye. Xwedîyê kovarê komeleyeke li Stenbolê ya bi navê Komel-Kurd e. Di bihara 2013an de hejmara yekem weşiyaye û bi tevahî li ser hev 5 hejmar derçûne û editora kovarê Sewîm Qoserî ye. Kesên ku di nav lijneya amadekara vê kovarê de cih girtine, Ayşegül Çelebî, Nûriye Çakar, Sewîm Qoserî û Kenanê Nadon e. Xêzên vê kovarê ji aliyê Qerbelek, Zîşan Ozeke, Sewîm Qoserî ve hatine amadekirin. "(Subaşı, 2017: 112). Di zivistana 2015an de jî hejmara pêncem weşiyaye.

1.3.2.2. Weşanên Televîzyonan û Televîzyonên Taybet ên Ji Bo Zarokan

1. TRT 6/Kurdî (2009/...): Kanaleke televizyonê ya bi kurdî ye ku wekî yekemîn kanala fermî ya komara Tirkîyeyê di roja 25'ê berfanbara 2008'an (hingî navê wê TRT 6 bû) dest bi weşana xwe ya ezmûnî an ku testê kir. Di 1'ê rêbendana 2009'an de saet 19:00'ê li gorî saeta herêmî dest bi weşana xwe ya asayî kir. Ev kanal yek ji kanalên fermî yên ser bi Saziya Radyo û Televîzyonê ya Tirkîyeyê an ku TRT'ê (bi tirkî: Türkiye Radyo Televizyon Kurumu) ye. TRT Kurdî rojê 24 demjimêran bernameyan bi zimanê kurdî, an jî bi jêrnivîsa kurdî pêşkêş dike.

• **Mîmocan Li Her Derê:** 360 beş hatiye weşandin û maweya li ser ekranê ya her beşê 20 deqîqe/kêlîk in. Ji tirkî ji bo kurdî hatiye wergerandin û bidengkirin. <https://tvprofil.com/tvprogram/#!/datum=2013-05-02&kanal=trt-6>).

• **Lezgîn û Nazdar:** Ev rêzebername jî ji tirkî ji bo kurdî hatiye wergerandin, 40 beş in ku bi deng kirine. Dema weşanê ya li ser ekranê ji bo her beşê 10 kêlîk in. (<https://tvprofil.com/tvprogram/#!/datum=2013-05-02&kanal=trt-6>. 27-8-2020).

- **Şîrînok:** Ev bername bi kurdî hatiye amadekirin. Heya niha 196 beş hatine weşandin û maweya weşanê ya li ser ekranê ji bo her beşê 30 kêlik in. (<https://www.youtube.com/user/trtses6>. 27-8-2020).

- **Nêçîrvanê Trafîkê:** Di meha sibata sala 2020an de dest bi weşana bername kir. Bi vê nav û nîşanê bername tê weşandin: Zarok, lewhe û qaîdeyên trafîkê bi bernameya Nêçîrvanê trafîkê hîn dibin. Bername her hefte roja Duşemê di saet 16:25an de tê ser ekrana TRT Kurdîyê.

2. Dunya TV (2010-2015): Kanaleke televîzyonê ya taybet e ku li Tirkîyeyê weşan bi zimanê Kurdî dikir. *Dunya TV* ser bi Koma Weşanê ya Samanyolu ve ye. Li bajarê Entabê hatiye weşandin. Ev televîzyon jî xisûsî ji bo zarokan nebû. Lê di nav 5 salan de ji bo zarokan rêzefîlma Caillou bi kurdî hat weşandin. Karakterê sereke yê vê rêzefîlmê kurekî li dor 4 salî yê bi navê Caillou ye ku têde bi rêya reftar û macerayên wî perwerdeya zarokan tê kirin û zarokan ji bo jiyanê amade dikin. Caillou ji berhema nivîskar Christine L'Heureux û xêzevan Hélène Desputaux ji bo televîzyonê wek rêzefîlm hatiye veguhastin ku zimanê wê yê resen Fransî ye û li Kanadayê hatiye çêkirin. "(Subaşî, 2017: 112).

3. Zarok TV (2015-...): Yekem Televîzyoneke kurdî ya fezaî ya bi zarokan taybet e li Tirkîyê. Di 21'ê adara sala 2015an de dest bi weşanê kir. Rojane 24 saetan weşanê dike û navenda wê li bajarê Amedê ye. Bi zaravayên kurmancî û kirmanckî û Soranî weşanê dike. "Ji aliyê werger, dûblaj (bi dengkirin) bikaranîna ziman ve televîzyoneke serkeftî ye. Behçet Sevim xwedîyê îmtîyazê yê televîzyonê ye. Dilek Demiral koordînatoriya giştî ya televîzyonê birêve dibe û Mazlûm Doğan jî şewirmendiya weşanê ya televîzyonê dike. "(Subaşî, 2017: 112). Buroya Televîzyonê li Diyarbekirê ye. Çend ji bernameyên ku di vê televîzyonê de tên weşandin, wate Bernameyên Zarok TV ev in.

- **Tîto Xêzker:** Bernameyek hînkarî ye, Tîto xêzker e û her hefte xêzkirina tiştekî nû li zarokan fêr dike.

- **Fîlozofîya Zarokan:** Bernameyeke felsefî ye, her carê bi çîrokeke nû didin dûv pirsan. Dema bername 15 kêlik in. Heya niha 25 beş jê weşiyane.

- **Kî dikare?** Ev bernameyeke pêşbazî ye. Kalo karakterê sereke yê vê bernamê ye. Her hefte bi macerayeke nû derdikeve. Tevahî 10 beş ji vê bernamê hatine weşandin. Dema her bernameyekê ji 15-20 kêlikan pêk tê.

- **Sindoqa Çîrokan:** Bernameyeke ku ji çîrokên gelêrî ya kurdî û çîrokên biyanîyan ava bûye. Di her beşê de, çîroka welatekî tê vegotin. Destekî çîrokbêj hûrgiliyên çîrokan li ser xêzan dilîzîne. Çîrokên gelêrî bi formateke nû û bi zimanê wêneyan nîşanî zarokan dide. <http://zaroktv.com.tr/Kurmanci/Bername>. 27-8-2020). Tevahî 19 bername jî weşiyane, dema her bernameyekê 6 kêlîk e.
- **Dora Te:** Di her bernameyekê de, çend pirs ji hejmareke zarokan tê pirsirin, her yek li gorî xwe bersivê dide. Dema bernamê 10 kêlîk e. Heya niha ev bername berdewam dike.
- **Flapjack:** Rêzefilmeke nû ye. Her hefte li ser Ekrana Zarok TV tê weşandin.
- **Mam Bapîr:** Rêzefîlmeke nû ye. Dema her bernameyekê 10 kêlîk e.
- **Hitçokên Me:** Di vî fîlmê de sê bira hene ku çî ji wan tê dîkin, ji bo bibin hevalên mirovan. Lê ev yek qet ne hêsan e, çima ku ew hirç in. Rast e, dibe ku zehmet be ev hersê hirç bêne bal hev, lê hevaltiya wan heta tu bibêjî bes xurt û qewî ye.
- **Fêrgeh:** Ev bername ji bo şîrînkirina zimanê dê, tê weşandin. Ji 51 beşan pêktê.

Komeke bername û rêzefilmên din jî hene mînak: *Meymûnê heval, Jasper, Gumbal, Shaunê Kavir, Wallace û Gromît, Bipirse Hey Bipirse, Lmn's, Astroblast, Stranên Bajaran, Raindrop, Yarîn û Şêrko, Sîrka Gerok a Toby, Jijo û Kewê, Elîko û Azado, Morî, Kenkenok, Landik, Çîroka Bêdawî, Tîtik Mîtik, Morîka Xewê, Xewnistan, Sifînc Bob, Pablo: Roviye Sor ê Piçûk...*

1.3.3. Weşanên Zarokan ên Kurdî Ku Li Îranê Hatine Weşandin

Li Îranê jî hejmareke kovarên zarokan hatine weşandin:

1. Gir û Gallî Mindallanî Kurd (1946): Ev kovar di sala 1946an de li bajêrê Mehabadê hatiye weşandin. Gir û Gallî Midalanî Kurd wekî yekem kovara Kurdî ya taybet ji bo zarokan, tê hesibandin. "Di rêzebenda kovarên Kurdî de, ev kovar di rêza 25an de cih girtiye." (İdrîs Abdullah, 2004: 73). Sê hejmar jê hatine weşandin. Serperîşt û mûdîrê îdareyê yê kovarê Qadîrî Muderrîsî bû. Nivîskarên wê (Wehab Biloryan, Hejar Mukrîyanî, S. B. Q, Zêwer, Dilşad, Niştîman Werdî...).

2.Girr û Gall (1979): Ji aliyê Mûhsîn Şahsiwar ve ev kovar hat berhevkirin. Li Kirmanşahê dihat weşandin. Tevahî du hejmar jê weşiyane. Hejmara yekema vê kovarê bi kurdî û hejmara duyem jî bi Kurdî û Farisî weşiyaye.

3.Estêre (1979): Di sala 1979an de li Senendecê hatiye weşandin, " bi tevahî 6 hejmar jê derçûne. Hejmara şeşem jî ya vê kovarê di 22yê Gulana 1979an de hatiye weşandin" (İdrîs Abdullah, 2004: 73).

4. Dinyayî Mindallan (2002-...): Di sala 2002an de, kovara *Dinyayî Mindallan* ji aliyê Partiya Demokrata Kurdistanê ya Îranê ve li ser navê Parastina Zarokên Rojhilatê wek paşkoyeke Kovara Kurdistanê li Hêrêma Kurdistanê tê çapkirin. Ji bo zarokên Rojhelatê tê şandin û belavkirin. Heya niha 210 hejmar jê derçûne. Sernûsera kovarê Şîlan Qurbanîfer e. Di lijneya nivîskaran de kesên wek Kawe Ahengerî, Hana Wirya, Nîmet Mela, Mîna Sultanzade cih digrin" (Subaşî, 2017: 127).

5. Nêrgiz (2009-...): Kovareke perwerdeyî ya mehane ya zarokan e. Heta niha 96 hejmar jê derçûne.

Ji bilî kovaran di çend televîzyonan de programên taybet ji bo zarokan tên weşandin. Wek mînak:

- **Sahar/Seher (2014):** Hîn jî heye. Ji 24 demjimêran, 2 demjimêr bi Kurmancî û yê din jî bi Soranî ne. Bernameyeke nîv-saetî ji bo zarokan weşandine. Navê bernameya Hetell Metell Hellame.

- **Kanala parzêgeha Xorasana Bakurî:** Hejmareke bername û film û stranên zarokan weşandine.

- **Kanala parêzgehî ya Êrmiyeyê:** Ev televîzyon bi zimanê Kurdî û Farisî tê weşandin, mijarên tên weşandin giştî ne. Bernameyeke 45 kêlîk di rojê de, taybet ji bo Zarokan tê weşandin.

1.3.4. Kovarên Zarokan ên Kurdî Ku Li Sûrî Hatine Weşandin

1. Hawar (1932-1943): Di roja 15ê Gulana 1932an de, yekem hejmara Kovara *Hawar* ê kete qada karwanê weşangerîya Kurdî. Tiştê ku vê kovarê ji yê berîya xwe cuda dike ev e ku yekem çapkiriya kurdî ye ku bi Tîpên Latînî tê weşandin" (TOVÎ, 2011: 19). Ev kovar li Şamê hatiye weşandin, xwediyê kovarê Celadet Alî Bedirxan e. Bi tevahî li ser hev 57 hejmarên wê hatine weşandin. Di pênc

hejmarên pêşî de bi navê Stûna Zarowan û Stûna Feqehan beşeke taybet ji bo zarokan û xwendekaran hatiye veqetandin." (Subaşı, 2017: 128).

2. Gulîzar (2000-2002): Ev kovara ha jî weşaneke taybet ya zarokan e, Lawikê Hacî xwedî û berpirsiyarê wê bû. "Xwerû bi zimanê kurdî bû. Bi tevahî 9 hejmar jê derçûne û hejmara dawî di sala 2002yan de weşiyaye. Ev kovar li ser pelên A4ê wek fotokopî hatiye zêdekirin û belavkirin." (Subaşı, 2017: 127).

Ev kurteyek bû li ser dîroka weşangerîya zarokan ya Kurdî, li Îraq, Tîrkiye, Sûrî û Îranê. Di niha de sazîyên taybet yên kurdî, ji bo zarokên Kurdan hatine vekirin, her wisa li pey lêkolînan, roj bi roj weşangerîya zarokan di pêşdeçûnê de ye, weşanên nû yên zarokan tên weşandin.

BEŞA DUYEM: DANASÎNA KOVARA SIVORE Û ZÎMANÊ RAGÎHANDÎNÊ

2.1. Dîroka Kovara Sivore

Kovara Sivore, yekem kovara taybet a zarokan e. Li Parêzgeha Duhokê tê weşandin. Bêguman di rojê de dîrokê de kovarê dest bi weşanê kir û wekî diyariyek ji bo zarokên kurdan hat pêşkêşkirin. Her wisa bû deriyek ji bo weşanên piştî wê hatin weşandin. Wekî taybetmendî, beriya kovara Sivore çî weşanên taybet ji bo zarokan li Duhokê hatibin weşandin.

Piştî serhildana sala 1991an li Herêma Kurdistanê, hejmarek ji xortan hin bizavên rewşenbîrî û edebî encam dan. Mirov dikare bibêje; wan xortan gelek valahî dagirtin, ji ber ku beriya wê çaxê valahiyeke mezin di warê çandî û edebî de hebû li Duhokê bi taybet û li Herêma Kurdistanê bi giştî. Di pêngava yekem de, di sala 1994an de hejmarek ji xortan li Duhokê ji kur û keçan, kovareke rewşenbîrî bi navê Kovara *Gazî* weşandin. Piştî çar salan ew kom mezintir bû, "Di çend komcivînan de biryar sitandin ku li ser weşandina kovareke zarokan, berhema wê biryarê jî, jîdêbûna kovara Sivore bû." (Hevdîtina ligel sernivîserê kovara Sivore Selam Balayî, 06/02/2020).

Di 22 Nîsana sala 1998an de hejmara yekema kovara Sivore hat weşandin. Ev roj di hemên demê de roja salvegera weşandina rojnameya Kurdistanê ye. Selam Balayî ku sernivîserê kovarê ye, di bara weşana kovarê de dibêje; "Me dixwest nameya Malbata Bedirxaniyan berdewam bikin, ew pêşengên rojnamegeriya kurdî ne." (Hevdîtina ligel sernivîserê kovara Sivore Selam Balayî, 06/02/2020).

Hejmara yekem 12 rûpel e. Ji aliyê Çapxaneyê Hawarê ve hat çapkirin. Li Duhokê hat weşandin. Xwediyê îmtiyazê Karwan Akreyî û Sernivîser jî Fehmî Selman bû. Di bara rola herdu mamosteyan de Selam Balayî ku sernivîserê niha yê kovarê ye, di bara wan de dibêje; "Ew herdu birêzan di derxistina kovarê de xwedî roleke mezin bûn." (Hevdîtina ligel sernivîserê kovara Sivore Selam Balayî, 06/02/2020).

Di hejmara yekem de stafê (desteya) fermî yê kovarê jî şeş kesan pêk dihat. Ji bilî navê xwediyê îmtiyazê û sernivîserê kovarê, tenê navê çar kesên din derbas dibe. Bi vî awayî;

Xwediyê îmtiyazê: Karwan Akreyî

Sernivîser: Fehmî Selman

Sekretêra Nivîsînê: Bêrîvan Reşîd

Çavdêriya Hunerî: Huda Ehmed

Çêkirina Wêne: Kamil Osman, Cemîl Muhammed

Bi giştî 10 nivîseran bi gotarên curbicur beşdarî weşana yekê bûbûn. Di bin navê li pêşiya me de, emê bi awayek berfireh li serê bisekinin. Di hejmara duyem ya kovarê de, desteyeke taybeta nivîskaran nivîsandine. Mirov dikare bibêje, êdî kovarê rêya xwe dîtîye û bi awayek sistematîk dom dike. Heya hejmara 9an di 9ê Kanûna Pêşîn ya sala 1998an de tê weşandin. Wekî serperişta karê kompîturê tê damezrandin. Karê kovarê hinekî sivik dibe, hêdî hêdî kovar bipêşve diçe..

Beriya şerê Amerîkayê li dijî Îraqê, di sala 2003an de bi qasî çar mehan weşana kovara Sivore rawestiya. Şerî, bandoreke neyînî li ser rewşa abûriya Îraqê kir. Ji ber vê sedemê kovara Sivore, hejmarên nû balav nekirin. Lê piştî ji navçûna rejîma Saddam Huseyîn, car din kovarê dest bi weşana xwe kir. Hejmara 55an bi arîkariya saziya (Mines Advisory Group) ‘‘M.A.G’’ di sala 2003an de hat weşandin. Car din piştî vê hejmarê ji bo 5 mehan kovar tê rawestandî. "Piştî hin danûstana digel hin cihan, saziya Xanî bi arîkariya Fehîm Ebdulla carek din di sala 2004an de hejmara 56an tê weşandin û heya niha berdewam dike." (Hevdîtina digel sernivîserê kovara Sivore Selam Balayî, 06/02/2020).

Kovara Sivore ji bo zarokên Kurdan bû deriyek ji bo hizra neteweyî. Her wisa pêngavek ji bo livandin û pêşxistina zarokan di kovarê de ji çîrok, helbest, şîret, kesayetî, navdarên kurdan û berhemên zarokan pêktê.

Hejmarên destpêkî yên kovarê, tenê li parêzgeha Duhokê, nêzî 1000 dane jê dihatin weşandin. Piştî kovar berbelav dibe, piştî sala 2004an li hemû bajarên Herêma Kurdistanê cih digre. Zêdeyî 8 hezar dane jê tên çapkirin, paşê carek din kêr dibe û ji sala 2014an pê ve 1000 dane tên çapkirin û tenê li parêzgeha Duhokê tên weşandin.

Kovara Sivore di gelek qûnaxan de derbas bûye, ji hejmara 1'an heta bi 27an xwediyê îmtiyazê Karwan Akreyî bû û sernivîserê kovarê jî Fehmî Selman bû.

Ji hejmara 28an heya bi 55an xwediyê îmtiyazê, Hebîb Keleş û sernivîser jî Behcet Hirûrî bû.

Hejmara 56 heya bi 65an xwediyê îmtiyazê, Fehîm Ebdulla û sernivîser jî Fazil Omer bû.

Ji hejmare 66an heya bi 136an xwediyê îmtiyazê, Dr. Fazil Omer û sernivîser jî Selam Balayî bû.

Ji hejmara 137an heta bi niha xwediyê îmtiyazê Sazîya Xanî ya Rewşenbîrî û Ragihandinê ye û sernivîskar jî Selam Balayî ye..

Van dawîyan ji bilî weşana kovarê, projeyek din ji aliyê Kovara Sivore ve ji bo zarokan hat damezrandin, navê projeyê Weşanên Kovara Sivore, nêzî 11 pirtûk û 9 weşanên taybet ji bo zarokan weşandine, navê wan pirtûkan û weşandinan ev in:

- 1- Mêrga Bi Kulîlk. Senaryo, nivîskar Cahîda Bîrî.
- 2- Rojanên Hêviyê. Senaryo, wergêr Nazdar.
- 3- Ikî Yûsan. Çîrok, wergêr Mesûd Xalid.
- 4- Çîrokên Roviyan. Çîrok, wergêr Muhammed Mela Hemdî.
- 5- Bişkojên Paşerojê. Helbest, Selah M. Emîn.
- 6- Pîter û Xişxişûk. Çîrok, wergêr Mesûd Xalid.
- 7- Ferhenga Rengîn. Mijûlkirin, amadekar Ehmed Bîrî.
- 8- Gewher Nasî. Zanistî, nivîskar Mesûd Xalid.
- 9- Edîson. Zanistî, nivîskar Şêrwan Ehmed Tayib.
- 10- Giliyê Heyva Şîn. Çîrok, Wergêr Arif Hîto.
- 11- Gulfiroş. Çîrok, nivîskar Fehîma Îbrahîm.
- 12- Gêncîya Çîrokan. Çîrok, nivîskar Fazil Omer.
- 13- Bireka Balindan. Çîrok, nivîskar Izet Yusif.
- 14- Dewleta Daristanê. Roman, nivîskar Tehsîn Navişkî.
- 15- Pantelonê Şeytanî. Çîrok, nivîskar Tengezar Marînî.
- 16- Teymezê Şehreza. Çîrok, nivîskar Hecî Ceifer.
- 17- Baxçê Awazan. Helbest, helbestvan Bilin Muhammed.
- 18- Turîna Maytêker. Çîrok, nivîskar Emîn Qadir.
- 19- Kêlestîn. Çîrok, nivîskar Xalid Salih.
- 20- Balinde û Jûaneka Seyîr. Zanyarî, nivîser Emed Bîrî. " (Hevdîtina

ligel sernivîserê kovara Sivore Selam Balayî, 06/02/2020).

2.1.1. Navê Sivore

Sivore, navê giyanewereke biçûk û xweşik e. Ji gwîzan hez dike, ev nav bi Kurdî hene "Sîhorîk, Sivorî, Simolek, si'or û pîlûr" bi Tirkî û Farisî û Erebi "Sincap", bi îngilîzî "Squirrel" e. Ev giyanewer, li deverên çiyayî pir in, bêguman piraniya deverên Kurdan çiya ne, wate piraniya kurdan Sivore dîtiye yan bihîstiye. Giyanewereke naskirî ye. Giyanewerekî xweşik û sivike, li ser gwîz û daran dijî, bê zehmet dikare xwe ji dijminên xwe biparêze. Me ji sernivîskarê kovara Sivore pirsî: Çima navê Sivore ji bo kovarê hatiye helbijartin? Selam Balayî bi vî awayî bersiva me da; "Ji ber ku ev giyanewer hizir li pêşeroja xwe dike, gwîz û berîya fistiq û bindiqan li havînê, ji bo zivistanê kom dike, heya ku zarokên Kurdan jî hizir di dahatûya xwe de bikin mîna sivore. Me nav lê kiriye Kovara Sivore." (Hevdîtina digel sernivîserê kovara Sivore Selam Balayî, 06/02/2020).

2.1.2. Weşan û Belavkirina Kovarê

Yekem hejmara kovara Sivore, li Parêzgeha Duhokê hat weşandin. Kovara Sivore heya bi serdema niha, ji aliyê weşan û belavkirinê ve çend qûnax derbas kiriye. 53 hejmarên destpêkê tenê li navçeyên derdora Duhokê dihatin weşandin. Sedem jî vedigere ji bo derfetên abûrî, pereyekê kêr ji bo kovara Sivore dihat destnîşankirin. Heya temenê xwe yê çar saliyê di sînoreke biçûk de kovarê weşana xwe dikir. Sedema din, kovar tenê bi zaraveya Kurmancî devoka Badînî dihat weşandin. Piraniya zarok û mezinên Hewlêr û Suleymaniyê, pir ji devoka Badînî fêr nakin, her wisa peyamên kovara Sivore rasterast ji bo zarokên zareveya Kurmancî dihat arastekirin. Ji ber vê yekê tenê li Duhok û navçeyên derdora wê dihat belavkirin. 500 lib di her mehekê de dihatin çapkirin û weşandin. Her çend hejmareke kêr jî be, lê ji xebata wê nayê kêr kirin, ji ber ku xebateke destpêkê bû li deverê. Li pey amarên fermî yên parêzgeha Duhokê ku di Ansîklopîdiya Duhokê de hatiye, hejmara niştecihên Parêzgeha Duhokê zêdeyî 1,200,000 kes in, 7 navçe li ser Parêzgeha Duhokê ne. Serdema destpêkê ji ber van rewşan, tenê li van navçeyan, bi van hejmarên xwe yên kêr hat weşandin. Peyamên kovara Sivore di vê qûnaxê de li gor xwestek û ziman-halê deverê dihat nivîsandin û belavkirin. Bi giştî girêdayî çand û erdnîgariya Duhokê dihat nivîsandin. "Hejmara rûpelên destpêkê ji (12-16) rûpelên (20*28) pêkdihat, kovara Sivore li Duhok, Çapxana Hawar tê çapkirin" (İdrîs Abdulla Mustafa, 2004: 223).

Piştî sala 2004an rewşa abûrî ya kovara Sivore baş dibe, hem hejmara rûpelên kovara Sivore zêde dibin, hem jî sînore belavkirinê fireh dibe, "Hejmara 55an piştî şerê rizgarkirina Iraqê ji bo navçeyên nû-azad bûne, dihat weşandin. Bi taybetî Şengal, Sinon, Navçeyên derdora Musil û Deştê Neynewa, ev yek jî bi arîkariya Saziya M.A.G (Mines Advisory Group) bi zimanê Erebî û Kurdî dihat weşandin." (Hevdîtina digel sernivîserê kovara Sivore Selam Balayî, 06/02/2020). Peyamên kovarê ji bo zarokên Kurdan yê wan deveran bûn, ji bo ew hest li cem wan peyda bibe ku ew jî xwedî kovar in. Vê rewşê zêde dirêj nekir, car din krîza abûrî li kovara Sivore serî hildide, dema pênc mehan car din kovar weşana xwe radiwestîne. Hejmara 56an car din di sala 2004an de tê weşandin..

Serdemeke din ya belavkirina kovara Sivore destpê dike, rewşa abûrî ber bipêşve diçe. Ji hejmara 57an ev qûnax destpê dike heta hejmara 90î. Hejmara rûpelên kovarê 100% zêde dibin, "Ji 14 rûpelan derdikeve 28 rûpelan, li cihê 500 liban 1000 lib dihatin çapkirin. Hemû hejmar di bazarê de li pirtûkxaneyan dihatin firotin." (Hevdîtina digel sernivîserê kovara Sivore Selam Balayî, 06/02/2020) Wisa xuya ye ku xwandevanên kovarê di vê sedemê de bi rengê berçav zêde bûne, ev jî di vê qûnaxê de serkeftinek e.

Belavkirina hejmara 91'an bi şûn ve serdemeke din destpê dike, ev serdem bû qûnaxa zêrîn ji bo kovara Sivore. Ji ber ku di hemû aliyan de pêşketin di kovarê de tê dîtin. Hejmara rûpelên wê heya hejmara 90an 28 rûpel bûn, lê ji hejmara 91an pê ve bûne 32 rûpel. Hejmarên di mehê de dihatin çapkirin 1000 bûn, lê ji hejmara 91an û bi şûn de bûne 2500 lib. Di vê serdemê de sînore belavkirina kovara Sivore fireh dibe ku beriya wê ti carekê wisa çênebûye. Li hemû Parêzgehên Herêma Kurdistanê kovar dihat belavkirin, li pirtûkxaneyên Suleymanî, Hewlêr û Duhokê kovara Sivore dihatin dîtin. Wateya vê sedemê kovara Sivore bûye kovareke giştî ji bo tevahiya zarokên Herêma Kurdistanê. Her wisa ji aliyê naverokê ve, bi rengê xweşîktir ji caran tê dîtin, ji aliyê hunerî ve bi rengê xweşîk dihat berhevkirin..

Di sala 2014an de, car din bingeha abûriya kovara Sivore lawaz dibe. Car din kovar derbasî qûnaxeke nû dibe. Lê vê carê kovar dizîvire ser rewşa xwe ya pêşîn, lê qet ji weşanê nasekine. Sînore belavkirinê weke xwe dimîne. Tenê li Parêzgeha Duhokê kovar tê dîtin. Destpêka pûşpera sala 2014an rêxistina DAIŞê êrişî Îraqê kir û Parêzgeha Musilê kete dest wan. Piştî êrişî Herêma Kurdistanê kir, wekî tê zanîn

bandora zêdetira şer li abûriyê kir, ji ber vê sedemê rewşa abûriya Herêma Kurdistanê lawaz dibe. Krîz car din serî hildide. Ji aliyê polîtîkî ve pirsgerêk di navbera Herêma Kurdistanê û Hikûmeta Îraqê de mezin dibe. Heya digihe wê astê ku Hikûmeta Îraqê budçeya Herêma Kurdistanê qut dike. Vê yekê, bandor li tevahiya sektorên jiyan û saziyên rewşenbîrî û ragihandinî kir. Hikûmeta Herêma Kurdistanê nekarî wekî pêwîstiyek destekê bide wan saziyan. Encam; beşeke zêde ya saziyên ragihandinê dawî bi karê xwe anîn û deriyên saziyên xwe girtin. Heya niha girtî mane. Kovara Sivore yek ji wan saziyên ragihandinê bû ku krîza abûrî bandoreke neyînî li serê kir. Derfetên wê yên abûrî, ne baş bûn, lê car din qet ji weşan û belavkirinê nese kinî, heya niha tê weşandin, lê hejmarên tîn çapkirin kêmbûne ji bo 1000 libî di her mehê de, niha tenê li parêzgeha Duhokê tê weşandin û belavkirin.

2.2. Nivîskarên Kovarê

Ji destpêka weşana kovara Sivore heya niha, bi dehan nivîser û berhevkarên nivîs di kovara Sivore de weşandine. Nivîskarên kovarê di temenên cuda cuda de ne. Ji zarok û mezinan pêktên. Hinek nivîskar ji destpêka weşanê heya niha berdewam in, hinek jî car caran nivîs weşandine û paşê sekinîne. Di serî de, emê ji wan nivîskaran destpê bikin ku bi fermî ji aliyê kovarê ve wekî desteya nivîskaran hatine damezrandin. Di bin çavdêriya desteya nivîskaran de, nivîs dihatin weşandin. Her wisa wezîfeya wan ya din jî ev e ku li gorî daxwaza kovarê, nivîsan ji bo kovarê berhev bikin. Ev navên wan nivîseran e ku bi fermî di kovara Sivore de xebitîne.

1- Di hejmara 1- 11an de:

Mûhammed Elî Ertûşî, Teyîb Deştanî û Jiyan Mustafa.

2- Di hejmara 12-24an de:

Tenê du nivîskar bi fermî di kovarê de xebitîne, ew jî; Selam Balayî û Teyîb Deştanî.

3- Di hejmara 25- 27an de:

Hejmara nivîskarên fermî bûne çar nivîskar, navên wan ev in; Teyîb Deştanî, Selam Balayî, Mûhammed Elî Ertûşî û Bêrîvan Reşîd.

4- Di hejmara 28-30an de:

Desteya nivîskaran ji Teyîb Deştanî, Selam Balayî, Mûhammed Elî Ertûşî û Perwîn Abdul-Ezîz pêktê.

5- Di hejmara 31- 38an de:

Teyîb Deştanî, Selam Balayî û Perwîn Abdul-Ezîz.

6- Di hejmara 39- 53an de:

Selam Balayî û Perwîn Abdul-Ezîz, desteya nivîskarên kovarê bûn.

7- Di hejmara 54 û 55an de:

Perwîn Abdul-Ezîz û Hacer Dawud, nivîskarên kovarê bûn.

8- Di hejmara 56- 66an de:

Perwîn Abdul-Ezîz, Mûhammed Abdulla û Hacer Dawud.

9- Di hejmara 67- 71an de:

Hacer Dawud û Mesûd Xalid Gullî, desteya nivîskarên kovara Sivore bûn.

10- Di Hejmara 72- 136an de:

Tenê Mesûd Xalid Gullî bû.

11- Di hejmara 137- 167an de:

Mesûd Xalid Gullî û Jiyan Abdulhemîd.

12- Di hejmara 167- 233an de:

Mesûd Xalid Gullî.

Bi vî awayî kovara Sivore, ji aliyê fermî ve kar kiriye. Wekî di xalên ku di serî de diyar in, çend caran guhertin di desteya nivîskaran de çêbûye. Mabest ev e ku roj bi roj guhertinên baş di kovarê de peyda bibin û her wisa kovar qet ji weşanê nemîne. Em dibînin ku di aliyê naverokê de jî her dem guhertin têde çêbûne.

Her wisa ji bilî desteya nivîskaran beşeke din a kesên pispor di kovarê de xebitîne. Karê wan ji aliyê teknîkî ve çavdêrîkirin bû. Bi vî awayî, navên wan di hejmarên kovarê de derbas bûne:

1- Di hejmara 1- 27an de: Huda Ehmed Sebrî.

2- Di hejmara 27- 31an de: Dr. Sûzan Husên.

3- Di hejmarên 32 û 33an de: Rêber Mûhammed.

4- Di hejmarên 34- 46an de: Car din Dr. Sûzan Husên.

5- Di hejmarên 47- 50an de: Rêber Omer.

6- Di hejmarên 51- 55an de: Dr. Sûzan Husên.

7- Di hejmarên 56- 92an de: Sitar Elî.

8- Di hejmarên 93- 104an de: Sitar Elî û Mûhammed Mela Hemdî.

9- Di hejmarên 105- 233an de: Mûhammed Mela Hemdî.

Wêneyên di kovara Sivore de hatine weşandin, di aliyê fermî de çend kes wekî berpîsîyarî ji bo “Beşa Wêneyan” hatine destnîşankirin. Navên wan bi vî rengî di kovarê de derbas bûne;

- 1- Di hejmarên 1- 4an de: Kamil Osman û Azad Mûhammed Seîd.
- 2- Di hejmarên 5- 26an de: Necmedîn Cibrayîl.
- 3- Di hejmarên 27- 55an de: Necmedîn Cibrayîl û Ehmed Bîrî.
- 4- Di hejmarên 56- 233an de: Ehmed Bîrî.

Kovara Sivore di aliyê redektekirina zimanî de, xwedî pisporên taybet e. Ji serî heya niha ji bo her hejmareke ku derdikeve, ji aliyê wî pisporî ve nivîsên ji bo kovarê hatine, tîn redektekirin. Armanca sereke ev e ku di nivîsên kovarê de şaşiyên rêzmanî kêm bin. Me di serî de got, beşeke zêde ji nivîsên kovarê ji aliyê zarokan ve dihatin şandin. Eşkere ye ku di aliyê rêzmanî de zarok pir şaşîyan dîkin, di vî aliyê de ne pispor in. Ji ber vê yekê zimanzanek gerek e wan nivîsan redekte bike û şaşiyên zimên rast bike. Kovara Sivore, di aliyê zaraveyî de, nivîs bi Kurmancî tîn weşandin, xwedî devoka xwe ya taybet e ku dibêjin “Devoka Duhokê” Hemû nivîs bi vê devokê tîn weşandin, mijarên tîn weşandin li gor vê devokê tîn berçavkirin. Ji ber vê yekê beriya nivîsê, pêwîst e zimanzanek pêdaçûnê ji bo hemû nivîsan bike. Ew kesên ku ji vî hêlê ve di kovarê de xebitîne ev in;

- 1- Di hejmarên 1- 66an de: Navê tu kesekî nehatiye nivîsîn, lê wekî tê zanîn sernivîskarê kovarê di meseleya ziman de berpîsîyar e.
- 2- Di hejmarên 67- 87an de: Mûhammed Abdulla.
- 3- Di hejmarên 88- 233an de: Mesûd Xalid.

Bi dehan nivîskarên din bi çîrok û helbest û mijarên curbicur di kovara Sivore de nivîsîne. Ev nivîskar azad bûn, li gor xwesteka xwe nivîs ji kovarê re dişandin. Beşeke nivîskaran li ser asta Duhokê naskirî ne, hin jî li ser asta Herêma Kurdistanê. Van nivîskaran mijarên cuda cuda weşandine. Emê hinekê li ser navên wan nivîskaran rawestî.

2.3. Analîza Nivîsên Kovara Sivore

Eger em li nivîsên Kovara Sivore binêrin, bêguman di wan de ji aliyê wate û naverokê de, asteke taybet heye. Li gor lêkolînkirina me, nivîsên Kovara Sivore ji hejmarê heta bi hejmarê di pêşveçûnê de ne. Kovar her tim hewl dide cîhanekê ji bo zarokan ava bike. Ji bo zarok bi xwe bawer bin. Ev yek bi rengê doranî di nava

rûpelên Kovara Sivore de tîn dîtîn. Mijarên kovarê, girêdayî hemû aliyên jiyana zarokan e. Di bara rastî û şaşîyan, xweşî û nexweşîyan de nivîs tîn weşandin. Kovara Sivore bi nivîsên xwe, di mehê de carekê mêhvana zarokan e. Naveroka kovarê û wateya wê bala zarokan dikişîne. Ev xal tenê jî be, têrê dike ku ji aliyê akademîsyenan ve Kovar bibe cihê giringîdan û lêkolînkirinê. Her nivîsek gelek mijaran di mêjiyê zarokan de vedike, dibe sedemek jî mêjiyê wan roj bi roj firehtir bibe. Zarok bi awayekî normal li bûyer û astengiyên rojane dinêre, bi kêmasî dibe xwediyê şîroveyan xwe, li gorî fikr û ramanên xwe bûyeran dinirxîne. Di koka xwe de ev pêngav cihekî bilind dibîne.

Perwerde di jiyana zarokan de aliyê giringtirîn e. Ji xwe zarok bingeha avakirina civakê ye. Divê bi rengê baş perwerde bibe. Zarok, çavkaniya perwerdeyî ji du bingehan werdigre. Bingeha yekemîn malbat e, ya duyemîn jî saziyên taybet ên perwerdeyî ne, wekî bexçeyên zarokan, dibistan û saziyên taybet yên zarokan û hwd.

Malbat bingeha sereke ye di temenê destpêkê yê zarok de. Ji temenê di navbera 1- 5 salî û piştî temenê 5 salî û şûn ve, ji bilî malbatê, zarok perwerdeyê li ber destê saziyên taybet ên perwerdeyî hildigre. Em dikarin van du bingehan wekî xala yekemîn destnîşan bikin, eger em xala duyemîn nîşan bikin, bi nêrîna min saziyên ragihandin û çapemeniyê ne. Bi taybetî jî kovar, roleke giring di aliyê perwerdeya zarokan de dilîze. Bi rengê giştî nivîsên di kovara Sivore de tîn weşandin, di vî aliyê de kêmasî nekirine, bi sedan mijarên cuda cuda weşandine. Wekî armanca sereke ya Kovara Sivore jî tê hejmartin.

Di aliyê civakî, neteweyî, fikrî û rewşenbîrî de bi nivîsan zarok perwerdeyê dibînin. Ev nivîs zarokan pal dide karên baş. Peyam ji wan nivîsan ev e ku zarok ji tundkarîyê dûrkeve, bi xweşîkî reftaran bike. Guhdarê mezinan be û rêzê li wan bigre. Her wisa di nivîsên kovara Sivore de wisa tê dîtîn ku zarokekî bi xwe bawer ava bike, di hemû aliyên jiyana de kesekî serkeftî be.

Nivîsên di Kovara Sivore de hatin weşandin, berê zarok dide hînbûna zimanan, ji bo ku zarokekî rewşenbîr ava bibe. Hewl didin taybetmendiya zarok destnîşan bikin, wisa dike ew aliyê ku zarok xwe têde dibîne, di wî alî de bipêşve biçe, di pêşerojê de ew zarok bibe bijîşk, endezyar, mamosta, serkirde...

Zarokan hînî bextewerî û serfiraziyê dike, wisa diyar dike ku di dawiya karên baş de dilxweşî tê, di dawiya karên xerab de jî poşmanî tê. Di nivîsan de zarokan şîret dikin, tim destê arîkariyê ji bo kesên bêhêz dirêj bikin. Wate zarokan hînî mirov-dostiyê dike, wisa dike ku zarok ji welatê xwe hez bike û çand û huner û neteweya xwe biparêze. Bi gelemperî di aliyê perwerdeyê de, Kovara Sivore bi nivîsên xwe xebateke baş encam daye.

2.3.1. Babetên Kovarê û Hejmarên Wan

Di vê mijarê de, me lêkolînek fireh li ser mijarên kovara Sivore kiriye. Me di serî de hemû mijrên ku di kovara Sivore de hatine weşandin, ji hev cuda kirine, me paşî her nivîsek di bin şaneya wê de rêz kiriye. Ji hejmara 1- 233an me lêkolîneke hûr kiriye, çend nivîs di hemû van hejmaran de hatibin weşandin, me jimartine, û min ew hemû nivîs jî yek bi yek xwendine. Paşê jî me mijarên nivîsan ji hev cuda kirine. Bi gelemperî ji hejmarê 1- 233an, ji 12 mijaran pêktên. Me tabloyek berhev kiriye, di vê tabloyê de me li gorî pileyên nivîsan mijar rêz kirine. Mînak:

Çîrok mijara zêdetirîn e ku di nava kovara Sivore de hatiye weşandin. Me di pileya yekem de nîşan kiriye, li hember jî hejmara çîrokan tê nîşandan. Paşê di pileya duyemîn de helbestan cih girtiye, me hejmara helbestên ku hatin weşandin jî nîşan kiriye. Pileya sêyemîn jî zanyariyên gelemperî tî, bi vî rengî her mijarek li pey pileya wê û hejmara mijaran hatiye nîşankirin. Di vê tabloyê de mijar û hejmarên mijaran tî nîşandan:

Tablo: Mijarên Kovara Sivore û Hejmarên Mijaran

Tablo: Mijarên Kovara Sivore û Hejmarên Mijaran

MIJAR	HEJMARA MIJARAN	MIJAR	HEJMARA MIJARAN
Çîrok	701	Dîrok	201
Helbest	700	Zimanê Ingilîzî	201
Zanyariyên Gelemperî	690	Şînwar	195
Cotkarî-Heywan	480	Erdnîgarî	179
Mijarên Rênivîsa Latînî	405	Kesayetîyên Kurdan	163
Tendurustî	215	Zanistî û Fikrî	140
TEVAYÎ		4270	

Di vê tabloyê de, me bi hurgilî lêkolîn kiriye, tevahîya nivîsên di Kovara Sivore de hatin weşandin, ji hejmara (1- 233)an, (4270) nivîs in. Di dema 22 salan

de, ev berhem qada rojnamegerîya zarokan li Herêma Kurdistanê, xurttir dike û bi naverokeke dewlemend ketiye ber destê zarokan.

Çîrok: Nivîsên zêdetirîn di kovara Sivore de hatine weşandin çîrok in. Di mijara piştî vê de, em dê bi dirêjî li ser bisekinin. Ev navên hin nivîskaran e ku bi çîrokan di kovarê de beşdar bûne.

-Dr. Arif Hîto, yek ji nivîskarên naskirî ye, li ser asta Herêma Kurdistanê. Bi çend çîrokên balkêş û sivik, beşdarî kovara Sivoreyê bûye. Mijarên çîrokan, li ser etîk û perwerdeyê ne.

-Avîvan Elî, yek ji wan nivîskaran e ku gelek çîrok di kovarê de weşandine bi taybetî di weşanên destpêkê de. Mijarên çîrokên wê zêde girêdayî aliyê perwerdeyî û civakî ne. Bi dehan çîrokên wê di kovara Sivore de hatine weşandin, piraniya çîrokên Avîvan Elî, çîrokên kurt in ji bo zarokan sivik in.

-Çîmen Tahir, nivîskareka din e ku çîrokên wê zêde di kovara Sivore de tên dîtîn, mijara çîrokên wê jî zêde di aliyê perwerdeyî û civakî de ne.

-Remzî Ismaîl, mijara çîrokên wî giştî ne. Piraniya çîrokên wî li ser navê wî hatine weşandin. Gelek çîrok ji Zimanê Erebi wergerandine.

-Îzet Yusif, Piraniya wan çîrokên ku weşandine, çîrokên ji Erebi ji bo Kurdî wergerandî ne.

-Nivîskar Dilo û Ehmed Emîr, bi çend çîrokên wergerandî beşdarî kovara Sivore bûne.

-Nivîskar Remzî Akreyî, Bîşeng Remezan û Bînahî Mûhammed Hisên, bi çîrokên çand û folklorê beşdarî kovarê bûne.

Her wisa Nazdar, Wan Abdulwehab, Dilêr Zihêr, Dilo van Salih, Cahîda C-Bîrî, S. Amêdî û çend nivîskarên din di beşa çîrokan de, di gelek hejmarên kovarê de nivîsîne. Ez dixwazim diyar bikim ku bi dehan nivîskar di kêman hejmaran de beşdarî kovarê bûne. Ev navên beriya niha me amaje pê kiriye, di gelek hejmaran de nivîsên wan tên dîtîn, helbet hîn jî nav hene. Ev beşeke kêma wan nivîskaran e.

Helbest: Piştî çîrokan mijara zêdetirîn di kovarê de belav bûye, helbest in. Ev navên hinek helbestvanan e ku helbestên wan di hejmarên cuda de hatine weşandin. Helbestvanê bi nav û deng, Mustafa Husên di çend hejmaran de helbestên neteweyî û perwerdeyî weşandine. Her wisa Dr. Perwas Remezan, bi heman rengî helbestên wê di hin weşanên kovarê de cih girtine. Edîb Rêkanî, Nizar Mustafa, Teyîb Rêkanî,

Elind Mizûrî, Warvîn Xidir, Muhammed Rêkanî, Bavê Hozanê, Salih Ehmed Nisirî, Seyfî Mûhammed, Mûeyed Ruşdî, Nîdar Bîrî, Îrfan Mûhammed, Derya Mûhammed, Sihar Şukrî û S. Amêdî û çend helbestvanên din, bi helbestan beşdarî kovarê bûne.

Her yek ji van helbestvanan bi dehan helbestên sivik û balkêş di cîhana zarokan de weşandine. Ji bo xweşiya zarokan ji wan helbestan re bê, dîwana kovara Sivore ji vî rengê weşanê tije ye û heya niha jî bi awayekî balkêş didomîne.

Tendurustî: Di aliyê tendurustiyê de hejmareke nivîskaran di kovarê de beşdarî kirine. Hin ji wan nivîskaran taybetmendiya wan bijîşk in, hin jî di aliyê bijîşkî de zanyariyên wan hene. Dr. Sûzan, yek ji van mînakên e ku bi dehan nivîs di hejmarên cuda cuda yê kovarê de weşandine. Piraniya mijarên Dr. Sûzanê, li ser mijarên tendurustiyê ne. Xweparêzî di nivîsên wê de mijara sereke ye.

Dr. Silêman û Dr. Silêman Temer Seîd, du bijîşkên din in ku bi renek car caran berdewam, mijarên tendurustiyê di nava hin hejmarên Kovara Sivore de tên dîtîn. Armanca nivîsên van jî zêdetir li ser wê yekê ye ku zarok zanyariyên zêdetir li ser mijarên tendurustî bizanin.

Hemze Rezîkî, navekî gelek berçav e bi taybetî di hejmarên destpêkê yê kovarê de, gelek nivîs li ser meseleyên xweparastina zarokan ji nexweşiyên weşandine. Ew bi xwe ne bijîşk e, pîşeya wî Berpirsyarê Beşa Ragihandinê ya Midûriyeta Tendurustîya Duhokê ye. Di warê tendurustiyê de demek dirêj wekî me diyakar kar kiriye, xwedî şhrezatiyeke baş e di warê tendurustiyê de.

Her wisa çend nivîskarên din mijarên cuda cuda yê tendurustiyê di kovara Sivore de weşandine, mînak: Hêja Weysî, Dilşad Yusif, Cîhan Serbest, Kawar Kamil, Nîwar Başûrî, Bavê Ropelê, Elind Mizûrî û Asiya Salih û gelek nivîskarên din. Bi rastî di aliyê tendurustî de kovarê kêmasî nekiriye, di piraniya hejmarên hatine weşandin de mijarên tendurustiyê têde parve kirine. Ev yek jî dibe sedem ku zarokên kovarê dixwînin di aliyê tendurustiyê de li ser rewşenbîriyeke baş perwerde bibin.

Dîrokî: Hejmareke zêde ji nivîskaran bi nivîsên dîrokî beşdarî kovarê bûne, mînak: Mosediq Tovî, Mûhammed Emîn, Bilin Mûhammed, Gulnaz, Ismaîl Badî, Bavê Ayînê, Warhêl Batifî, Nîhad Seîdulla, Selah Hirorî û Mesûd Gulî...

Mijarên dîrokî yê di Kovara Sivore de hatin weşandin, di bara dîroka Kurdî û ya Cîhanî de parve kirine. Zêdetirîn, di bara dîroka Kurdî de agahî dane. Mijar ji

dîroka kevin ya Kurdan, dîroka nû ya Kurdan, jîyana nivîskar û kesayetîyên Kurdan pêktên.

Zanyariyên Gelemperî û Zanistî: Navên hinek nivîskaran; Remezan Ismaîl, Diyan Cemîl, Sîzar Mesûd, Cemîl Mûhemmed, Selahedîn Arif, Cahîda Bîrî, Zêmar Mûhemmed, Bavê Bahozî, Emîn Abdul-Qadir, Diya Nazelînê, Serdar Kêsteyî, Hêja Weysî, Lawend Şêrdil, Asiya Salih, Bêrîvan Reşîd...

Piranîya nivîsên li dor vê mijarê hatin weşandin, ji zanyariyên gelemperî pêktên. Agahî di bara tiştên girêdayî jîyana rojane de, parve kirine, mînak: li cihekî agahî di bara avakirina xanûyan de ne, li cihek din, di bara teknolojiyan de agahî parve kirine. Di gelek hejmarên Kovara Sivore de, bi awayek fireh, ev mijar tê dîtin.

Cotkarî û Heywan: Navên hinek nivîskaran; Evraz Êmînkî, Erefat Mûhemmed, Şevîn Omer, Warjîn Doskî, Lawîn Selam, S. Zirweyî, Izet Yusif, Tovî, Şînwar Germavî, Dêjîn Sidqî, Evîn Hemîd, Şukriya Abdul-Rehman, Sêvo, Çiro Heme Seîd, Remezan Kenan, Segvan Yusivî, Huda Ehmed, Bavê Romanê.

Di bara cotkarî û heywanan de, bi awayek fireh, nivîs di vê barê de, di hejmarên kovarê de, tên dîtin. Zanyarî di bara cotkarî û amûrên girêdayî karê cotkarîyê de, parve kirine. Beşeke nivîsan, di bara rewşa cotkarîyê de, li serdemên kevin agahî parve kirine, beşek jî girêdayî vê serdemê ne. Herwisa hindek nivîs di bara demsalan de jî parve kirine, ew yek zelal kiriye ku kîjan demsal bi kêrî çi cure cotkarîyê tê. Di vê barê de jî hûrgilî yên balkêş parve kirine.

Herwisa di bara heywanan de, agahî parve kirine. Di bara nav û cureyên heywanan de, zanyarî hene, kîjan heywan li çi cihê dijî, jîyana wan bi çi awayî derbas dibe, xwarinên wan çi ne, ji bo mirovan kîjan heywan bi kêrî xwarinê tê, kîjan bi kêrî xwarinê nayê... Bi vî awayî, li gorî mijarê, wêneyê heywanan jî parve kirine, paşî agahî parve kirine.

Civakî: Navên hinek nivîskaran; Subhî Silêman, Perwîn Abdul-Ezîz, Hacî Ceîfer, Diya Fênikê, Sîtî Hesên, Buhar, S. Arif, Fehmî Selman, Awaz Duhokî, Şîlan Mûhemmed Seîd, Şîrîn Ehmed, Hawkar Nûrî...

Hertim Kovara Sivore, bi rêya nivîsên xwe, hewl dide ku civakeke baş ava bike. Ev yek di nivîsên kovarê de, gelek bi rohnî tê dîtin. Kovara Sivore bi rêya nivîsên civakî, hewl dide ku zarok bi civaka xwe re eleqedar bibe, li ser bingeha rêzgirtinê perwerdê bibîne. Ji silavê heta bi xatir-xwestinê, mijar parve kirine,

zarokan hîn dike ka ewê çawa têkelîyên xwe yên civakî xurt bike, çawa rêz li kesên mezin tê girtin hîn dike. Di nivîsan de, malbat cihekî fireh digre, dixwaze zarok hertim, şêwrê bi malbata xwe bike, dilê wan hertim xweş bike. Herwisa karên baş û yên xerab, ji hev cuda dike. Bala zarokan ji bo karên baş dikişîne û wan ji karên xirab dûr dike.

Werziş: Piraniya nivîsên girêdayî werzişê ji aliyê nivîskarên kovarê ve bi xwe dihatin amadekirin, piraniya wan nivîsan bênav in, lewma di vî aliyê de navên kêr nivîskaran tên dîtin. Navên hinek nivîskaran; Hilbîn Elî Selîm, Hacer Dawûd, Kajîn Cemîl, Îbrahîm Selam..

Ji bo zarok xwedî tendurustîyeke baş bin, mijarên werziş rêkeke sereke ye, Kovara Sivore bi nivîsên werzişî, hewl dide ku zarok bi awayekî baş hîn werziş û sporê bibin. Herwisa di bara hindê cureyên werzişê de, zanyarî parve kirine. Tiştê balkêş di mijarên werzişî de, yarîyên Kurdî yên gelêrî jî parve kirine, piraniya van yarîyan di niha de nayên dîtin, heta ku hindê ji wan hatine jibîrkirin, lê di vî aliyê de Kovra Sivore dixwaze ev yarî zindî bimînin. Zarok ji bo parastina wan bingehe.

Pêkenîn û Şertonek: Navên hinek nivîskaran; Kawa Salih Xazî, Nîbar Gulî, Kîkî, Rojhat, Sidîq Hacî Welî, Nazdar Mûhemmed, Selam, Mûhemmed Emîn, Hêja Weysî, Hêja Sitar Elî...

Ev mijar jî di rûpelên Kovara Sivore de tên dîtin, armanc ji vê mijarê, zêdetirîn ji bo kenandina zarokan e, nivîskaran xwestiye, bêhnok bidin mejîyê zarok, herwisa kenî bêxin ser devê zarokan, bi rêya pêkenînan. Şertonek jî armanc jê ev e ku mejîyê zarok fireh bibe, her carê hînî tiştêkî nû bibe.

Hejmareke zêde ji nivîsên Kovara Sivore ji aliyê zarokan ve hatine weşandin, bi dehan zarok bi mijarên cuda cuda beşdarî di kovarê de kirine. Navên hinek zarokan; Aheng Moeyed Ruşdî, Nijyar Ceifer Ehmed, Aştî Yûnis, Warvîn Elî, Milet Ismet, Ala Edîb Ozmanî, Rewan Bedirxan Xidir, Sîzar Şewket, Hogir Hikmet, Hesên Fetah, Rêjîn Remezan, Çinîn Jaro, Nizar Mustefa...

Tê zanîn ku hejmara nivîskarên nivîs di Kovara Sivore de weşandine, gelekî zêdetir in. Ji van navên me nîşan kirin, di lêkolîneke bi vî rengî de rê li ber me digre ku em nikarin wan hemû nivîskaran nîşan bikin. Ez dixwazim vê yekê bidim diyar kirin ku piraniya wan nivîskaran nivîsên curbicur weşandine, mînak ew navên di beşa çîrokan de, ne tenê çîrok weşandine. Dibe ku mijarên din jî ji aliyê wan ve hatibin

weşandin. Lê piraniya mijarên wan çîrok in. Ez dikarim bibêjim 90% mijarên wan girêdayî çîrokan e. Êdî mijarên helbest, civak, werziş, tendurustî û dîrokî hwd. bi heman awayî ne.

2.3.2. Formên Nivîsan Kovarê

Yek ji şert û mercên nivîsan ji bo kovarên zarokan, divê formên nivîsan li gor temenê zarokî bê nivîsandin. Ji xwe di aliyê naverokê de divê li pey temenê zarokî bigunce. Nabe nivîsek bi naverokeke alozî û giran ji bo zarokan bê parve kirin, ji ber tiştê sereketirîna peyamê bi rohnî dide xuyakirin, naveroka mijarê ye. Dibe hinek mijarên tên weşandin, di hinek kovarên zarokan de, ji aliyê naverokê de wateyeke xwe hebe. Bi rengekî xweşik hatibe rêzkirin, lê dibe ew nivîs bi kêrî temenê zaroktiyê neyê. Bi taybetî jî sernavê nivîsê dibe bi hevokerê giran destpê bike. Li vir ev yek wisa dike mejiyê zarokî bê têkdan. Ji heznekirina wî sernavî dibe bi yekcarî kovarê hîlbide û ji xwendina wê hez neke. Di vê demê de ew nivîs dibe sedema silbûna zarokî ji bingeheke xurta rewşenbîrî ku ew bingehe jî helbet kovareke taybet bi zarokan e. Dixwazim hevokerê mînak hil bidim ji bo ew mijar baştir êşkere bibe, eger ew navê nivîsekê ji hevoka "şêrî xwîna giyaneweran vexwar" destpê bikin ku di kovareke zarokan de şaşiyeke mezintirîn e. Dibe di aliyê naverokê de tu şaşî nebin, lê ji bo kovareke zarokan mijarên bi vî rengî ne guncaw in.. Em du caran zarokî êşkence didin, carek ji aliyê psîkolojî de, yekser bala zarokî diçe ser kuştin û gotina 'xwîn'ê digel heywanekî çolê 'şêr', tirseke zêde li cem zarokî peyda dike. Cîhana zarokan cîhaneke xweşik e, ji dilovanî û arîkariyê hez dike. Nivîseke bi vî rengî ew wî tînin nava cîhaneke şer û xeyaleka tirsna de. Bi yekcarî mijarên bi vî rengî ji bo zarokan ne guncaw in, her çend me nîşan kir ku di aliyê naverokê de wateyeke xwe ya temam heye jî.

Divê di ragihandina zarokan de, li gorî temenê zarokî, formên nivîsan bîr weşandin. Mînak di temenê 3-6 salî de, zêdetir giringî bi wêneyan bê dayîn. Bi teybetî jî di qûnaxa beriya şeş saliyê de. Divê nivîs kêr bin, eger hinek nivîs hebe jî divê formên wan nivîsan kurt bin, bi awayekî digel temenê zarokî guncaw be. Her wisa teqezî li rengan jî bê kirin, hewl bê dayîn rengên xwezayî mîna; kesk, sipî, sor, şîn hwd. Ji ber ku her rengekî li gorî mijara tê weşandin, li cem zarokî fikr û ramanên xwe yê cuda hene. Bi rengekî gelemperî di vî aliyê de di kovara Sivore de kêmasî kêr tê dîtin, giringî daye aliyê formê nivîsan, bi nêrîna min li gor asta rojnamegeriya

zarokan hatiye nivîsandin. Bi giştî formên nivîsên kovara Sivore li ser du beşan dabeş dibe:

2.3.2.1. Formê Nivîsên Kurt

Gelek giringî bi vê beşê dane, li gor xwendina me ji bo nivîsên kovara Sivore, 65% formên nivîsên kovara Sivore, nivîsên kurt in, piraniya van nivîsan ji bo zarokên temenê wan di bin 10 saliyê de hatine weşandin. Di vê mijarê de em dikarin arasteya peyama kovara sivore jî bizanin. Mijarên sivik û balkêş hene. Wêneyan bandoreke erênî li ser rûpelên kovarê kirine, bi rengên xwezayî ew mijarên sivik xweşîktir kirine, tam xwandevanên kovarê diçe nava cîhana zarokan. Formên kurt ên nivîsên kovarê wisa dike; zarok bi rengê baş ji wan mijaran fêr bike, hem dibe cihê dilxweşîya zarokî, hem jî dibe çavkanî ji bo hînbûna hin mijar û zanyariyan.

Formên nivîsên kurt cihekî fireh di kovara Sivore de cih girtiye, arasteya nivîsan zêde ber bi aliyê perwerdeyî ve diçin. Di Gelek mijaran de kovara Sivore xwe mamosta dibîne; zarok jî wekî xwendekar, mîna kesek bi dilovanî bibêje. Ez dixwazim pêşeroja te rohnî bikim, ez bi te re arîkar im, mereqan neke; nivîsên min formên wan kurt in heta ku tu ji van nivîsan aciz nebî.

Di dema analîzekirina min ji bo nivîsên kovara Sivore de, parçeyek ji helbesta Seyda Ehmedê Xanî li bîra min anî, dema kerem dike, dibêje:

Herçend kelam şubhê dir bit

Bê qedir dibe dema pir bit

Di vê malikê de Ehmedê Xanî bang dike ku nivîskar bi tiştên bêwate ve mijûl nemîne. Bingeheke xurt nîşan dike ku zêde axaftin, gotinan bêqîmet dike, em dikarin vê felsefeyê di vî warê de bi cih bikin. Eger em bixwazin mijarekê ji bo zarokan parve bikin, bi kêmasî em vê felsefeya Ehmedê Xanî bikin bingeh ji bo nivîsên xwe. Em hindik binivîsin, lê pir tiştan bibêjin, li cihê em pir binivîsin hindik ji aliyê zarokan ve bê wergirtin. Nivîsên kovara Sivore ev yek mîna bingehê bûye şert û merc. Piraniya nivîsên di kovara Sivore de tîn weşandin ji aliyê formê ve kurt in. Lê neveroka wan nivîsan ji gotinên balkêş ji bo zarokan tije ye, wate bi awayekî xwezayî van nivîsan di kovarê de cih girtine; lêbelê bi zanebûn û sistematîk ev yek di kovara Sivore de cih dibîne.

Nivîsên kurt ên kovara Sivore, formên wan cuda ne, hinek nivîs tenê ji gotinekê pêk tên, heta digihe paragrefeke 6 rêzî, bi gelemperî nivîsên kurt bi du cureyan tên weşandin:

Hejmareke zêde ji nivîsên formên kurt ên kovara Sivore, pêktên ji (1- 15) hevokan. Ev cureyên nivîsan mijarên cuda cuda li dora xwe kom dike, pêktên ji mijarên; zanyarî yên giştî, werziş, tendurûstî, mijarên li dora giyaneweran, pirs, jiyannama kesatîyên Kurdan û beşeke kêr ji mijarên dîrokî. Dibe ev yek ji bo hinek kesan cihê pirsê be: Çawa mijarên dîrokî û jiyannameya kesatîyan bi çend hevokên kurt peyva digihe? Di bersivê de; kovarê tiştê giringtirîn ji van mijaran kom kiriye, di çend hevokên kurt de zanyarî parve kiriye, wekî zanîneke destpêkî ew mijar vekirine. Xala bihêztirîn em jibîr nekin; ev nivîs ji bo zarokan tên parve kirin, pêwîstî tenê bi hin mijarên giring heye.

Li pey xwandin û lêkolîna me ji bo nivîsên kovara Sivore, formên nivîsên kurt ên (1- 15) hevokan rêjeya nêzî 40% ji hevokên kurt di nava kovara Sivore de pêktîne. Ev rêjeya li pey kovareke zarokan rêjeyeke baş tê hejmartin. Hilbijartina formê nivîsên kurt, di bingeha xwe de analîzeke berfireh ji nivîskaran tê xwastin. Nêrîna min eger mezin ji bo zarokan binivîsin divê du caran ji bo mezinan binivîsin. Tenê carek ji bo zarokan, ji ber divê nivîskar beriya ji bo zarokan binivîsin herî kêr van pirsan beriya nivîsê ji xwe bike: Çi tê xwestin ji bo zarokan? Çawa ji bo zarokan tê nivîsîn? Kengî tê nivîsîn? Çima tê nivîsîn? Divê nivîs çi qas be?

Mijar li vir, nivîs çi qas be? Lewma divê nivîskarê ji bo zarokan dinivîse zêde baldar be, li ser vê pirsê, bi gelekî giringî vê pirsê analîze bike. Piştî dest bi nivîsa xwe bike.

Nivîsên ji (15- 20) hevokan pêktên, dîsan li gor lêkolînkirina me, nêzî 60% ji formên nivîsên kurt pêk tînin. Mijarên cuda cuda li xwe digrin wekî; tendurûstî, helbest, mijarên dîrokî, zanyarîyên giştî, werziş, mijarên li dora giyaneweran, jiyannameya kesatîyên Kurdan û çîrok. Bi giştî hilbijartina formên nivîsên kurt çend armanc hene:

Yekem: Sûd ji rûpelên kovarê tê wergirtin, dikare çend nivîsên cuda di yek demê de parve bikin, wate di her hejmarekê de rêjeyeke baş ji zanyarî û notan ji bo zarokan parve bikin. Bi vî rengî kovar dibe çavkaniyeke bihêz ji bo rewşenbîrkirina zarokan.

Duyem: Kovarên taybetmend ji bo zarokan, giringiyeke mezin bi wêneyan didin, armanc jê ev e ku rûyekî xweşik di rûpelên kovarê de bê dîtin. Helbijartina formên nivîsên kurt delîvên zêdetir xweş dike ku wêneyên balkêş di kovarê de bîn dîtin, ji xwe helbijartina wêneyan digel nivîsan, bi hev re rola temamkirina hev dîkin.

Sêyem: Zarokî fêr dike ku bikare digel xwendinê, mejiyê xwe jî bikar bîne. Nivîsên kurt arîkariya mejî zûtir mijaran werbigre û şîrove jî bike.

Çarem: Nivîsên kurt rêyeke arîkar e, mirov dikare taybetmendî û asta kovarê nas bike.

Pêncem: Zarok ji nivîsên kurt hez dike, ev xala sereke ye ku formên nivîsan kurt tên dîtin.

2.3.2.2. Formên Nivîsên Dirêj

Ev cureya nivîsan ji (20- 80) hevokan pêktên, ev formê nivîsan zêdetir di çîrokan de tê dîtin, bi taybetî jî çîrokên wêne tede kêmbin. Mebest ji kêmiya wêneyan ev e, hemû mijarên di kovara Sivore de tên weşandin. Ji bo ku bêtir mijar dewlemend bibe, wêneyên girêdayî mijarê jî tên parvekirin, di hinek mijaran de zêdeyî du wêneyan hene, heta hinek mijar digihêjin heşt wêneyan. Mijarên formê nivîsên wan dirêj, wêneyek yan du ligel de ne, di van forman de nivîs rola sereke dilîze.

Hin mijarên civakî û dîrokî, formê nivîsên dirêj tên dîtin. Sedema vê yekê jî bi nêrîna min, hinek mijar hene kurtkirina wan zehmet e, pêwîstiya wan bi dirêjkirinê heye, lêbelê dirêjkirineke wisa li gor ast û xwesteka zarokan guncaw be. Helbet ev yek di kovara Sivore de bi giringî hatiye wergirtin.

Mijarên girêdayî cotkarî û heywanan jî, formên nivîsên dirêj tên dîtin, bi taybetî jî mijarên tên şîrovekirin, ew jî mîna mijarên dîrokî û civakî pêwîstiya wan bi dirêjkirinê heye. An jî em dikarin bi rengekî din bibêjin nivîskar dixwaze mijarê bi rengekî giştî şîrove bike, zanyariyên zêde ji bo zarokan bîn parvekirin.

Nivîsên formên wan dirêj, ji aliyê naverokê ve, zêdetir ji bo zarokên temenê wan di ser neh-saliyê de tên nivîsandin. Ev nivîs ji aliyê têgehiştinê de, ji bo vî temenî zarokan guncawtir e. Baştir dikarin teamûlê digel van nivîsan bikin. Wate ev nivîs tên arastekirin ji bo temenê (9- 15) salî.

Li pey xwandin û lêkolîna me ji bo nivîsên kovara Sivore, rêjeya 35% ji tevahiya nivîsên di kovara Sivore de tên weşandin, formê nivîsan dirêj in, ev rêje ji

bo kovareke giştî ya zarokan guncaw dibînim. Ji ber peyama kovara Sivore gihiştiye ji bo zarokên (1- 15) salî. Tenê di nivîsan de mirov dikare hevberkirinê bibîne, yek bi yek nivîsan şîrove bike, her yekê ji bo temenekê dest nîşan bike. Wate hemû temenên cuda yê zarokan dikarin xwe di nava kovara Sivore de bibînin.

Wêne di kovara Sivore de, ji bilî nivîsan wêne rola sereke dilîze. Di piraniya hejmaran de zêdeyî 55% rûyê rûpelên kovara Sivore bi wêneyan tî xemilandin. Eger em bi hûrî hejmarên kovarê lêkolîn bikin, ev yek gelek bi rohnî ji bo me xuya dibe. Di lêkolîneke zimanî de em zêde li ser vê mijarê nasekinin, ji ber armanca me lêkolînkirina zimanê ragihandinê ya kovara Sivore ye.

2.4. Di Kovara Sivore De Zimanê Ragihandinê

Ziman ji bo têkiliyên mirovan bi hev re amûreke giringtirîn e. Her wisa ziman xwedî hinek teybetmendî ye, eger ziman tunebe bi vî awayî mirov, nikarin bi hêsanî têkilî û peywendiyên digel hev ava bikin. Di vê barê de Nezîr Öcek dibêje; "Ziman heyîn û nîşaneyên mirov û mirovatiyê ye." (Öcek, 2014: 12). Ev wê wateyê dide ku cihan tev girêdayî ziman e, ziman ji bo mirovbûnê nîşaneyê bihêztirîn e. "Zêdeyî 2500 ziman di cihanê de hene." (Izedîn Mustafa Rasul, 2005: 11).

Di bara zimanî de nivîskar Samî Tan dibêje; "Ziman navgîna ragihandinê ye. Mirov bi rêya dengên hest û ramanên xwe radigihîne hev." (Tan, 2015: 21). Nexwe ziman tunebe bi hêsanî mirovan nedikarî hest û ramanên xwe bigihînin hev. Bi rengê din mirov dikare bibêje; ziman nasname ye jî. Ji bo gelek miletan ziman dibe xala pê were naskirin. Yanî ziman ji bo nasnameya hevpara miletan nîşane ye. Zimanên cuda bûne sedema derketina qewmên cuda. Di dirêjahiya dîroka mirovatiyê de her tim mirovan hewl daye ku rêyên guncawî bibînin ji bo hêskirina zimanî. Armanca jî wan hewlan tenê rawêşbîrkirin û gihandina zanyariyan e. Her wisa "Ziman amûreke jiyanê ye, mirov ji bo wê yekê bikartîne, heta ku ew jî bibe endamek di civakê de." (Azad Ramazan Elî, 2005: 56). Bi vê yekê jî wisa xuya dike ku "Ziman jidayîkbûna civakê ye, li pey guhertina civakê tê guhertin. Ew guhertin jî dibe guhertineke dînamîkî ya nevxweyî. Yan jî encama bandora neteweyek din be." (Abdull-Selam Necimedîn, 2011: 32).

Li aliyekî din zimanê ragihandinê bi giştî di dabêşkirinê cureyên ziman de cureyê sereke ye, herwisa îstîfade ji hemû bikaranînan zimanî dibîne. Bi wateyê cuda, "Ji ber ku rojnamegerî hemû mijaran bi xwe ve digre. Ji aliyek din ve

rojnamegerî zêdetir materyalek gelêrî ye. Xelk ji çîn û pileyên cuda dixwîne." (Xabûr, 2012: 117). Bi vê yekê xuya dibe ku ziman û civakê bi hev re girêdide. Zimanê ragihandinê zimanê eşkere û dîqet û ronbêjî û lezatî ye. " Zana û nivîskar û rojnamevan lihev hatine ku zimanê ragihandinê zimanê hevbêş e di navbera zimanê zanist û zimanê edebî de, sedemek e ji sedemên nêzîkbûna di navbera astên derbirînê cuda de." (Xabûr, 2012: 117). Ziman dikare têkiliyên nêzîk di navbera wergir û bûyeran de çêbike, "Zimanekî sade û rewane bi rêya zarave û rengên zimanî yê cuda mebestan digihîne, ji ber ku rojane di nava xelkê de ye, lewma divê ji aliyê rêzmanî ve kêmasî tunebe, herwisa zêde gotin têde kêr werin bikaranîn." (Omêd Mesud, 2002: 61-64). Her wisa "Zimanê ragihandinê zimanê serdemî ye, ji ber ku zimanê rojane ye ji bo derbirîn û rêxistina nêrînan tê bikaranîn, ji ber van sedeman ziman ji şehrîstaniyê tê hejmartin." (Aryan Îbrahîm, 2011: 158).

Ji bo derbirîna şert û mercên giştî yê têkilî û mijara nivîsê û wergirî û cureyên derbirînê, gelek ast hene. Lê bi rengekî giştî di derbirîna zimanî de sê ast hene. (Ebdulêzîz Şeref, 1991: 84).

A. Asta tehma hunerî û rindiyê: Asta derbirîna edebî ye, di vê astê de nivîskar hewl dide derbirînê ji hestên xwe bike.

B. Asta teoriya zanistî: Ev ast giringiyê dide rastiyên li jêrî wateyê ev ast girêdayî zimanê diyarkirî ye.

C. Asta civakî: Ev ast bi rengekî giştî di warê ragihandinê de tê bikaranîn, ev rohnî û sanahî ye ji bo têgehiştinê.

Ragihandin cîhaneke berfireh e ji bo têkiliyan û di vê cîhanê de ziman alava çalakîr û diyartir e. Lewma eger ragihandin çalak û bi bandor nebe û eger di piroseya nivîsînê de giringî bi zimanî neyê dayîn, hingê têkilîyeke sûdbexş saz nabe. Ew zimanekî ji zimanê axaftinê ya rojane cuda ye, xwedî çend taybetmendî ye. Yek ji wan taybetmendiyên hêsanî ye, helbet ev yek di ragihandina zarokan de zêdetir tê dîtin, ji ber ku cîhana zarokan cîhaneke ji cîhana mezinan bi temamî cuda ye. Zêdetir ziman ber bi hêsanîyê ve diçe. Her wisa hêsanî pêngaveke bi bandor e ber bi rohnêjiyê ve, ev gotin di nava salonên rojnamevanên cîhanê de tê gotin. "Ji bo bidestxistina hêsanîyê divê nivîskar ji babetên rewanbêjî û aloz dûr bikeve." (Ebdulêzîz Şeref, 1991: 197). Dikare bê gotin; divê ew nivîskarê ku ji bo kovarên zarokan dinivîse, zêdetir wan gotinan bikar bîne ku zarok rojane wan bikar tînin, ji

bo zarok bi wan gotinan re eleqedar bibe û ew gotin, ji bo zarokî nebe gotineke xerîb. Wate çênabe gotinek, yan hevokek bê bikaranîn ku mêjiyê zarokî wernegire û matmayî bimîne, bibe sedema dûrketina wî ji xwandinê.

Di ragihandinê de bi giştî û ji bo zarokan bi taybetî, çênabe ew gotin bêne helbijartin yên nêrînê ji etîkê bûyeran neke. Bi rengekî din divê aliyê derûnî yê zarokî berçav wergire wekî nivîskarê naskirî yê Îngilîz (Swift Jonathen) dibêje; 'gotinên guncaw li cihê guncawî.' (Can Cibran Kerem, 1992: 83). Wate, di helbijartina zimanî de ji gotin, zarav, hevok.. teqezî tê kirin ji bo mebesta aferandina peyameka rojnamevaniyê.

Wekî me di serî de got rojnamenivîs peyama xwe bi rêya nivîsînê diweşîne, naxwe divê ew zimanekî rohnî û birêkûpêk bikar bîne. Nivîskarê ku ji bo zarokan dinivîse, divê ji aliyê rêziman û rênivîsê ve şerezayiyeka baş hebe, divê yasayên hevokî û peyv sazî bi awayek rast û durust bikar bîne. Di kovara Sivore de ev yek gelek neketiye ber çavan, li gorî xwendina min gelek şaşiyên rênivîsê di gelek hejmarên kovarê de hatine, hin tîp nehatine nivîsîn. Lê dibe ku ev şaşiyên çapê bin. Hinek tîp jî ji şaşiyên nivîskaran bi xwe ne, mînak di gelek hejmaran de tîpa (o) kirine (u) tîpa (yî) bi (y) nivîsandine. Herwisa tîpa (û) bi (u) nivîsandine. (bo) kirine (bû). Gelek şaşiyên din yên rênivîsê hene lê ev yek nayê wê wateyê ku em xebata kovarê kêr bikin. Lewra kovarê bi hêsanîya zimanê xwe bandor li ser zarokên kurdan hiştiye. Çîrokên wê bi zimanekî hêsan hatine nivîsandin. Di beşek din de mîna dibistanê zarokan hînî zimanên Kurdî û Îngilîzî dike ku me di beşa duyem de bi dirêjî behs kiriye.. Ji bo qûnaxên bê divê kovar gelekî zêdetir li ser aliyê rastnivîsê xebatan bike da ku wan şaşiyên rênivîsê dubare neke.

2.4.1. Ji Aliyê Sentaksê ve

Beriya em ji aliyê praktîkiyên kovara Sivore bixebitin, em ê bi kurtasî li ser sentaksê bisekinin. Wekî tê zanîn ji ber firehî û têkiliya zahf bi zimanî ve, sentaks bi serê xwe zanistek e. Ji aliyê zimanî ve (syntaxis) tê gotin bêjeyeke Yûnanî ye. " Ji du gotinan pêktê (syn) bi wateya danan û (taxis) bi wateya rêkxistin tê." (Sacîde Ebdullah Ferhadî, 2013: 4). Wateya wezîfeya sentaksê ji hevgirtina bêjeyên di nivîsîn û axaftinê de pêktê..

Hevok: Tewfîq Wehbî di bara pênaseya hevokê de dibêje; "Hevok zincîra bêjeyan e ku fikr û ramanekê didin xuyakirin." (Komîsyona Ziman, 1986: 161). Nûrî Emîn Elî dibêje; "Hevok ji lêker û pêwîstiyên wê pêktê." (Ewrehman Hacî Marîf, 2004: 57). Nerîman Ebdullah jî bi vî awayî hevokê pênasê dike; "Hevok ji gotinekê, yan zêdetir ku wateyeka wê hebe, pêktê." (Nerîman Ebdullah Xoşnaw, 2014: 12). Chomsky di bara hevokê de dibêje; "Hevok ji firêz û navê firêzî, lêkerî pêktê." (Nerîman Ebdullah Xoşnaw, 2014: 12). Gelek pênasê ji bo hevokê hatine kirin. Ev, ji wan pênasayan beşeke gelek kêmbû.

Bi giştî hevok di zimanê kurdî de du cureyên wê hene

2.4.1.1. Ji Aliyê Naverokê ve

Di hemû zimanên Cîhanê de, Zanayên ziman tim hewl didin, ziman bi rengekî hêsan bê lêkolînkirin. Ziman li gorî pêkhatin û aferandin û erk û wateyê dabeş kirine. Di vê barê de, emê li ser wate û erkê hevokê bisekinin. Her hevokek bê gotin, wateya wê heye: di heman demê de erka wê di wateya wê de diyar dibe. Di zimanê Kurdî de, hevok ji aliyê erk û wateyê ve, çar cureyên wê hene:

2.4.1.1.1. Hevokên Ragihandinê

Ew hevok e ku axaftvan agahî û zanyariyan digihîne derdorê xwe. "Ew hevok in ku di bara rewş û bûyerên fermanî û navberî, baneşanî, erênî, neyînî, divêtî, bilanî, pirsyarî, de agahî û ramanekê didin. Ev hevok bi alîkariya raweyên pêşkerî pêktê." (Öcek, 2014: 265).

Di hejmarên Kovara Sivore de, hevokên zêdetir hatine bikaranîn, hevokên ragihandinê ne, ji ber ku di serî de me got armanca sereke ya weşana kovarê rewşenbîrkirina zarokan e. Di vê barê de, kovarê di heqê ragihandina zanyarî û agahiyan ji bo rewşenbîrkirina zarokan de kêmasî nekiriye. Helbet ev yek jî bi zanebûn di hejmarên kovarê de tîr weşandin. Li pey xwendina min ji bo kovarê hajmara hevokên ragihandinê ji hemû cureyên hevokên din zêdetir e. Ev yek jî sedemek e ji bo kovara Sivore bibe yek ji wan kovarên serketî di cîhana zarokên kurdan de û wê di vê qadê de cih girtiye. Bi taybetî jî zarokên Herêma Kurdistanê, qîmeteke mezin didin kovarê, heta wê astê ku di hinek cihan de mezin jî îstîfade ji kovarê werdigirin..

"Me nîşan kir ev yek bi zanebûn û bi renekî akademîk di kovarê de cih digre, em ê hinek mînakên hevokên ragihandinê ji kovarê rêz bikin."

"Di 22 Kanûna Paşîna 1946ê de yekemîn komara kurdî di dîrokê de bi navê Komara Kurdistanê li devera Mukriyan hate damezrandin" (Kovara Sivore, 211, 2017:1).

Nivîs ji aliyê sernivîskarê kovarê ve hatiye nivîsandin, eger em bala xwe bidin ser hevokê, hevoka ragihandinê ye. Nivîskar dixwaze di bara bûyereke dîrokî de agahiyan bide zarokan. Her wisa ew agahî bibin çavkanî ji bo wê yekê ku zarokên kurdan aşnayî dîroka xwe bibin, kêma an zêde haydar bibin ka li pêşîya wan çi bûyer hatine rûdan. Nivîskar dixwaze bi renekî erênî zarokêkî rewşenbîr ava bike. Agahî dan ji vê bûyera dîrokî hem bi zimanek hêsan, hem jî bi rohnî hatiye nivîsandin, tekst hemû bi vî awayî berdewam dike. Rênivîs û rêzmanan tekstê bi awayekê durust rûpela kovarê xemlandiye. Wêneyek balkêş ji bo zelalkirina bûyerê li ser rûpelan nexşandiye. Xweşikîya kovarên zarokan di vê yekê de ye, ev sedem e ku zarok her tim bi kovarê ve mijûl bibin û dilberîna kovarê bibin.

"Temenê kevintirîn awaz ku hatibe tomarkirin digehîne 3400 salan berî niha." (Kovara Sivore, 217, 2017:2).

Agahî di vê hevokê de ew e ku li dor awaz (tune) ya herî kevnar di cîhanê de agahiyan dide. Her wisa xuya ye ku zarok gelekî dilberîna ji bo mûzîkê, yek ji xwesteka zaroktiyê mûzîk e. Ji bo ku zarok vê xwestekê bibîne, ew hevok di kovarê de hatiye weşandin. Kêma yan zêde wisa dike ku zarok ji kovarê hez bikin, mejiyê wan di cîhana mûzîkê de fireh bibe.

"Kadîn, ciheke teybet e wekî jûrek an kogehekê, ji bo komkirin û parastina kayê." (Kovara Sivore, 211, 2017:3).

Ev çend hevok jî yên ragihandinê ne. Nivîsek bi navê ferhengoka şivanan di rûpela 13an de hatiye weşandin. Bi giştî nivîs behsa jiyana kevnar li gundan dike. Her çend nivîseke kurt e, kurtiya nivîsê diyaloga di navbera mamostayek û hin xwendekaran de ye, di nivîsê de di bara hin bêjeyên kevnar de mamosta pirsan ji xwendekaran dike, xwendekar bi hevokên ragihandinê bersiva mamostê xwe didin. Ew bersivdan dibe rêyeke ji bo rewşenbîrkirina zarokan. Bêjeyên di nivîsê de hatine nivîsin bêjeyên kevnar ên kurdî ne. Weke gov, axur, kutan, kadîn, bêder... Tişt

balkêş ev e ji bo her bêjeyek wateya wê hatiye ragihandin û armanca bikaranîna wê jî hatiye zelalkirin. Bi rastî jî di cîhana zarokên ku li bajaran dijîn de ev bêje xerîb in, dibe her neyên bikaranîn, heta ku ev bêje her zindî bimînin, yek bi yek rêz kirine û agahî û raman di bara wan de dane.

"Welatê hejîran başûrê Asya Biçûk e." (Kovara Sivore, 218, 2017:5).

Dibe zarok gelek ji fêkî û xwarinan hez bike, lê qet hizir neke ew fêkî û xwarin ji taybetmendiya kîjan welatan e. Di vê barê de kovarê nivîsek weşandiye, bi navê 'hejîr' di nivîsê de behsa cihê belavbûna hejîrê tê kirin. Her wisa behsa sûd-wergirtina mirovan ji hejîrê dike. Ew vîtamîn û proteînên ku di nava hejîran de hene û ji bo tendurustiya mirov baş e, bi awayek kurt û zelal radigihîne.

Her di vê barê de, nivîsek bi navê 'Mûz' weşandiye têde hatiye gotin ku "eger di zarokatiyê de rojane mûzekî bixwe di paşerojê de dê ji nexweşiya penceşêrê (kanser)ê bê parastin". (Kovara Sivore, 157, 2012:1). Agahiyên bi vî rengî herî kêrbandorek li ser zarokî çêdike ji bo ku zarok ji xwarina fêkî hez bikin. Bi rastî jî di vê barê de kovarê kêmasî nehiştiye, hema bibêje di hemû hejmaran de nivîsên bi vî awayî weşandine..

"Gundê Zorabî li ser rûbareke mezin bû.

Cuheka avê digihand ser zeviyê.

Bêhneke xwe girt heta kesek bê.

Li mal hemiya pirsyara wî kir.

Bavê wî û bapîrê wî ber bi zeviyê ve rêketin.

Ji hingê ve çîroka zorabiyê ketiye ser lêvên zarokan.

Dê û bavên wî şanaziyê bi kurê xwe yê qehreman dikan. "(Kovara Sivore, 200, 2016: 6-7).

Wekî beriya niha me nîşan kirî ji bo zêde dilxweşkirina zarokan di hemû hejmarên kovarê de bi zêdeyî çîrokekê hatiye weşandin. Ji bilî çîrokên wergerandî, pîraniya çîrokan ji aliyê nivîskaran ve hatine vehandin. Armanc ji van çîrokan ev e, başî û xerabiyên di çîrokê de hatine ji bo zarokan bibe tecrûbe. Çîrokek bi vî rîtmî bi navê 'Qaremanê Gundî' ji aliyê nivîskar Nesiredîn Îbrahîm Gullî ve hatiye

nivîsandin. Bûyer behsa qehremantiya xortekî dike, ev xurt çemên gund ji ava rûbar rizgar dike. Armanc jê ev e ku wî xortî karekî baş kiriye, nehişt zirar bigihe çemên gund. Kar erênî ye, wer kiriye ku dê û bavê xortî jê hez bikin. Gundî jî bi qehremantî bidin naskirin. Ev hevokên ragihandinê yên vê nivîsê bi rengê zelal û hêsan hatine nivîsandin, berê zarokan dide wan karan ku dê û bav jê hez bikin. Aramanc bi giştî karên qenc e. Zarok hest bi berpirsiyariyê bike, kar bike ji bo pêşerojek geş, her wisa her tim hewl bide zirarê negihîne derdorên xwe, bi hişmendî kar bike, her dem bandoreke baş li derdorên xwe bike û nebe cihê nerehetiyê ji bo her kesî.

Di bara ajaldariyê de jî hinek agahî bi rêya hevokên ragihandinê weşandine. Mînak: "Li seranserî xakê Iraqê du cureyên pezî dijîn" (Kovara Sivore, 157, 2012: 12). Ev hevok di nivîseka Silêman Temer de hatiye amadekirin. Li ser du cureyên pez li Iraqê agahiyan dide, "cureyê yekê Pezê Ewasî salê du caran dize, cureya duyem Pezê Kurdî Hemdanî ye, ev cureyê ajelî ber bi kêmbûn û nemanê ve diçe" (Kovara Sivore, 157, 2012: 12). Herdu cureyan bi awayekî rohnî û hêsan ji bo zarokan dide naskirin. Bi kurtasî ji îstîfadeyên wan jî behs kiriye. Her çend hinek şasiyên rastivîsê di vê nivîsê de hebin jî mînak bêjeya 'dize' şaş nivîsandiye 'dizît' û 'bijîn' bi 'bujîn' nivîsandiye. Lê wek peyama gihandiye û agehiyên pêwîst û destpêkî parve kirine.

Li alîyek din rûpelek, bi wêneyekî rengîn îşaretên rêyên caddeyan nexşandiye. Agahiyan rêyan li ser hatine nivîsandin, nivîs li ser navên şîretên hatin û çûyîne ye. Hawker Nûrî nivîs berhev kiriye têde hatiye "pêdivî ye piyasekirin bi tenê li ser şustey bît" (Kovara Sivore, 179, 2014: 8). Ev rênima ji bo zarokan lazim in. Divê nîşanî zarokan bê dan kîjan rê tehlûke ye, kîjan rê guncaw e. Di vê barê de gelek şîretên bi vî rengî di kovarê de cih digrin. Payam rasterast ji bo zarokan areste kiriye, mirov dikare bibêje di vê barê de kovar wekî dibistanekê dibe mêhvan ji bo zarokan, heta ku temenekî biçûk jî be lê divê hînî rêya rast bibe, ew rêya ku tehlûkeya wê nebe.

Di bara tendurustiyê de jî gelek agahî di rûpelên kovarê de parve kirine, mînak ji bo vê mijarê pir in. Nivîsek bi navê, didan şûştin' parve kiriye; di nivîsê de hema bibêje hemû hevok yên ragihandinê ne, mînak:

"Piştî mirov xwarinê dixwe

Giring e diran bêne şuştin

Nabe mirov gelek şîrînayî bixwe

Tiştên req bi diranên xwe neşkînin

Dê neçar be diranî bîne der.

Seredana nojdarê diranan bike.

Da li ser reşa saxlemiya wan agahdar bî.

Çare bikî. "(Kovara Sivore, 180, 2012: 3).

Ev hemû hevokên ragihandinê ne, di bara saxlemiya didanan de agehiyan dide zarokan.

Di bara erdnîgariyê de di piraniya hejmaren de agahî dane, nivîsek bi navê kerkûk weşandiye, ev hevokên jêrîn yên ragihandinê ne, di bara bajarê Kerkûkê de agahiyan dide.

"Kerkûk bajarek e di nexşeyê de

Dewlemend e bi petrolê

Salane bi mîlyonan bermîlên neftê jê tên

Boriyeke neftê digehîte Turkiye

Sêka (sêyeka) xelkê vî bajêrî kurd in.

Miletê kurd gelek qurbanî dane" (Kovara Sivore, 77, 1999: 16).

Hin hevokên din yên ragihandinê ku behsa kesayetiyên naskirî yên kurdan dike, di hin hejmaran de tên dîtin. Mijarek bi navê (Mîr Bedirxan Paşa) weşandiye, ev hevokên ragihandinê têde hene.

"Mîr Berdirxan di sala 1803an de li bajêrê Cizîrê ji dayîk bûye.

Di sala 1821 de bûye Mîrê Cizîra Botan.

Di sala 1868an de hate Dîmeşqê.

Di sala 1869an de çû ber dîlovanîya Xwedê" (Kovara Sivore, 6, 1998: 9).

Bi rastî jî di rûpelên kovarê de hevokên ragihandinî zahf hene. Ji xwe ji bo serkeftin û berdewambûna kovarê jî ev yek sedemeke bi hêz e. Ji ber ku wezîfeya hevoka ragihandinê, parvekirina zanyariyan e, di bara wê mijara ku axaftvan li serê diaxive de. Ev cureyê hevokan di rûpelên kovarê de wisa zêde ne, ku mirov dikare bi dehan lêkolînan li ser wan bike.

2.4.1.1.2. Hevokên Pirskirinê

Hevoka pirskirinê cureyeke ji cureyên hevokê, ji aliyê naverokê ve, ji xwe ji navê wê xuya ye ku ev cureyê hevokê teqezîyê li ser pirskirinê dike. "Bi rêya peyvên pirsyarî yan jî li gorî kirpandinê hevokên pirsyarî tên çêkirin." (Baran, 2012: 205). Di hevoka ragihandinê de axaftvan agahî didan, lê di hevoka pirskirinê de axaftvan pirs dike. Daxwaza agahî û zelalkirinê dike. "Wate di hevoka pirskirinê de kesê ku guhdariyê dike jêdera zanîn û zanyariyan e." (Nerîman Abdullah Xoşnaw, 2014: 34). Her wisa hevokên pirskirinê bi arîkariya hinek peyvên pirskirinê pêktên mîna, "Gelo, ma, aya, ka, kî, kê, kîjan, kengî, çend, çi, çima, qey..." (Öcek, 2014: 267).

Di kovara Sivore de gelek hevokên pirskirinê bikar hatine, ne kêmî hevokên ragihandinê giringî bi hevokên pirskirinê dane, li pey xwendina min ji bo hejmarên kovarê, pênc rengên pirsikirinê di kovara Sivore de hatine bikaranîn,

Yekem: Sernivîs bi pirskirinê destpê dike.

Hinek caran di serenivîsekê de pirsê kiriye, piştî nivîskarî bersiva wê pirsê bi dirêjahî daye. Mînak Perwîn Ebdulêzîz navê nivîsa xwe bi hevoka pirskirinê destpê dike û dibêje, "Çawa xwendekar hez ji mamostê xwe dike?" (Kovara Sivore, 66, 2004: 16). Piştî bi hevokên ragihandinê bersiva vê pirsê dide û bi dirêjahî li ser disekine. Girêdayî heman mijarê, Bavê Bahoz nivîsek amade kiriye, destpêka nivîsê bi hevoka pirsê destpê dike, dibêje, "Deng û reng û jeng çi ne?" (Kovara Sivore, 66, 2004: 18). Her wisa navê nivîsekê bi hevoka pirskirinê destpê kiriye. "Çawa dê zarokê şermîn bê naskirin?" (Kovara Sivore, 115, 2009: 22). Bersiva vê pirsê nivîskar Çîmen Tahir bi 11 rêzikan daye, agahiyên serinc-rakêş parve kirine. Di nivîsek din de, nivîsakar di sernavî de pirs dike "Dê çawa xwe biparêze?" (Kovara Sivore, 116, 2009: 3). Bi rastî jî dema zarok van hevokan dixwîne yekser bala wî radikişîne, ji ber ku zarok cîhanek cuda ye. Her tim li bersiva pirsan digere; dema hevoka 'dê çawa xwe biparêze?' bibîne, neçar dibe wê nivîsê bixwîne, lewra em

dibînin ku nivîskarên kovarê gelek caran bi zanebûn sernivîsên xwe bi hevokên pîrskirinê destpê kirine. Ya ku zêdetir wan nivîsan biha dike, piştî xwendinê yekser ew pîrs di mêjiyê zarokî de zindî dibe. Zûbizû zarokan piraniya wan pîrsan dike, piştî wan pîrsan digihe encameka baş û di pêşerojê de jî zarokekî rewşenbîr ava dibe, ji xwe armanca sereke ya ragihandina zarokan ev e. Ji ber vê sedemê jî hinek caran nivîskar mecbûr e van hevokan bikar bîne, heya ku ragihandin bigihe armanca xwe ya sereke. Di vî rengê pîrskirinê de nivîskar dixwaze mijarekê digel zarokan parve bike, ji bo ku bala zarokan ji bo nivîsê bikişîne, nivîsa xwe bi hevokeka pîrskirinê destpê dike. Armanca jê ev e ku wê pîrskirinê bi rengê balkêş ji bo zarokan şîrove bike.

Duyem: Şertonek (Mamik)

Tê zanîn ku şertonek (mamik) jî di kovara Sivore de hatine weşandin. Kurtiya şertonekê ev e ku axaftvan taybetmendiya tiştêkî dibêje, piştî pîrs dike; ew tişt çi ye? Di nava şertonekan de rengê pîrskirinê jî cihekî taybet di kovarê de girtiye, hema bibêje di piraniya hejmaran de şertonek hene, bi rengê balkêş amade kirine, piraniya caran jî bi rengê helbestan nivîsandine. Em ê hin mînakên ji weşanên kovarê bistînin.

Şertonekek bi navê ‘Tiştîkê mino’ hatiye parvekirin, nivîskar Remezan Îsmîl berhev kiriye, dibêje:

Tiştîkê mino tiştîk e

Yê mezin û biçîk e

Çi li deşta çi li dîwara

Na rawestît çi cara...

Yê bizanît zîrek e

Xame ye yan gilop e?

Demjimêre, yan sop e? "(Kovara Sivore, 116, 2009: 15).

Li dawiya şertonekê jî nivîskarî bi xwe bersiv daye, gotiya ‘demjimêr e’ di vê nivîsê de bi rengê zîrekane nivîskarî taybetmendiyên demjimêrê nîşan dane, li dawiyê pîrs kiriye ev çi ye? Wezîfeya vê pîrsê ev e ku mejiyê zarokan bi xwe ve

mijûl dike, wisa dike ku zarok bi rengê baştir demjimêrê nas bike hem jî zanyariyan di bara wê de kom bike.

Dîsan Remezan Îsmail şertonekek din jî weşandiye, dibêje:

Tiştîkê mino ev e

Dê çi bîtin ya ji tev e?

Car serav û car binav

Pêve ne, du guh, du çav

Kirasê wî yê req e

Li betena teq e teq e...

Beq e, yan jî kîsel e?

Kêvjale ye, yan qel e? "(Kovara Sivore, 119, 2009: 15).

Ev rengê pîrskirinê di gelek hejmaren de dewam dike, ev mijar jî parve kiriye:

Mamkê mino mamm

Wargehê qelem û xama

Alek pirtûk û pêûs

Yê dî rast e û lînûs...

Erê çeleng ev e çi ye?

Gencîne ye, yan kanî ye?

Xwendingeh e, yan xanî ye? "(Kovara Sivore, 75, 2005: 15).

Ev mînak jî hatiye:

Tiştê mino tişt

Du çiya li pişt

Gereka pir av û mişt

Di ber de bajêrekê rind û şirî...

Erê ev Xaneqîn e Yan Kerkûk? "(Kovara Sivore, 75, 2005: 13).

Di van nivîsan de nivîskar dixwaze du çûçikan bi kevirekê bikuje. Hem zanyariyên zêde di bara mijarekê de bide, hem jî pirsan bike heya ku zarok mejiyê xwe bide kar, di wezîfeya pîrskirinê de zarok hin caran di bersivê de matmayî dimîne, ji xwe ev tesîrê li zarokan dike.

Sêyem: Erê tu dizanî?

Ev cureyê pîrskirinê jî hema bibêje cureke gelek belav e di kovarê de, nêzî ji 40% hejmarên kovarê ev cureyê pirsan têde hatine. Ji xwe ji pîrsê xuya ye, dibêje; Erê tu dizanî? Mebesta wê ew e, nivîskar pirsan ji zarokan dike, di bara babetên giştî de, piştî pirsan yekser bersivên balkêş di nivîsan de eşkere dike. Hem zanyariyên cihanî ne, hem jî yên navxweyî ne. Hinek caran dîrokî ne, û hinek caran jî erdnîgarî, carina jî girêdayê hin kesayetîyan e û carina zanyariyên tendurustî û giştî ne. Mînak Ronahî Ehmed nivîsek ji du rêzikan pêktê berhev kiriye, navê nivîsê jî ev e (erê tu dizanî?).

Erê tu dizanî Çîn yekem welat e ku kaxez eşkere kirî?

Erê tu dizanî yekem mizgeft di dîroka îslamê de hatî avakirin; mizgefta Qobad bû? "(Kovara Sivore, 115, 2009: 26).

Her di heman rûpel û hejmarê de ji Jiyan Mûhammed jî nivîsek amade kiriye:

Erê tu dizanî? Mar berdewam zimanê xwe tîne der, çunkî bi wê rêyê nefesa xwe dibe û tîne. "(Kovara Sivore, 115, 2009: 26).

Di van nivîsan de bi rêya pirsan, erê tu dizanî? Nivîskaran xwestiye hin zanyariyên balkêş bi zarokan re parve bikin, armanc jê ev e ku zarok bi rêya xwendina kovarê hin zanyariyên giştî wergire, bersiva wê pîrsê wergire, li dawiyê zarok bibêje erê ez dizanim Çîn yekem welat e ku kaxez durust kiribe, yekem mizgeft di dîroka îslamê de Qobad e. Her wisa piraniya wan zanyariyan girêdayî jiyana rojane ya zarokan e, hem jî girêdayî rewşenbîrkirina zarokan e. Li ser vê mijarê ev hinek mînakên din e di hin hejmaran de.

"Erê tu dizanî? Wilyam Kulm yekemîn kes e Selace (Bûzgir) aşkere kiriye.

Erê tu dizanî? Corc Kilawd yekemîn kes e niyon aşkere kiriye. "(Kovara Sivore, 39, 2002: 3).

"Erê tu dizanî yekem pûl (tabî) wêneya Şajin (Viktoriya) li ser e?

Erê tu dizanî? Yekemîn kes dilê destkird aşkerekirî Dr. Carfis)bû, di sala 1938an de.

Erê tu dizanî? Yekemîn kes ku Helîkopter durustkirî, Sîkûriskî bû, di sala 1938an de. "(Kovara Sivore, 40, 2002: 5).

"Erê tu dizanî? Şerefyanê Bidlîsî yekemîn kes e dîroka kurdî nivîsiye, her wisa Eladîn Sicadî û Mûhemmed Emîn Zekî jî dîroka kurdî nivîsandine. "(Kovara Sivore, 42, 2002: 4).

Mînakên li dûv vê mijarê bi awayek fireh di kovara Sivore de tên dîtin, ev hin mînakên kêrhatî ji mijarê.

Çarem: Di nava nivîsan de

Ev cureya pirsan di hemû hejmarên kovarê de cih girtiye, bi hezaran hevokên pirsî di nivîsan de hatine, bi taybetî di çîrokan de cihekî sereke digre. Armanç ji van pirsan ev e, di bara karekî şaş yan baş de kesek ji kesatiyên di nav çîrokê de pirsê yan hin pirsan dike, bersiva wan pirsan erênî be, yan neyînî be, dawiyê tenê aliyê baş yê mijarê tê prattekirin. Mebest jê ev e berê zarokan bidin karên baş û ji şaşiyên dûr bixin. Lewma dema pirsê di nava nivîsê de tê kirin yekser bala zarokan dîkşîne, zarok meraq dîkin ku bersiva wê pirsê bizanin, ji xwe aliyê erênî yê bikaranîna van pirsan di vê yekê de ye. Her tim zarok pirsan dike ji xwe pirsîkirin ji bersivdanê giringtir in. Ji ber vê yekê, em dibînin ku van pirsan cihekî zêde di kovara Sivore de girtiye.

Çîroka bi navê Tevinpîrk hatiye weşandin, diyalog di navbera zarokek û tevinpîrkê de destpê dike, hin pirs ji zarokî tên kirin:

"Çima tu dê şaşiyê ligel dayîka xwe bikî?

Çi çêbûye?

Têk nebe?

Çima te wer kir?

Qey tu nabînî? "(Kovara Sivore, 72, 2005: 11-12).

Zêdeya van pirsan tevinpîrk ji zarokî dike, wisa eşkere ye ku zarok guh nade dêya xwe. Bi van pirsan zarok mecbûr dibe ku li wan şaşiyên xwe bizîvire ya ku digel dêya xwe kirî.

Di heman hejmarê de, çîrokek balkêş parvekirî ye, di çîrokê de zarokek hin pirsan di bara çûçikekê de ji bavê xwe dike, ew pirs ev in;

Kê nîşa wê daye?

Çûçika çi?

Erê tu wê dizanî ku bêaqil e?

Çima çûçikê ev ber û hirî kirine di hêlîna xwe de? "(Kovara Sivore, 72, 2005: 5).

Zarok van pirsan di bara çûçikekê de ji bavê xwe dike, ji bo her pirseke wî bavê wî rihet rihet bersiva kûrê xwe dide. Ev bersiv dibin jêderê zêdebûna zanyariyan li cem zarokî, li dawîya çîrokê zarok bi wan zanyariyan keyfxweş dibe..

Di bara vê mijarê de, çîrokek parve kirine, vê carê diyaloga çîrokê di navbera du çûçikan bi xwe de ye, hin pirs têde hatine:

Çima?

Made bo torebî?

Çima aciz î?

Tu têmagahî min çi divê? "(Kovara Sivore, 75, 2005: 4-5).

Yek ji wan çûçikan aciz e, çûçikên din her hewl dide aciziya wê nehêle, bi bersivên van pirsan her tiştê di dilê wê de dikeve holê, di dawiyê de çûçik wê razî dike û acizî li cem namîne.

Çîrokek din bi navê Zarokê Bilolvan hatiye, di vê çîrokê de jî hin pirs hatine kirin:

Ev cihê kîşk e?

Ew çi tiştên man li were?

Ji bo çi van Golan pê ne xweş e?

Çi bikin da Erdewan neçe wî cihî? "(Kovara Sivore, 28, 2000: 15).

Ev pirs jî di bara wan bûyerên di çîrokê de hatine kirin, zêdetir pirs ji zarokên bilûrvan kirine, ew diçe hin cihên tehlûke di nava daristanê de, ji bo Gulan li bilûrê dixwe, kesê ku çîrok nivîsandî dixwaze bi rengê zarokî razî bike heta ku neçe cihên tehlûkedar, piştî her ji karê xwe hez bike, berdewam ji bo Gulan li bilûrê bixe.

Di çîrokek bi navê Peşêmanî de, ev pirs têde hatine:

"Ma tu nayê pirtûkxanê?

Dê çi li pirtûkxanê bikim?

Te divê serbikevî?

Peşêmanî? "(Kovara Sivore, 30, 2000: 16).

Ev pirs jî girêdayî xwendekarekî zarok e, ew ji dibistanê hez nake, hevalê wî dixwaze wî poşman bike, heta ku dibistanê berdewam bike, lê ew razî nabe, li dawiyê ew li dibistanê sernakeve, poşman dibe.

Wekî me got di hemû hejmaran de ev hevokên pirsîkirinê hatine. Emê ji aliyê avasazî ve bi dirêjahî li serê bisekinin.

Pêncem: Goşa pirsyan berîkane (pêşbazî)

Ev rengê pirsan cureyeke sereke ye di piraniya hejmarên kovarê de cih girtiye, awayê bikaranîna vê rengê hevokê, di piraniya hejmarên kovara Sivore de bi rengê berîkane (pêşbazî), pirsêkê yan zêdetir dikin, zarok li malên xwe bersiva wan pirsan didin, piştî piştî dikêşin, navek yan du dibin kesên serketî ji bo bersiva her pirsêkê jî xelatên cuda pêşkêşî zarokan dikin. Di her hejmarekê de jî hem bersiva pirsên hejmara pêşîn didin, hem jî pirsyan nû dikin. Armanç ji van pirsan ev e ku zarok bi rengê berdewam lêgerîna bike, her wisa her tim tiştên nû hîn bibe, ji ber ku em dizanin zarok ji xelatan hez dikin, dema tu pirsêkê jê bikî xelat li pey hebin, bi heyecan û hezkirî dê li bersiva wê pirsê bigere. Ev cure pirs, em dikarin bibêjin ew ji pirsên serketî ne, her wisa rêyeke ji bo eleqedarbûna zarokan bi kovarê re. Ev hinek mînakên kêma in ji pirsên pêşbazî yên kovara Sivore.

Pirsyan bi vî rengî

"Barageyê neteweyên hevgirtî li ku ye? (Berlîn, London, Newyork).

Navê sê serkirdeyên kurd bêje ku bi şoreşên kurdî rabûbin? "(Kovara Sivore, 139, 2011: 30).

Pirsiyarên vê hejmarê:

Kengî serhildanên van bajêran destpê kirine? (Duhok, Hewlêr, Suleymanî, Kerkûk).

Ev kereste ji kîjan pîveran têne pîvan? (Ar, av, zilzal).

Bersiva pisiyarên hejmara bûrî

Besiva yekê: Sala 1998an bereyê kurdistanî hate danîn.

Bersiva duyem: Haydirocîn siviktirîn gaz e.

Piştî gelek zarokan bersiva pirsîyarên me dayîn, bersivên durust hatin hîlbijartin, piştî pişkê, xelat ji bo van zarokan derket:

Kovan Îslam Mûhemmed

Karwan Eyad Şeiban

Lawîn Dilşad Mustafa. "(Kovara Sivore, 139, 2011: 30).

Ev awayê bikaranîna hevokên pirsîn yên ku beşa pêşbazîyê de derbas bûne, hinek mînakên din.

Ev hinek mînakên din in:

Navê sê sikrên Herêma Kurdistanê bêje, serê pita wan bi pita 'd' dest pê bike?

Navê sê kovarên zarokan bêje li parêzgeha Duhokê? "(Kovara Sivore, 66, 2004: 19).

Mamosta Salih Yusiv di sala çendê de şehîd bûye?

(Kovara Sivore, 72, 2005: 19).

Em zêde li ser vî cureyê pirsan nasekinin, ji ber ku bi sedan hevokên bi vî rengî di kovara Sivore de cih digrin. Ev mînak têrê dike ku em hinekê çawaniya bikaranîna wan hevokan bizanin. Her wisa pirsên hatin weşandin pirsên gelemperî ne, hemû aliyan li xwe digre, (pijîjkî, psîkolojî, dîrokî, edebî, gelêrî, erdnîgarî,

tendurustî...) Mebest ji van pirsan ji bo rewşenbîrkirina zarokan e di hemû aliyên jiyanê de, ji ber ku li pişt her hevoka pirsê, zanyariyek heye, dibe ku ew zanyarî nû û balkêş be, ev awayê bikaranîna hevokên pirsê, em dikarin wan bi rengê baş binirxînin. Hem kovar bi van pirsan dewlemend dibe, hem jî zarok di cîhana xwe ya zaroktiyê de dewlemend dibe, mîna mebesta kovar pey hatî weşandin, dema zarok mezin dibin ew ji bo wan dibe bîranîneke xweş.

2.4.1.1.3. Hevokên Xwestek û Daxwaziyê

Ev hevok wateyên daxwaz û xwestekê dide, ji xwe ji navê wê xuya ye "Xwestek, daxaz, şert, divêtî, û fermanî didin." (Baran, 2012: 205). Wateya wê bi kurtasî ev e: "Kesê yekê wate axaftvan xwestekê ji kesê duduyan ku guhdar e dike, ji bo encamdan yan encamnedana kirdeyekê." (Nerîman Xoşnaw, 2014: 37).

Di nava kovara Sivore de hevokên xwestekî û daxwazî bi du wateyan hatine bikaranîn. Du armanc ji xwestekê hene. Awayê yekemîn di piraniya hejmarên kovara Sivore de goşeyek hatiye destnîşankirin bi navê Reng Bike ev rengê xwestekê armanc jê ev e, emrekî li zarokan bike bi rengkirina wêneyeke bêreng, li ser rûpelek ji rûpelên kovarê parve kiriye, li hember wê jî heman wêneyê bi reng parve kiriye. Xwestek ev e, ew wêneyê bêreng wekî wêneyên bireng were bireng-kirin.

Kovara Sivore dixwaze dema zarokan vala neçe, bi rengkirina wêneyan zarok fikr bike, her wisa zarok bi vê rêyê hînî wêneyê-kêşanê jî bibin, hem jî rengan nas bikin. Ev yek jî mîna lîstikê ye ji bo mejiyê zarokan, aktîva mejî li cem zarokî xurt dibe, ji ber ku reng girêdayî dîtina çavan e. Çav yekser wan rengan ji bo mejî vediguheze, ev yek wisa dike ku di temenekî zû de zarok rengan nas bike û dibe bingeha rewşenbîrî jî ji bo zarokan.

Ev rengê xwestekê li xweşiya zarokan diçe, ew ji vî rengê xwestekê hez dikin, hema bêje xwestek li gorî wan tê, ne wekî xwestekên dijwar. Wate hevokên ji bo xwestekan tên bikaranîn di nava weşanên kovara Sivore de xwestekên hezkirî ne li cem zarokan. Mînak: Rûpela ji rûpelên kovarê wêneya bizineke xweşik bilûrek di destên wê de ye û ew lê dixê, hatiye weşandin. Ji zarokên ku kovar ketiye ber destên wan xwestiye, wê wêneyê bi reng bikin. Zarok ji giyaneweran hez dikin, bi taybetî jî giyanewerên malî, bi rengkirina wêneyê hezkirinek cuda ji bo wî giyanewerî li cem zarokan çêdibe. "(Kovara Sivore, 23, 2001: 18).

Di hejmara 71an de wêneya çûçikekî di rûpela 20an de parve kiriye. Xwestek jî dîsan li ser wêneyeke bêreng bireng-kirin e. Ji bilî giyaneweran hin lîstik parve kirine, ew lîstik bi zarokan taybet in. Mînak wêneyek di hejmara 74an û rûpela 20an de parve kiriye, ku wêneya balonekê (pimpimokekê) ye, dîsa xwestek bi rengkirina wêneyekî bêreng e.

Aliyê rewşenbîrî jî di vê mijarê de cih girtiye, yek ji amûrên rewşenbîrî bi rêya wê bipêşde diçe pirtûkê, di hejmarek din de wêneya pirtûkekê parve kiriye, wekî amajeyek ji bo xwandinê, daxwaza rengkirina wê hatiye kirin. Ev yek ji bo vê armancê realîstî ye. "(Kovara Sivore, 91, 2007: 11).

Rengekî din yê ku hevokên xwestekê di nava nivîsan de bikar hatiye, em zêde li ser wan hevokan nasekinin, bi nêrîna me Reng Bike zêdetirîn bandor li ser zarokan kiriye, bêhtir zarokan îstîfade jê wergirtiye, ji ber ku zarokan ji vê xwestekê hez kiriye û pê re eleqedar bûne. Bi nêrîna min ev yek têrê dike, em aşna bibin ji awayê bikaranîna hevokên xwestekî di nava kovara Sivore de, em dikarin di lêkolîneke berfireh de îstîfadê ji hevokên din wergirin, ji bo lêkoleneke bi vî awayî sînorkirî, mînakên serî têrê dike.

2.4.1.1.4. Hevokên Baneşanî

Dibêjin wan hevokan ku axaftvan hestê xwe ji bo yê hember xwe derdibire. "Hevokên baneşanî wateya keyfxweşî, kelecane, heyîrîn, xemgînî û ecibandîne didin." (Baran, 2012: 205). Ev rengê hevokan bi awayek fireh di nav hejmarên kovara Sivore de nayên dîtin, ji cureyên din yê hevokan kêmtir hene. Bi nêrîna min ji ber ku di nivîsê de tenê nîşaneyên baneşanî ev e (!) wateya baneşanî diyar dike, dibe zarok fêhm nekin ev nîşan ji bo baneşanî yan ecibandin, keyfxweşî û kelecane ye. Heta ku dibe ev têgehiştin ji bo zarokan zehmet be jî. Ji ber vê yekê nivîskarên kovara Sivore xwestine fikr û ramanên xwe bi rengê hêsan bigehînin zarokan û nexwestine ew fikr û raman bi alozî û zehmet bigihin. Li cihê zarok ji nîşanê bizane ev hevok baneşanî ye. Yekser hest û raman diyarkirî ne. Mînak 'jê hez dikim, min eciband, xemgîn im, keyfxweş im...' wate bi awayek rasterast ew fikr û raman anîne zimên.

Hevokên baneşanî di nava nivîsên kovara Sivore de zêdetir di çîrokan de tên dîtin, ji ber ku hest û raman herî zêde di çîrokan de hene, ne wekî hevokên ragihandinê. Em dikarin bibêjin di hemû nivîsan de tê dîtin ku hevokên pirsê ji bo

armanca zanîna zanyariyekê tîn bikaranîn. Ji ber vê yekê hevokên baneşanî zêde di çîrokan de tîn dîtin. Bikaranîna vî cureyê hevokê kêr jî be lê bi awayek balkêş û hezkerî hatiye bikaranîn. Zêde jî bo derbirînê ji xweşî û xemgîniyê bikar hatiye. Ev jî hin mînakên hevokên baneşanî ne, ku di çîrokên kovara Sivore de hatine weşandin.

Di çîroka bi navê ‘seredanên derengî şev’ de ev hevokên baneşanî hatine:

"Ax min ji bîr kir!

Ya Xwedê ev çi benoşt in!

Wey Xwedê ji van mêvanên derengî şev!

Ez ku ve birevin! "(Kovara Sivore, 91, 2007: 16-17).

Ji bilî nîşaneyê baneşanîyê (!) eger mirov çîrokê bixwîne, bi rêya van hevokan dizane baneşan di ku de heye, ev hevok wateya dilerihetî û xemgîniyê didin. Mijara çîrokê li ser wan mêhvanan e ku bi şevê dereng seredanan dikin, navnîşan bi xwe baneşanî ye ‘mêvanên derengî şev!’ Xemgîniya wê malbata ku mêhvan ji bo wan çûne bi rêya hevokên baneşanî didin nîşan.

Çîrokeke din bi navê ‘cotyarê şareza’ hatiye weşandin. Ev hevokên baneşanê tîde hatine:

"Paşa mendehoş bû!

Kêfa wî bi cotyarî hat!

Ez dê şem! "(Kovara Sivore, 75, 2005: 6).

Ev hevok jî bi wateya ecibandîne hatine bikaranîn, mijara çîrokê ev e; cotkarekî pîspor li gundekî heye, ji ber karên xerîb ên vî cotkarî, şahê wî welatî bi karên cotkarî ecêbmayî dimîne, karên wî dicibîne.

Çîrokek di yek ji rûpelên kovarê de hatiye weşandin. Navê çîrokê ‘çîçik û hêlîn’ ev hevokên baneşanî di vê çîrokê de hene:

" Ez çi xwelî li serê xwe bikim û ku de birevim!

Di hizran de nebû!

Bawer nekir!

Hewar sed hewar!

Têjikên wê yek yek qût din! "(Kovara Sivore, 98, 2007: 11).

Ev hevok ji bo mebesta poşmanî diyarkirina xemgîniyê bikar hatine. Mijara çîrokê çûçikekê hêlîna xwe li ser darekê çêkiriye, marek diçe çûçikên wê yên biçûk dixwe, bi rêya van hevokan xemgîniya dêya wan dide nîşan. Di heman hejmarê de çîrokek li ser navê 'sizayek tund' hatiye weşandin. Ev hevokên baneşanî têde hatine:

Tiştek mezin li dunyayê çêbûye!

Rast!

Ez çend dilxweş im!

Min parçeyek ji şîrînahiyê xwar! "(Kovara Sivore, 98, 2007: 17).

Nivîskarê vê çîrokê dixwaze, bi rêya van hevokên baneşanî; keyfxweşiya dêya keçekê bide nîşandan ku keça wê gotinên rast dibêje dêya xwe, derewan digel nake. Ev hevok nîşan dide ku bi rastbêjiya keça xwe keyfxweş e.

Bi vî awayî hevokên baneşanî di nivîsên kovara Sivore de hatine, ji bilî çîrokan min di nivîsên din de jî pir lêgeriyar kir, lê min hevokên baneşanî nedît.

2.4.1.2. Ji Aliyê Avasaziyê ve

Hevok ji aliyê avasaziyê ve dibe du cur:

Ji bo şîroveyê em zêde li ser van herdu cureyan nasekinin, ji ber ku armanc ji vê tezê ev e, em aliyê zimanî yê kovara Sivore şîrove bikin. Her wisa ew hevokên hatine bikaranîn mebestên wan ragihandin, pirs, xwestek û daxwazî û baneşanî ne. Tenê ji aliyê avasazî ve guhertin bi ser wan de hatine. Tenê şêklê hevokê guhertin di ser de hatiye, ya ku ji bo me giring naverok e, di mijara hevok ji aliyê naverokê ve'' em li serê sekinîn. Ji ber vê yekê ji bo her cureyekê tenê em ê hin mînakên wergirin.

2.4.1.2.1. Hevokên Xwerû

Hevok ji aliyê avasaziyê ve ji hev cuda dibin, di rêzmana Kurdî de, hevokên xwerû yek ji cureyên hevokan e ku ji aliyê avasazî ve, hest û ramaneke tenê vedibêjin. "Hinek hevok hene, digel hêmaneke bingeşîn, çend hêmanên alîkar di nav xwe de dihevin. Hinek hevok jî wekî çend hêmanên serbixwe li pey hev rêz dibin."(Tan, 2011: 343). Her di vê barê de, nivîskar Baran di pirtûka Rêzimana

Kurmancî de, dibêje: "Ev hevok ji darezekê pêktên, hevokên alîkar nahewînin. Pêvber an jî lêker an jî ji navdêrekê pêktên. "(Baran, 2012: 209). Nivîskar Ocek jî, her nêzî van fikr û ramanan dibêje: "Hevokên ku hest û ramanek tenê rave dikin û ji lêkerekê tenê tene saz kirin hevokên xwerû ne. "(Öcek, 2014: 270).

1. "Jarê mêrêyeka ne gudar bû.
2. Xwe gîro neke.
3. Dergehî bû veke.
4. We ew dar xirab kir. "(Kovara Sivore, 79, 2006: 5-13).

Di van hevokan de, tenê yek lêker heye, di hemûyan de hest û ramanek parve kiriye. Mînakên vî rengî, bi awayek fireh, di nivîsên Kovara Sivore de tên dîtin. Eger em bala xwe bidin hevokên 1- 4, ji aliyê naverokê ve, hevoka ragihandinî ye, ji ber agahî di bara mijarekê de dane. Lê hevokên 2- 3, hevokên fermanî ne, di bara encamdan yan encam nedana karekî de, ferman kirine.

5. "Sibehê dê te bibim mezintirîn firoşgeh.
6. Reftarên te gelek seyr in!
7. Ez dest ji wî bernadim.
8. Paşeroj ji bo zarokan e. "(Kovara Sivore, 1, 1998: 5).

Dîsan ev hevok jî yên xwerû ne, tenê hevoka hejmar şeş nebe, ku hevoka baneşanî ye, yên din hemû ragihandinî ne. Di hemû van hevokan de tenê lêkerek heye.

9. "Çi nîn e kurê min.
10. Birîna te sivik e.
11. Niha jî dema pirtûkxanê hat.
12. Roj û xwişka xwe ji pirtûkxanê hatin.
13. Rojî bi lez qesta jora xwe kir.
14. Dêrîn pirteka nanî bîne.
15. "Sivorê min gelek birçî ye.
16. ji bo te çareser bikim?
17. Daxwaza çayekê jê bike.
18. Tu rast dibêjî!
19. Min arîşa te çareser kir.
20. Tê bi silametî biçî.

Di van hevokan de jî tenê lêkerê heye, ji aliyê naverokê de, ji hevokên ragihandinî û pirs, xwastek û daxwazî, baneşanî pêktên. Lê ji aliyê avasazîyê ve hevokên xwerû ne. Tenê ji yek-lêkerê pêktên.

21. Li cihê xwe neliviyabû. "(Kovara Sivore, 85, 2006: 4-5).
22. "Te ev gelek mana xwe dirêj kir. Te behra min jî ji bo xwe
23. Werzê havînê gelek dirêj bû. "(Kovara Sivore, 86, 2006: 6-7).
24. "Em gelek kêr dibînin.
25. Min hizreka baş heye.
26. Em pêşniyaza te pesend dîkin.
27. Zarokî serê xwe rakir.
28. Zarokî xwe kire di koşa xwesa.
29. Şerm kir. "(Kovara Sivore, 87, 2006: 4-6).

Hevokên xwerû di hejmarên kovara Sivore de, cihekî fireh girtine, em dikarin bibêjin piraniya hevokên tîn bikaranîn, hevokên xwerû ne. Ji ber ku ev cureyê hevokê, bi awayekê hêsan tê fêhmkirin, ji xwe armanc ji nivîsên zarokan, hêsanî û xweşîkî ye.

2.4.1.2.2. Hevokên Hevedudanî

Ew hevok in ku zêdetir ji yekê lêkarên wan hene, "Ev hevok bi alîkarîya bêhnok û gihanekan bi hev ve tîne girêdan. "(Öcek, 2014: 270). Dema ku mirov nikare hest û ramanên xwe bi hevokerê tenê derbibe, "mîrov dixwaze hest û ramanên xwe bi çend hevokan vebêje. "(Tan, 2015: 344).

Hin hevok hene ku çend hevokan di nava xwe de dihevin.. Di hevokên wiha de hêmaneke bingeîn û yeke-alîkar heye.. Hêmanên alîkar her şî qas bi xwe hevokerê be jî, ji aliyê wateyê ve bi tena serê xwe kêr dimîne. Ji ber ku ew ji aliyê wateyê girêdayî hêmana bingeîn e. "(Tan, 2015: 344). Hinek gihanekên ku ji bo pêkanîna van hevokan tîne bikaranîn ev in: *lê, lê belê, hem, hem jî, ne, yan, an, dibe ku, belkî, her wekî, ku, dema ku, berî ku, dive, bila, heke,...*

1. "Ev fiqê ye ji Çînê dihat niha ya li hemû cihanê ye.
2. Gelek curên kakîyan hene niha çar cur jê tîne çandin.

Ev du hevokên hevedudanî ne, ji du hevokan pêktê, gihaneka *niha* ya dem, herdu hevok bi hev re girêdane

3. Ew bi lez çûne kogeha malê ve, setla xîzî û qalbmerk digel xwe anîn.
4. Kor çû dev Elînayê, got.
5. Wî merka xwe ji xîzê kolayî pir kir û kefte ser çokên xwe.
6. Dayka wî ji cihê xwe rabû û hate nik wan.
7. Wê baloka xwarinê da kiça xwe û zivirî cihê xwe. "(Kovara Sivore, 222, 2018: 4-6).

Di her hevokekê de, lêkerek hatiye, wate ji du hevokan pêktên, her hevokek xwedî wateya xwe ya serbixwe ye. Lê bi rêya *bêhnok* û *gihaneka û*, bûne yek-hevok, hevoka hevedudanî pêktîne.

8. Ji ser pişta hespê ket û pê wî şikest.
 9. Zelamekê danemir li serê girekê dijiya û hespek hebû.
 10. Deng û basê şerî belav bû, lewma gencên gundî hemî bûne leşker.
- "(Kovara Sivore, 223, 2018: 5).

11. Eger zarokatî ciwan neba, Xwedê nedikire dergehê pêşwaziya jiyanê.
12. Ji ber ku fîl kore bû, yekser di rizdê de firî û mir. "(Kovara Sivore, 163, 2013: 6-13).

Hejmara 151an

13. Eger tu bawer nekî, here tu bi xwe bibîne.
14. Dema gur dimirit, devê wî dimîne vekirî.
15. Te ew ji bîr kiribû lê belê min ji bo te hilgirt. "(Kovara Sivore, 151, 2012: 7).

Di van hevokan de jî, gihanek bûne sedema pêkanîna hevokên hevedudanî, eger em bala xwe bixin ser van hevokan, eger em gihanekê di hevokê de jê bibin, ji aliyê naverokê de dibe hevokek, rêzimanî ava bibe, lê ji aliyê wateyê ve dê bibe hevokeke bi kêmasî. Wate di van hevokan de gihanekên, *eger*, *dema*, *ji ber ku*, *lewma*, *lê belê*, bûne arîkar ji bo pêkanîna hevokên hevedudanî.

2.4.2. Ji Aliyê Piraktîkê ve

Têgeha zimanvaniya praktîk li dawiya salên çilî serhildaye, lê wekî zarav "Yekemîn car di sala 1946an de li zanîngehên Amerîkayê hatiye bikaranîn." (Ebdulwehab Muhemmed Xalid, 2010: 49). Ev yek jî dizîvire ji bo zanayê xwediyê (tewrîka berhemanî û veguhastinê) Noam Chomsky.

Bi giştî zimanvaniya praktîk aloz û tevlîhev e, "Hinek dibêjin beşek e ji zimanvaniya giştî, hinek zana jî dibêjin zanistekî temam serbixwe ye, giringiyê dide her mijareke eleqedar bi çareserkirina pisgirêkên zimanî." (Ebdul Wehab Muhammed Xalid, 2010: 49). Wate ev zanist xwedî tewrîke taybet e, sînora xwe ya destnîşankirî heye.

Eger em bi kurtasî pênaseya zimanvaniya praktîk bikin em dikarin bibêjin: "Zanistêke alîkar e ligel zanistên din yên mirovayetî mîna zanistên psîkolojî, civaknasî, perwerde û her zanistekê din." (Ebdul Wehab Muhammed Xalid, 2010: 51). Wate zimanvaniya praktîk di gişt zanistan de xwe dibîne mîna arîkar û hêsanker ji bo zanistên giştî. Ev yek jî dibe sedem em nikarin di lêkolîneke wiha de tev zanistan di kovara Sivore de hilbidin û şîroveyan wan bikin, dîsa jî ji me nayê xwestin ku em vê yekê bikin. Xalek di zimanvaniya praktîkî de gelekî pêşçav e ew jî zaliyê (hînkirina zimanî). "Çi ji bo xelkê wî welatî bi xwe be, wate zimanê dayîkê, yan ji bo hînkirina zimanek biyanî." (Ebdul Wehab Muhammed Xalid, 2010: 52). Xala herî pêşçav di kovara Sivore de hînbûna zimanî ye, bi rastî bi awayek fireh û bi regekî zanebûnê vê xalê di kovarê de cih girtiye, gelek bi rohnî û zanebûnê tê dîtin. Mirov dikare tenê ji wan gotinên di kovara Sivore de hatin weşandin ferhengeke têr û tije berhev bike, bi taybetî jî ferhenga (Zimanî Kurdî-Zimanî Ingilîzî). Di kovarê de hînkirina zimanan bi du awayan tê dîtin.

2.4.2.1. Hînkirina Rênivîsa Latînî

Hînkirina rênivîsa Latînî mîna mijareke giring di weşanên kovara Sivore de tê dîtin, ji bilî sê hejmarên destpêkê wekî din di hemû hejmaran de mijar bi rênivîsa Latînî tên dîtin, di demekê de rênivîsa fermî li Herêma Kurdistanê rênivîsa aramî ye, bi tîpên erebî kovar hatiye nivîsandin, peyama Kovarê jî ji bo zarokên Herêma Kurdistanê araste kiriye.. Mijareke bi vî rengî ji bo me jî giring e em şîroveyan bidinê. Bi du rengan mijarên rênivîsa Latînî di kovara Sivore de tên dîtin, em ê bi hûrî li ser vê mijarê bisekinin û mînakên ji weşanên kovarê hildin. Tê zanîn ku çend zaravayên cuda li Herêma Kurdistanê hene (Kurmancî, Soranî, Hewramî, Lorî...) xuya ye ku rênivîsa Latînî li Herêma Kurdistanê di hemû zaran de nayê bikaranîn, heta em dikarin bibêjin beşeka xelkê ji rênivîsa Latînî baş fêhm nakin, ev di demekê de ye ku kurdên li Turkiyê ji rênivîsa aramî fêhm nakin, ne xwendinê, ne jî nivîsandinê.. Ji ber vê yekê kovara Sivore di hejmarên weşanên xwe de rûpelek yan

du rûpel ji bo hînkirina tîpên Latînî destnîşan kiriye, di hemû hejmaran de jî çîrokek yan helbestek bi rênivîsa Latînî weşandiye, ji bo ku zarokên kovarê dixwînin hînî rastnivîsa durust ya Latînî bibin. Me got du rêyên mijarên hînkirina tîpên Latînî di kovara Sivore de tên dîtin.

2.4.2.2. Hînkirina Alfabeya Latînî.

Di vê mijarê de awayê bikaranînê, bi rengê hêsan kar li serê kiriye. Ji bo zarok zû hînî tîpên Latînî bibe. Di serî de tîpên Latînî nivîsandine, li hember jî rengê tîpê bi rênivîsa Aramî jî nîşan daye, ev jî wekî teknîk ji bo bi hêsanî hînbûnê ye. Rêzkirina tîpan bi rengê akademîk kar li ser kirine, hem hêsanî têde hene, hem jî xweşikî; hêsanî ji bo aşnabûna zarokan bi tîpên Latînî ye, xweşikî ji bo bi zarokan dan hezkirina vê mijarê ye.

Hejmara 3an û şûn de kovarê dest bi weşanên xwe yê Latînî kir, ji bo her tîpekê gotinek mînak hatiye, di nava gotinê de ew tîpa mebest pê hatiye rengkirin, mînaka tîpan jî li destpêk û navîn û dawiya gotinê hatine, bi vî rengî hînkirina tîpên Latînî bikar hatiye:

ALBEYA KURDÎ	ئابەیا کوردی
(A) MEZIN	(ئا) مەزن
(a) biçûk	(ئا) بچووک
AV	av
ئاڤ	(Kovara Sivore, 3, 1998: 10). ئاڤ

Mînakek din:

ABEYA KURDÎ	ئابەیا کوردی
B	بە
BAV	باف
KAB	گاب
GABAR	گابار
	(Kovara Sivore, 4, 1998: 10). گابار

Bi vî rengî hînkirina tîpên Latînî di nava kovara Sivore de berdewam dike:

ABEYA KURDÎ			ئابەیا کوردی		
A, a	B, b	C, c	Ç, ç	D, d	E, e
ئا	بە	جە	چە	دە	ئە
Ez	ew	yek	dev	xame	name
ئەز	ئەو	یەک	دەف	خامە	"نامە

(Kovara Sivore, 6, 1998: 10).

Di hejmarek din de, ev mînak dane:

ABEYA KURDÎ ئابەیا کوردی

H h هه

HESP BIHAR TAQÎGE

ههسپ بهار "تاقیگه" (Kovara Sivore, 12, 1999: 10).

L, l له

LÊV KULAV DIL

lêv kulav dil

لێف کولاف "دل" (Kovara Sivore, 17, 1999: 10).

Mînakek din:

ABEYA KURDÎ ئابەیا کوردی

P, p په

PALE KEPIR HESP

Pale kepir hesp

پاله کهپر "ههسپ" (Kovara Sivore, 20, 1999: 10).

ABEYA KURDÎ ئابەیا کوردی

W, w وه

WERDEK NEWROZ KEW

werdek newroz kew

وهردهک نه‌روژ کهو" (Kovara Sivore, 30, 2000: 10).

Bi vî awayî ji hejmara 3an heta bi hejmara 33an beşek ji rûpelên kovara Sivore ji bo hînkirina rênivîsa Latînî hatiye destnîşankirin, mîna bingeheke hînbûnê, wate dibe 30 hejmarên li pey hev, dawî mijara tîpan di hejmara 33an de weşandine, bi vî rengî hatiye:

Z, z زه

ZIRNA HIZAR MOZ

زرنه هزار موز

HEVOK: Dikandarî hezar zirna firotin.

دکانداری هزار زرنه فروتن.

Mûz fêkiyeke xweş e

"مۆز فێکیهکی خوشه" (Kovara Sivore, 33, 2000: 14).

Çi tîpa (Z) di wan gotin û hevokê de hatiye, bi rengê sor hatiye rengkirin, mînakên din jî bi vî rengî hatine rengkirin, ev jî teknîkeke baş e ji bo zarok hem wê tîpê nas bikin, hem jî jiber bikin. Bi rastî jî bi nêrîna min kovara Sivore bingehê baş di aliyê hînbûna rênivîsa Latînî de ji bo zarokên kovar-xwendî daniye. Her wisa ev bû sedemek kovarên din yê zarokan piştî wê hatin weşandin, di vê mijarê de rêya kovara Sivore bigrin, mirov dikare bibêje di niha de li Herêma Kurdistanê ew kovara mijaran bi tîpên Latînî neweşîne, ji aliyê naverokê ve kêmasiyên wê kovarê hene. Wate kovara Sivore di vî alî de sedema vebûna derî ye..

Yek ji sedemên serketina kovara Sivore aliyê dewlemendbûna wê di aliyê zimanî de ye.. Eger em lêkolîneke zimanî bikin li Herêma Kurdistanê bi giştî, li Duhokê bi taybetî, dibe bi sedema kovara Sivore gelek zarok hînî tîpên Latînî bûne, ji ber ku yekem kovara taybet e ji bo zarokan li Duhokê derketibe. Xebatên mînaka Sivore ne di asta pêwîst de bûn, bi saya kovara Sivore niha zarokên Duhokê xwedî kovareke xwe ya taybet in..

2.4.2.3. Weşandina Çîrok û Helbestan Bi Tîpên Latînî

Piştî hejmara 33an di kovara Sivore de ji bo her hejmarekê rûpelek yan du destnîşan kirine. Ji bo weşandina çîrok û helbestan bi rênivîsa Latînî, di serî de me got bingeha hînbûna tîpan damezrand, piştî mîna astên dibistanê ber bi qûnaxên baştir ve çû, mîna bibêje bi danîna wê bingehê û bi saya xebata me, êdî zarok dikarin nivîsên mîna çîrok û helbestan bixwînin. Me qûnaxa destpêkê derbas kir, em niha di qûnaxa pêşdeçûnê de ne, bi vê semtê kovarê dest bi weşana çîrok û helbestan kir.

Rabîn û çûn bê muhlet

Ber bi xerîb û xurbet

Rê dûr bûn û rêgir zor

Şepilandin dor bi dor

Man bî hogir û heval

Ji me dûrketin sal bi sal

Me her got, wan vegêra

Hejar bûn û xem pêra " (Kovara Sivore, 163, 2013: 28).

Ev helbest ji bo zarokên Duhokê helbesteke hêsan û xweşik e, gotinên wê ji zarok dikarin bi hêsanî têbigihin, mijara wê li ser xerîbiya welat e, peyam ji vê helbestê ev e, wateya xerîbî û dûrbûna ji welat bigihîne. Her wisa hestên dûrî welat bîne ziman. Helbest bi tîpên Latîni hatiye weşandin.

Nivîskara kovarê Dêjîn Nûrî, helbestek bi navê Duhok di kovarê de weşandiye û dibêje:

Duhoka mina rengîn

Alayek têda zêrîn

Duhoka mina şîrîn

Bajêrekê pir dêrîn

Alayê te bilinde

Li ser çiyayê Gare û Metîn" (Kovara Sivore, 199, 2013: 28).

Helbest bi rênivîsa Latîni hatiye weşandin, pênaseke şîrî ji bo bajarê Duhokê kiriye, navê çiyayên derdora Duhokê di helbestê de hatine, armanc ji vê helbestê zarokên Duhokê hest bikin ku xwedîyê kovarekê ne, ku dikarin bi azadî navê bajêrê xwe hildin.

Helbesteka din bi navê 'Kurd im' hatiye weşandin:

Ez kurd im keça kurda me

Ez neviya mêr û merda me

Ez digirim li cîhanê

Ez keça kurdistanê htd... "(Kovara Sivore, 205, 2016: 28).

Ji bilî helbestan nivîsên din yê bi tîpên Latîni di kovarê de hemû yê çîrok in. Ji helbestan bêhtir giringî bi çîrokê hatiye dayîn. Her miletek xwedî çanda xwe ya taybet e, ew çand dibe xala cudabûna miletan û berhema rabûriya dûr û dirêja dîroka wê civakê, çand yan ferheng aliyekî jiyana mirovan e. Ji berebavekî ji bo berebavekî din tê veguhastin, ev yek jî bi rêya sazî û aliyên cuda tê veguhastin. Yek ji wan saziyên giring di serdema nû de saziyên ragihandinê ne, ji wan jî kovarên zarokan. Xuya ye ku çanda kurdî di çîrokan de xwe parastiye, aliyê gihandina vê çandê jî gereke di zaroktiyê de were pêşxistin. Ji ber vê yekê kovara Sivore gelek li ser vê mijarê xebîtiye. Mijarên zêdetirîn çîrok in, ji bo rênivîsa Latîni jî ev xebat bipêşde biriye, çîrok beşa sereke ye ji mijarê. Çîrokek bi navê 'kêvrîşk û mişk', bi tîpên Latîni weşandiye, ev beşeka vê çîrokê ye:

Carekê kêvrîşk gelek bêxîret bû, nedikarî çî karan ji bo xwe bike, her di mal de nivistî bû. Cîraneke wê hebû ew jî mişk bû, ew gelek bi kar û sirt bû, her demê deng ji mala wî dihat htd... "(Kovara Sivore, 205, 2016: 29).

Çîrokeke din bi navê 'dîkil û mirîşk' hatiye weşandin, du rûpel tije kiriye, beşeke wê çîrokê jî em tînin zimên:

Di wê şevê de dîk nenivist, biryar da zêrevaniya mirîşkan bike, piştî rovî sê caran şiyayî bê nav baxçeyî û çend çîçelok xwarin.

Rovî ecêbmayî ma dema cara çaran hatî nav baxçeyî de! Dîkî êrîşî wî kir, bi didanên xwe yên tûj derbek li çengê dîkî da, dîk kete erdê, xwîn ji çengê wî hat htd... "(Kovara Sivore, 115, 2009: 28-29).

Çîrokek din bi navê 'Şaxewan' derbas dibe, ev beşeka wê çîrokê ye:

Şaxewan hîlbaskî zinarê çiyayekî bibû, da bigihe kêliya çiyayî, ji bo şev dinya sir û seqem bû. Şaxewanî berdewamî da rêka xwe, ji nîşkê ve piyê wî zelha ji wî zinarî verist.

Ew gelek bêhêvî bû, mirina xwe li pêş çavên xwe dît, lê ew werîsê bi kêleka wî ve girêda û ew girt, bi zinarî ve ma hilawîstî htd... "(Kovara Sivore, 162, 2012: 29).

Mînakên çîrokan di kovarê de pir in. Em nikarin zêde li ser bisekinin, pêwîst e lêkolêneke taybet li ser mijarê were kirin, mebesta me tenê awayê bikaranîna tîpên Latînî bû, em hinek ji wan mijaran zelal bikin, ji ber ku di aliyê zimanî de ji bo hevparîkirinê di zimanî de kovara Sivore mînakeke baş e. Ji hemû aliyekê ve giringî bi zimanî daye, heta bi vê rêyê zimanê zarokên ku kovarê dixwînin, bipêşde biçe.

2.4.2.4. Fêrkirina Zimanê Îngilîzî

Mijareke dî ya giring di kovara Sivore de zimanê Îngilîzî ye, gelek bi hûrî li ser vê mijarê sekîniye, hînbûna zimanê Îngilîzî di hemû hejmarên kovarê de rûpelek yan du ji bo destnîşan kiriye, ji A B Cyê destpê kiriye, piştî wateyên peyvî. Em dikarin tenê ji wan gotinên di nava hejmarên kovara Sivore de derbas bûne, ferhengeke tije gotinên kurdî ji bo Îngilîzî hildin.

Di nava kovara Sivore de zimanê duyem Îngilîzî ye, ji bilî gotinan hin çîrok jî li vê dawiyê bi zimanê Îngilîzî parve kirine, asta zarokîtiyê berçav wergirtine, li gor temenê zarokîtiyê mijar parve kirine. Wate di hejmarên destpêkê de tenê tîp û hejmar û navên rengan bi Îngilîzî hildane, piştî mijar pir bûne derbasî ferhengê bûye,

navên; giyanewer, alavên dibistanê, bazar, fêkî, tiştên girêdayî jiyana rojane... ew bi Îngilîzî weşandine li hember her gotinekê wateya wê bi Kurdî nivîsandiye, ev mijar bi awayek fireh di kovara Sivore de tê dîtin.

Hînbûna zimanên biyanî di zimanvaniya praktîk de xaleke giring e. Kovarê zimanê Îngilîzî helbijartiye, dibe pirsek çêbibe çima zimanê Îngilîzî? Bersiva vê pirsê hêsan e, ji ber ku zimanê Îngilîzî cîhanî ye. Her wisa ew di cîhanê de ji zimanên pêşketî ye, ji aliyê ferhengê ve zimanekî dewlemend e. Nivîsên cîhanî zêde bi zimanê Îngilîzî tên nivîsandin. Di zanistên serdem de çavkanî zêdetirîn bi Îngilîzî tên dîtin, kovara Sivore dixwaze zarokên kurdan di pêşerojê de ji wan zanistan bê behr nebin, giringî bi zimanê Îngilîzî daye. Pêşdeçûna teknolojîyê jî ji bo hînkirina zimanê Îngilîzî sedemeke din a giring e.

Dema yekem hejmara kovarê hat weşandin, kurdên li Herêma Kurdistanê dijîn bandora zimanê Erebî zêde li ser wan hebû. Bi nêrîna min helbijartina zimanê Îngilîzî mijareke siyasî be jî, bi salan dijminkariya Kurd û Ereban li Iraqê heye, vê dawiyê bi rêya ragihandinê taybet kovarên zarokan, xwesteka Herêma Kurdistanê ev e ku ev bandora zimanê Erebî li ser nîfşê pêşerojê kêmbibe, ji ber vê yekê zimanê Îngilîzî wekî zimanê duyem yê kovara Sivore destnîşan kiriye. Herwisa li herêma Kurdistanê ji bilî kovarên zarokan, saziyên taybet yê zimanê Îngilîzî piştî serhildana sala 1991an vebûne. Her wisa dibistan û zanîngehên zimanê Îngilîzî cihekî fireh li Herêma Kurdistanê girtine, di niha de giringiyeke zêde bi zimanê Îngilîzî tê dayîn.

Kovara Sivore di hemû hejmarên xwe de rûpelek yan du rûpel ji bo zimanê Îngilîzî destnîşan kiriye. Bi nêrîna min du rûpel ne hindik in ji bo zarok aşnayî zimanê Îngilîzî bibin, ji ber ku ji aliyê naverokê ve têr û tije ne. Bi kêmasî -belku- bibe bingehek ji bo zarokan, da ku hînbûna zimanê Îngilîzî li ser ava bike. Ev hin mînak in ji mijarên zimanê Îngilîzî yê ku di kovara Sivore de hatine weşandin.

Di yek ji hejmarên kovarê de, rûpelek ji bo zimanê Îngilîzî bi vî awayî destnîşan kiriye:

A ئا

AIRPLANE فڕۆکە firoke

JAM مورەبا moreba

KOALA کوالا kowala "(Kovara Sivore, 14, 1999: 11).

Bi van gorinan destpê kiriye, di serî de tîp paşî mînak paştir jî sê gotinên Îngilîzî û wateya wan bi kurdî. Di rûpeleka din de, bi heman awayî lê pêtek din û hin mînakên din:

Hînbûna tîpa (E)	ئى (Î)
EAGLE	ئەلھو elho (simsiyark)
BED	تەخت text
FIRE	ئاگر agir" (Kovara Sivore, 15, 1999: 11).

Hem ferheng û hem hînbûna tîpan, piraniya van mînakan jî ew tişt in ku rojane yan zarok bikar tînin, yan jî dikevin ber çavên wan. Ev mijar berdewam dike li ser tîpa (K)ê bi vî awayî:

(K), (k)	کەى key
King	پاشا şah
Blackboard	تەختەرش tebeşûr" (Kovara Sivore, 17, 1999: 11).

Mînakek din, bi vî rengî ye:

(P), (p)	پە (Pe)
Pig	بەراز Beraz
Sports	وەرزىش Werziş" (Kovara Sivore, 22, 2000: 11).

Bi vî awayî di 25 hejmaran de tîpên Îngilîzî parve kirine, ji bo her tîpekê çend mînak anîne. Hem rengê tîpê bi kurdî hem jî wateya wan gotinên Îngilîzî bi kurdî anîne zimên, hejmara 14an destpê kiriye heta hejmara 39an ji bo hînbûna tîpên Îngilîzî destnîşan kirine. Di hejmarên piştî wan de mijarên cuda cuda weşadine, mînak di hin tiştên di sinifên dibistanan de hene, bi Îngilîzî rêz kirine. Piştir wateya wan bi kurdî, di van mînakan de em ê tenê wateya wan mîna zimanê kovarê hildin, em ê bi rênivîsa Latînî tenê binivîsin:

Blackboard	textereş
Desk	mêz
Chalk	tebeşîr
Book	pirtûk
Pencil	pênûs" (Kovara Sivore, 68, 2004: 14).

Di hejmarek din de mijar cuda ye, rûpelek ji bo navên giyaneweran destnîşan kiriye:

a forest	daristan
a loin	şêr
a tiger	piling
a wolf	gur
a bear	hirç" (Kovara Sivore, 69, 2004: 14).

Di hin mînakên din de li ser amûrên xwarinê, hatiye weşandin:

A spoon	kevçî
A plate	sênîk
A fork	çetel
A cup	kop
A knife	kêr" (Kovara Sivore, 73, 2004: 14).

Bi sedan mînakên bi vî awayî di kovara Sivore de tên dîtin, dibe li vir pirsek çêbibe, bê gotin; gelo zarok ji aliyê rastnivîsê ve çawa dizanin bixwînin? Ji xwe bersiva vê pirsê eşkere ye, di hejmarên destpêkê de ji bo asta destpêkê mijar weşandine. Dixwazin zarokên kovara Sivore bixwînin di serî de hînî tûpên Îngilîzî bibin, hejmarên li pey wan zêde mijar ji bo wan zarokan bingeheke destpêkê di zimanê Îngilîzî de hene. Mebesta van mijaran ji bo hêzdarkirina wan e. Bi rengê din eger di aliyê zimanê Îngilîzî de zarokan bingehek hebe, mijarên ji vî rengî ji bo wan bibin arîkar, ewê ber bipêşde biçin û baştir hînî zimanî bibin.

Di Kovara Sivore de ji bo astên bilind jî mijar hatine nivîsandin, bi taybetî di hejmarên vê dawiyê de, çawa nivîs bi kurdî tên weşandin, bi heman awayî yên Îngilîzî jî tên weşandin, ji bo zarokên ku asta zimanê Îngilîzî li cem wan bilind e, di van mijaran de di demekê de şehreza bibin. Dibistanên taybet bi zimanê Îngilîzî di vê dawiyê de di pêşdeçûnek baş de ne. Hejmareke ne-kêm zarokên Herêma Kurdistanê di wan dibistanan de xwendekar in, heta digihine astên zanîngehan û xwendinên bilind. Em wan mijaran di vê lêkolînê de behs nakin. Ji ber ku peywendiya wan bi hînbûna zimanî ve nîn e. Belku ji bo hinek zarokan bibe palder, berê xwe bidin hînbûna zimanê Îngilîzî, lêbelê çî rêyên hînkirinê di wan nivîsan de nîn in.

Bi giştî ji aliyê zimanvaniya pratîk ve, ziman û hînbûna zimanî roleke sereke di weşanên Kovara Sivore de dilîzin, berê sedan zarokan daye baş-zanîna zimanê Kurdî û zimanê Îngilîzî, zimanê sereke di nava kovarê de kurdî ye. Di kurdî de rastnivîsa Aramî sereke ye û rastnivîsa duyem jî rastnivîsa Latînî ye. Mirov dikare

bibêje di pêşerojê de mînakên wekî Kovara Sivore bibe pirek ji bo Kurdên Herêma Kurdistanê û Kurdên li welatên derdorê (Tirkî, Sûrî, û Îranê). Ji ber erdnîgariya wan, her kurdek li welatekî bi rênivîseke cuda dinivîse. Dibe Kovara Sivore mînakek be ji mînakên ji hev nêzîkbûna kurdan. Zimanê duyem ya kovarê zimanê Îngilîzî ye, dibe ev jî bibe rêyek ji bo zarokên Herêma Kurdistanê hînî Îngilîziyeke baş bibin, di pêşerojê de bi rêya zimanê Îngilîzî bi rengekî baş aşnayê zanistên nû yên serdem bibin.



ENCAM

Di serdema nûjen de zimanê rojnamegerîyê bi gelemperî, ew qûnax derbas kiriye, bi tenê girêdayî hin yasayan e. Ev ziman wekî pîşeyeke pêşketî ketiye qada rojnamegerîyê, xwedî çand û taybetmendî ye. Ji bo rojnamegerîya zarokan piraniya caran giringî bi yasayên rêzmanî tên dayîn. Di Kovara Sivore de şaşiyên rêzmanî û çapkirinê bi rengê berçav tên dîtin.

Sivore di demeke wisa de derket, ku tenê derketina vê kovarê ji bo xebatên di bara zarokan de wek diyariyeke mezin ji bo zarokên kurdan tê hesabandin. Lewra di wê demê de, rewşa çapemenî û nivîsandina li Herêma Kurdistanê ji bo zarokan, zêde baş nebû. Ji aliyê din jî em dikarin bibêjin; bi weşana xwe kovara Sivore, zimanê Kurdî li cem zarokan bipêşxist, ji ber ku wê demê zimanê Kurdî di asteke navincî de bû. Her wisa rojnamegerîya taybetmendî kêm dihat dîtin, bi yekem hejmara weşana kovara Sivore karîbû cihekî baş di nava civaka zarokan de bigre.

Nivîsên Kovara Sivore, ji hevokên hêsan pêktên. Piraniya hevokan yê ragihandinê ne, ji ber ku peyamên di nivîsan de, ji bo zarokan tê arastekirin, yek ji armancên Kovara Sivore; ew agahiyên nû pêşkêşî zarokan dike. Hevokên ragihandinê tek rê ye, ji bo gehiştin bi vê armancê. Her wisa hevokên pîrskirinê, cihekî fireh di nivîsan de girtiye. Armanc ji van hevokan ev e; bersiva wan pîrsan bide ku di mejîyê zarokî de kom dibin.

Kovara Sivore giringiyeke zêde dide aliyê perwerdeyîyê, mîna dibistanê zarokan hînî xwandin û nivîsê dike. Di aliyekî din de zarokan aşnayî çand û edebiyata kurdî û ya cîhanî dike.

Zimanê rojnamegerîya zarokan zimanekî teybet e, li gorî taybetmendîya nivîsan hemû weşan bi zimanekî sivik tên nivîsandin, wate hemû nivîsên kurdî yê Kovara Sivore yek ziman heye, ew cudatiya di navbera zimanê nivîseke dîrokî û tendurustî û edebî de; tenê ji aliyê ferhengê ve ye. Ferhenga zimên ya kovara Sivore, ferhengeke taybet e, girêdayê Zaraveya Badînî ye, taybet devoka Duhokê. Bi rengê zarok jê fêhm dikin.

Zimanê Kovara Sivore ji aliyê avasazî ve, nivîsên kurt û dirêj in. Nivîsa kurttirîn ji hevokekê pêktê, nivîsa dirêjtirîn ji (80) hevokan derbas nabe. Piraniya nivîsan, ji hevokên kurt pêktên. Armanc jê ev e; tevlihevî di mejîyê zarokan de peyda

nebe. Ji aliyê naverokê jî, wateya wan yekser e. Nivîsên ku wateya wan yekser negihişt, di kovra Sivore de kêmtên dîtin.

Zimanê Kovara Sivore bandoreke baş li ser wan zarokan kiriye ku kovarê dixwînin, gotinên karîger di nivîsan de bikartên, taybet ew gotinên zarokan pal didin ji bo encamdana yan encamnedana karekê.

Bi rastî, ji bo ku mirov bandora kovara Sivore ya li ser pêvajoya rojnamegerîya zarokan li Herêma Kurdistanê bibîne, divê mirov li berhem, kovar, rojname û weşanên bi vî rengî ku piştî weşana Sivore derketine, binêre. Mirov gava meyzand dê bibîne ku piraniya nivîs û weşan li ser bingeha kovara Sivore danî, hatine çêkirin. Ev di ziman, alfabe, rêziman, ferheng û di hemû cureyên nivîskî de tê dîtin.

Kovara Sivore giringîyeke mezin dide edebiyata zarokan, rûpelên wê ji çîrok, serhatî, gotinên mezinan, şertonek û helbestan tije ne. Bi rastî kovarê bingeha xwe li ser çand û edebiyatê ava kiriye, li pişt xwe berhemeke bi bandor hiştiye, ew heta niha jî vê xebatê didomîne.

Kovara Sivore giringîyeke zêde dide fêrkirina zimanê bîyanî, bi taybet jî zimanê Îngilîzî. Di vê barê de Kêmasî nekiriye, di 233 hejmaran de, 201 mijarên girêdayî fêrkirina zimanê Îngilîzî, di rûpelên kovarê de parve kirine. Ev yek qîmeta kovarê bilindtir dike.

Ji hejmara 1-233an, (4270) nivîsên cuda cuda, di kovara Sivore de hatine weşandin. Çîrokên asta yekem, di kovarê de cih girtine. Paşê helbest li asta duyemîn tê, zanyarîyên gelemperî di asta sêyemîn de tên. Di asta çarem û pêncem de jî mijarên girêdayî cotkarî û rênivîsa Latînî tên. Paşî tendurustî, dîrok, Zimanê Îngilîzî, şûnwar erdnîgarî, kesatîyên Kurdan, zanistî û fikrî tên. Ev wê yekê dide nîşan ku Kovara Sivore, kovareke gelemperî ye, hemû mijarên girêdayî jîyanê, têde cih digrin. Wate ev hejmara nivîsan, ji bo kovareke zarokan, ne hejmareke hindik e. Nivîsên kovarê, têr û tije ne. Berhema 22 sal ji xebatê vê rastîyê nîşan dide.

ÇAVKANÎ

Abdull-Selam Necimedîn Abdulla û Şêrzad Sebrî Elî. (2011). *Zimanvanîya Tiyurî*. Hewlêr: Weşanxana Hacî Haşim.

Adil Şaswarî. (2013). *Rageyandinê Taybetmend (Rojnamegerê mindalan Be Taybetî)*. Hewlêr: Weşanxana Çar Çira.

Aram Wahid. (2012). *Rêzgirtin le Zimanê Kurdî da*. Silêmanî: Weşanxana Fakultê Zanustê Mirovayetî.

Aryan Îbrahîm. (2018). *Çawxişanêk Be Mêjûyê Rojnamewanê Kurdî*. Hewlêr: Weşanxana Zanîngeha Selahedîn

Azad Remezan. (2009). *Binema Zimanewanîyekanê Dariştinê Hewal*. Hewlêr: Weşanxana Aras.

Bahoz Baran. (2012). *Rêzmana Kurmancî*. Îstanbul: Weşanxana Kayhan Matbaacilik

Can Cibran Kerem. (1992). *Medxel Îla Luxet Al-Iilam*. Beyrût: Weşanxana Dar Al-Cebel.

Cebar Cebârî. (1970). *Mêjûyê Rojnamegerê Kurdî*. Silêmanî: Weşanxana Mûkrîyan.

Ebdulwehab Mûhammed Xalid. (2009). *Destpêkek Bo Zimanvanîya Praktîk*. Hewlêr: Weşanxana Rewşenbîrî.

Elaedîn Secadî. (1952). *Mêjûyê Edebîyatê Kurdî*. Bexda: Weşanxana Bexda.

Ewrehman Hacî Marîf. (2004). *Ferhengê Zarawey Zimannasê*. Suleymanî: Weşanxana Suleymanî.

Farûq Omer. (2001). *Rojnamegerê Kurdî le Iraq da*. Silêmanî: Weşanxana Mûkrîyanî.

Fayîq Betî. (2011) . *El mewsua El-sahîfe El-kurdîye fîel Iraq: Tarîxûha we Tetwîrûha* . Dîmeşq: Weşanxana Dar-el seqafe we'l Neşir.

Hebîb Kerkûkî. (2008). *Pêşekîyek bo Zimanê Rageyandin*. Hewlêr: Weşanxana Dezgayî Mûkrîyanî.

Heme Salih. (2011). *Lebarey Rojnamenosî kurdîyewe*. Silêmanî: Weşanxana Mûkrîyanî.

Heme Salih. (2011). *Lebarey Rojnamenosî kurdîyewe*. Silêmanî: Weşanxana Mûkrîyanî.

Idrîs Ebdullah. (2008). *Le barey Rojnamegerî Kurdî yewe*. Duhok: Weşanxana Xanî.

Ismaîl Tenya. (2013). *Raberî Rojnamegerî Kurdî*. Hewlêr: Weşanxana Hewlêr.

Ismet Xabûr. (2012). *Edebîyet û Rengvedana wê Di Heftînama (Peyman) da*. Duhok: Weşanxana Zanîngeha Duhokê.

Kawe Kerîm. (2007). *Ziman û Pirosey Peywendî kirdin*. Hewlêr: Kovarî Raman.

Kemal Farûq. (2013). *Deronnasî Mêdyayî*, Hewlêr: Weşanxana Kolijî Adab.

Kemal Mezher. (1978). *Têgeyîştinî rastî şiwênî le rojnamegerî kurdî da*. Bexda: Weşanxana Korî Zanyarî Kurd.

Kenan Subaşî.(2017). *Kurteîroka Çapemenî Ê Medyaya Zarokan A Kurdî*.

Komîsyona Ziman. (1986). *Ristesazî Le Zimanî Kurdî Da*. Bexda: Weşanxana Korî Zanyarî Êraq.

Koyî, H. Q. (2004). ***Dîwan***, Stockholm, Weşanên Nefel

Lazarev M. S, (1964). *Kurdistan û Kêşey Kurd*. Moskow: Weşanxana Mockba

Leyla Abdulmecîd. (1999). *Al-qazaya Iqtîsadî Wel- Qezaya Al-tanmîye*. Qahîre: Weşanxana Qahîre.

Mam Celal. (2017). *Dîdarî Temen*. Silêmanî: Weşanxana Karo.

Marif Xeznedar. (1973). *Raberî Rojnamegerî Kurdî*. Bexda: Weşanxana Bexda.

Merfes Mûhammed Kamil. (2003). *Medxel Îla Sehafetul-Atfal*. Qahîre: Weşanxana Fikirul-Arabî.

- Mîqdad Medhet Bedirxan.(1898). *Rojnameya Kurdistan*. Qahîre.
- Misediq Tovî. (2005). *Kovara Hewarê û Vekolînek Dîrokî*. Duhok: Destgeha Spîrêzê.
- Misediq Tovî. (2011). *Çend berperek Ji Dîroka Rojnamevanîya Kurdî*. Duhok: Weşanxana Hawar.
- Mûhammed bin Ebîbekir. (1981). *Moxtal Al-Sehah*. Beyrût: Weşanxana Dar Al- kutab Al- Ereb.
- Nerîman Ebullah Xoşnaw. (2014). *Ristesazî*. Hewlêr: Weşanxana Awêr,
- Newşîrwan Mistefa (2004). *Çend lapereyek Le Mêjûyî Rojnamewanî Kurdî*. Silêmanî: Weşanxana Silêmanî.
- Newşîrwan Mistefa. (2002). *Jîyan betementirîn rojnamey Kurdî*. Sulêmanî: Weşanxana Renc.
- Nezîr Öcek. (2014). *Rêzimana Kurmancî*. Îstanbul: Weşanxana Kayhan Matbaacilik.
- Omêd Mesûd. (2002). *Binemakanî Dariştin Le Medîyakan da*. Suleymanî: Weşanxana Tîşk.
- Qerenî Qadirî. (2009). *Komelge û amrazî Rageyandinî giştî*. Duhok: Weşanxana Xanî.
- Refîq Salih. (2011). *Raberî Rojnamenosî Kurdî*. Silêmanî: Weşanxana Silêmanî.
- Reza Hacî. (2005). *Derwazey Rojnamenosî*. Silêmanî: Weşanxana Pexşî Serdem.
- Rizgar Nûrî Şawîs. (1998). *Dîroka Rojnamegerîya P.D.K.* Hewlêr: Weşanxana Hewlêr.
- Sami Tan. (2015). *Rêzimana Kurmancî*. Îstanbûl: Weşanxana Bedran Matbaacilik.
- Selam Balayî, hevdîtin, Bingeha Kovara Sivore, Duhok, duşem, 6/2/2020.
- Tewfîq Wehbî. (1973). *Eslî Pîte Qalibî E*. Silêmanî: Weşanxana Mûkrîyan

Türkan TOSUN. (2017). *Edebiyata Zarokan Di Kovara Nûbbiharê De*. Zanîngeha Bîngolê, Enstitûya Zimanên Zindî, Şaxa Makezanista Ziman û Edebîyata Kurdî.

Zahîda Îbrahîm. (1976). *Raberî Rojnamenosî Kurd*. Bexda Weşanxana Korî Zanyarî Kurd.

Ziyad Reşad Qadir. (2013). *Ziman û Mîdya*. Hewlêr: Weşanxana Rojhelat.

https://ku.wikipedia.org/wiki/Rojnamegeriya_kurd%C3%AE. 20-1-2020.

https://www.academia.edu/MEDYAYA_ZAROKAN_A_KURD%C3%8E_THE_HISTORY_OF_KURDISH_CHILDRENS_PRESS_AND_MEDIA. 13-2-2020.

<https://www.alemancenter.com/forum/search.php?do=process> 13-1-2020.

PÊVEK



Pêvek 1. Berga Hejmar 1em

Ji Berhevkirina (Teyîb DEŞTANÎ)

ABE ya Kurd — ئابه یا کورد

xelek 8

A,a - B,b - C,c - Ç,ç - D,d - Ê,ê - E,e - F,f

ئا - به - چه - ده - ئه - ئی - فه

FÛTBOL



fûtbol فووتبول

BEFIR



befir بهفر

KEF



kef كهف

rovî û ew kilka rep

Kahî n Heso
HÛ RMÎ

Li gelyekê kûr rovyek û şêrek û gurgêk bi hev re bon û li nêçîrê di geryan ji sibê heta êvarê, kêvrîşkek û xezalek û mirîşkek girtin û li ser kanyekê rûniştin.

Şêrî got: mamê gurg to di karî van nêçîra lêkvekeî?

gurgî got: hema mirîşk bû roví û kêvrîşk bû cendabê te xezal ji bû min. Şêr gelek tûre bû û lepek li serê gurgî da û êkser kuşt û kilka wî rep rawesta û paşî got: (rovî bira tû dê çawa lêkvekeî?)

Rovî got: hema mirîşk bû



têştî te bît û xezal bila bû fravîna te bît
û kêvrîşk bû şîva te bît û eger tiştêk yan

hestîkek ji ber te
bimînît bila bû min bît.

Şêrî got: erê roví bira
te ev aqle li kur anîye û
ji kê girtîye?

Rovî got: min ji kilka
repa gurgî wê girtî.

10

Pêvek 3. ABEya Kurdî ku di Hejmara 12an de Hatiye Weşandin

سیناریو: هه‌ڕۆڤه ————— وێنه: نه‌جمه‌ده‌یه جبارانی

هه‌ ڤوو لێککه‌هه
و دانا بێک و ڤوو

ژێری گۆته ده‌فته‌ری

وژه‌کی ده‌فته‌ری گۆته ژێری



ئه‌ز دێ
هه‌می ریزین
ته‌ ژێهه‌م



ژ نوکه
پێقه نیزیکی
من نه‌به‌



ئه‌ف هه‌رده‌ووه‌ ژێ، دیسان لێککه‌هه

پینقیسی گۆته برۆکی



ئه‌ز دێ
چه‌رمێ ته‌
راکه‌م



خو ژمن
دویر بێخه
من نه‌قییت
ته‌ ببینم




په‌رتوکه‌ک ژ وێقه‌ رابوو
سه‌رخو و گۆته هه‌میان

ئه‌گه‌ر نه‌قه‌ ج
هه‌وه‌ بیت، خه‌
پێته‌کی بستی
ناخوین



Pêvek 4. Çîrokeke Perwedeyiyê di Hejmara 10an de



Pêvek 5. Wêneyên Hin Zarokên Karker Li Ser Berga Hejmare 171an

بەرىكەتە؟

پىرسىيەننىڭ ھۆمارى

پىرسىيەن ئىككى پەرىيەن ھەين، ئى نە رووھك.. بەرگ يى ھەي، ئى نە گىيەنە وەرە.. زانىست يى ھەي، ئى نە مەۋقە.. نەو ج تىشە؟ (داربەرۈي، پەرتووك، چەكچەكىلە) پىرسىيەن دوۋى، ئەگەر بەيى پەرتووك و پىنووسەكى (۱۵) ھزار دىنار بىن، بەيى ھەرتىكى چەندە ئەگەر بەيى پەرتووكى (۲) ھزار دىناران ژ بەيى پىنووسى گرانتر بىت؟

بەرسىق ھۆمارا بۆرى

بەرسىق ئىككى، ۱۳ ئەيەرى كچا كورد پەرور لەيلا ھاسم ھاتىيە سىدارەدان. بەرسىق دوۋى، باغچى نەينى، بازىن زىنار، بىرىيا چيا، بىللى

پشتى گەلەك زارۇكان بەرسىق پىرسىيەن مە دايىن و پشتى پشك كىشانى، خەلات بۇ ھان زارۇكان دەرگەفتن:

(۱) تالىا ھۆرھان

(۲) ئاشتى موسا

(۳) زۇزان مەمەد

ئەم پىرۇزىيە ھان ھەفلىن دكەين و ھىقىيە پشتى دەرگەفتن كۇفارى، سەردانا بارگەيى كۇفارا سقۇرە ل «نىقا بازىرى، ئافاھىي پۇلىسىن دھۆكى، بەرامبەر خوارنگەھا دىيا» بىكەن دا خەلاتىن خۇ وەرىگرن.

تەيىنى

داخوۋى ژ وان زارۇكان دكەين يىن پشكدارىن د كۇفارا سقۇرە دا دكەن، ھەر بابەتەكى بېنىرن نافتى خۇ يى سىقۇلى ل سەر بىقىس و دگەل دا وىنەپەكى شىكەن.. ب تاپىمەت دەمى ھوين پشكدارىن د بەرىكەتنى دا دكەن دا ژ مافتى خۇ بىن بەھر نەبىن.. دگەل سوپاسيان.





Pêvek 7. Berga Hejmare 165an bi Cejna Newrozê ve




Pêvek 8. Di Berga Hejmare 222an de Ser-Sala 2018an

پێنجوارى نێى کوردەوارى

بەرهەنگەران، لە شە



- مامۆستا، قوتابیێن خۆشکەى پێنجوارن پەلەسکا کوردی بە، بۆ وان ئێشێن خوارن
 دەپێتە هەنگۆن یێن دسکەل ئانى دەپێتە خوارن پ تابیەتێ دانی سیدیەیان، رێجال و سیدیاس
 سەریشکێن هەمییانە، بە ئی هەندەک پێنجوارنێن دى هەمە ل مالا ن دەپێتە بەر هەنگۆن، کە
 دشیێت ئاڵەسکى یێزێتە مە.
 - رەقەند، سەپیدا هەمى جازان ئەم ل مالا لارخاڵکێن چێدەسکەن.
 - مامۆستا، ئاڵەزێن، کە دى ئاڵەسکى دى یێزێتە مە؟
 - هۆزان، سەپیدا پیرا مەن پۆلجێن چێدەسکەت.
 - مامۆستا، تۆ دشیێت یێزى چاوان چێدەسکەت؟
 - هۆزان، مەن دیت لارکێن ئۆسکان دێلنا و دسکەرە ئاڵ دۆشالی و تیکەلە ددا هەمما باش تیکەل
 دبوو و پ ئانى دخواز.
 - مامۆستا، تە راست هەنگۆت، بە ئی هەمەسکە دۆشالی ئى ل شویێن شەسکەر دسکەرە د ئاڵدا، کە
 دى ئاڵەسکى دى یێزێتە مە؟
 - ئازیان، سەپیدا خوارەسکا هەمى دپێزێن پێش.
 - مامۆستا، بە ئی راستە، و ئی خوارن ئ ل ئازى و رۆش چێدەسکەن و دسکەل پێجەسکا ئاڵا
 سەکەل باش تیکەلە دسکەن و ددانە سەر لاسکى و هێکا دسکەلە سەر هەمما ئاڵیجەکە هەلێن
 و چێدەن و ئ سەر لاسکى رادەسکەن، کە ئاڵەسکى دى و رانیت؟
 - قێن، سەپیدا مەن ل گۆلدى گۆزێمەن خوار.
 - مامۆستا، ئ گۆزێز و دۆشالی، یان هەنگۆلێن چێدەسکەن، گۆزێز د قوتان هەمما هویز
 دبوون و دۆشالی د سکۆنە ئاڵ و دسکەرە د جەرەسکەسکى دا، هەلەسکەلێن هەمما باش تەما خووە
 لدا ئێسکە، یان دپێلان هەمما بەهاری، رۆژانە وەسکى پێنجوارن دسکەل ئانى ددانە سکەسێن
 رێنجیەن، ئاڵەسکى دپێر؟
 - سیامەند، سەپیدا ل مالا مە سکەرەسە چێدەسکەن.
 - مامۆستا، یانە یێزە مە چاوان چێدەسکەن؟
 - سیامەند، پیرا مەن گۆزێز دجۆشنى دا باش دقوتان هەمما وەسکى گەرەسکا ئێر لى دەهات
 و پ ئانى دخواز.
 - مامۆستا، ئاڵەزێن، سەکەلەک پێنجوارنێن دى وەک مەرمووت، کۆلەسویزک، بە لچەلە،
 مەپەلە مە و سەکەلەسکێن هەمە.



Pêvek 10. Nivîsek Li Ser Jîyana Mîr Celadet Bedirxan di Hejmara 66an de

Does running a mile a day really improve children's li

By: Svora

The Scottish school that asked primary pupils to do 10 minutes of every day started a global trend – and research suggests it really is forming lives.



It was an 18-year-old volunteer who prompted Elaine Wylie, the head teacher of St Ninians primary school in Stirling, to reappraise the fitness of the children in her school. "Your children are not fit," the volunteer told her. Wylie was stung by the comment, even though she suspected it was true. The PE teacher confirmed it. "Most children these days are exhausted by the warm-up," she said.

That same afternoon, Wylie decided to send a PE class she was supervising outside to see if they could run around the playing field. "By the end, most of them were doubled up and had a stitch," she says. "It was a shocking sight."

Pêvek 11. Nivîsek Bi Zimanê Îngilîzî

Şoreş û Perleman

Hevalên... şoreş kirya reke
ji bo xuhorîna rewşa jiyana
civakê ji layên (siyasî û
Aborî û rowşenbîrî û
.... hitve).

Çonke bo çendîn salan
zolim û zordarî li milletê
kurd hatiye kirin û ji mafên
xwe bê behir bûye, lewma
gelê kurd berdewam şoreş
kirin ji bo bi dest ve îrana
mafên xwe.

Şoreşa (26-golana-1976) bi
serkêşîya partiya demokrata
kurdistanê hatiye kirin û ev
şoreşê dirêje pêdana şoreşa
Îlonê û mizgîniyeka nî da
milletê kurd.

Êk ji berhemên şoreşa
golanê jî serhildana pîroz ya
milletê me li bihara sala
(1991) bû, di encamda parça
axa kurdistanê Îraqê hate
rizgarkirin milletê me li roja
19/5/1992 perlemanê xwe
helbijart û bûye xudan
hokmeta xo ya taybet û evro
em hemî bi Azadî û xoşî li
bin sîbera wan dijîn.

Perwîn E. E'zîz

Roja zarokan li we pîrozbît

Roja (1-6) ji hemî
salan, roja zarokên
cîhanê ye. Bi vê
helkeftinê û bi navê
kovara Sivore,
pîroziyan li tev
zarokên kurdistanê
li nava û dervey
welatî di keyn û
hemî zarokên di jî li
cîhanê.

Cihê dilxoşiyê ye
ku li ber sîbera
yasayên perlemanê

kurdistanê û
xemxoriya
hukmeta
kurdistanê, zarokên
kurdistanê hêdî hêdî
berez mafên xwe
diçin û di hemî
waranda dewrê xwe
di bînin.

Hîviye zarokên
Kurdistanê her û
her di cejn û
xoşiyanda bin.

Sivore



Namên we geheştin




Hevalên xostivî; Gare dêrikî, Hesônî kamil, Leyla Wesfî, ji bajêrê dêrikê li
kurdistanê Sûryai, namên we gehestine me û bidil xoşîve hatine wergirtin.
daxaza berdewamiyê bo we dikeyn û li hîviya berhemên weyne.

Sivore

سڤور هه‌زار (46)



Pêvek 12. Rûpelek Taybet bi Rênivîsa Latînî Hejmara 46an



Pêvek 13. Berga Hejmara 59an 106 Salîya Rojnamegerîya Kurdî

باسكتبۆل

ئا/ وېنھارا سماعىل

باسكتبۆل ئانكو ھەر يارىكەرەك بىشىت تەپنى پاقىتە دەسەنكا تىما بەرامبەر دا. ئەف يارىە ب دو تىما دە كىرن و ھەر تىمەك ژ پىنچ يارىكەرەك پىك دەپت، دەمى ھەر يارىە دەك ۴۰ خۆلەكن كو دابىش دە سەر ۴ چارىكان و ھەر چارىكەك ۱۰ خۆلەكە.

درىژيا يارىكەھا باسكتبۆل ۲۸ مەترن، و فرەھيا وى ۱۵ مەترن، و بلىدىا بازنى كۆلا وى ژ ئەردى مەترە.

ياريا باسكتبۆل دوومىن ياريا مىللى يە ل جىھانن، ئەف يارىە ل ئەمىرىكا پەيدا بوو يە ل سالا ۱۹۱۱ ياسا و رىسايىن وى ژ لايى (د. جىمىس سمىت) قە ھاتىنە دانان.

ل سالا ۱۸۹۳ نى ئىكەمىن قارماتىا باسكتبۆل ل سەر ئاستى زانكۆيان ل وەلاتى ئىتالىا ھاتىە كىرا بۇ جارا ئىكى و ل سالا ۱۹۳۶ نى ل باژىرى بەرتىن چوودناف خۇلا يارىين ئۆلۆمى دا.

د قى يارىى دا ھندەك جاران كۆلەك ب دو خالانە و ھندەك جاران ب سى خالانە و ھندەك جاران خالەكى يە... و ھەر يارىكەرەك پىنچ فاوان بىكەت دى ژ يارىى ھىتە دىرخستىن.

ھەر تىمەكا دەست ب ھىرشى دكەت دقيا د ماوى ھەشت چىركان دا بگەھىتە مەيدانا تىما ھەقىر د ماوى ۲۴ چىركان دا تەپنى پاقىتە دەسەنكا تىما دى دا.



Pêvek 14. Mijara Sporê di Hejmara 136an de

فرهنگا ب هۆزان قه

(عەربی - کوردی)

ڕەمەزان ئیسماعیل کەرەگۆشی



(ضفدع) بهقه
(غصن) چهقه
(صلب) رهقه
(زهي) تهقه
* * *

(غنم) پهزه
(ذراع) گهزه
(شحم) بهزه
(سرعة) لهزه
* * *



(جدي) گيسكه
(حجل) سويسكه
(عدس) نيسكه
(شقة) ئيسكه
* * *

(فار) مشكه
(يابس) هشكه
(حصه) پشكه
(ثاب) باوشكه



١٥

١٢٠



Pêvek 16. Weşandina Wêneyên Zarokan Digel Navên Wan

سقۇرە

مامۇستا: محمد سلمان بامەرنى



سقۇرەى خۆل مە ۋەشارت
دەمى زانى زستان ھات
نزانىن تو دجى كىقە
ئەقە سەرى چەند ھەيقە
ل زستان و بوھارا
تو دگەرىيى ل سەر دارا
گەلەك گوزىت ئاقارى
تە بو خۆ كرنە پارى
چ جار خۆ ئەقەشیرە
ئەف ئاقارە پر شیرە
چ نىچىرا ناھىلن
دى بەرھەمىن تە شىلن
رەوشا ھەمى زارۇكا
نەقەخۆ ز ئاقا جۇكا
ئاقارى ب كىانەدەر
دى خوارنا تە بەندە دەر
دەمى مە تو دىنەدە
ھەمى رورىقى رەقەنە
بىزقەدە ل پاپىزا
دا پىنكە بىخوین گوزا.

سقۇرە ھۆمار (۵۸)



Pêvek 17. Helbesteke Zarokan

Zarok li Kurdistanê Pêşve diçin

Zarokên ezîz...
Paşî serhildana milletê kurd li
sala 1991ê, rewşa welatê me
pêşve diçin. Hikometa herêma kur-
distanê pîteka mezin bi zarokan
boye. Pêdviyên wan dabînkirîne
bi jîyaneka serfiraz bijîn di
welatekê azad da.
Ji di zanin ko li 20/11/1989
mafên zarokan yê hatîne rage-
randin û pêdviye hemî bi parê-
zin. Evca zarokîno... xo ji karên
baş bidene paş û berê xo bi-
dene xandinê da bişên hemî de-
man mafên xo bi parêzin.

Sivore

Hevalîni

Zarokên Xoştirî:

Hevalên hewe Elind û
Cîwan û Alan **Nacî**, ev wênê
xî bo Govara Sivore ji El-
manya kirîne dîyarî. Dixwazîn
bi rêka Sivore hevalîniya zar-
okên Kurdistanê bikin.



Rewşenbîrî kud Mela Mehmûdê Bayezîdî



Mela Mehmûdê
Bayezîdî, şî sala
1799 li bajêrê
Bayezîdê ji dayk
boye. Paşî seredana
welatê Îranê diket û
li bajêrê (Tebîz)
akingî dibît û xwe
fêrî zimanê farisî
diket û şarezayîyeka
baş di zanistên
edebî, dîrokî
felsefîde peyda
dikit. Careka dî di
vegeryête bajêrê
Bayezîdê. paşî berev
bajêrê Erzemromê
diçît. Mela

mehmûdî
hevalîniyeka baş di
gel qunsilê Rosî
(Eliksander Japay)
çêkir. Japay baş
kurdî dizanî. Japay
zor mîfa ji
hevalîniya xo di gel
Bayezîdî wergirt.
Bayezîdî zor
harîkariya wî dîkir.
Japay gelek caran
digot: Milletê kurd
qerdarê Mela
Mehmûd
Bayezîdiye, ji berko
gelek layenên
rewşenbîrî parastîne.

Hesen Fetaî Nisîrî

Pêvek 18. Jiyana Mela Mehmûdê Bazîdî di Hejmara 77an de



Pêvek 19. Berga Hejmar 232an